**EuroMed Feminist Initiative**

**Destpêşxeriya Jinan ya Euromed** **Duderi.v.**

**Initiative Féministe EuroMed**

# Dînamîkên Dûrkirin û Tundiyê di Perwerdeyê de û Bandora wê li Ser Avakirina Aştiyê li Sûriyê

## A word of Gratitude

Duderi e.V. Center extends its sincere thanks and appreciation for the outstanding partnership with the Euro-Mediterranean Feminist Initiative EFI-IFE. We also express our gratitude to the researchers who have devoted their energy, patience, and expertise to accomplish this report.

In the Duderi team, we highly value the efforts of the field coordination teams in the Syrian interior, specifically in As-Suwayda, Raqqa, and Idlib. We appreciate all participants, including educators, leaders of local civil society, high school students and their families, and all key figures who enriched the results and recommendations of this study.

We also thank the paths of life and the dedicated work that connected us with the late Dr. Basma Qadmani, who outlined the ambitious project "Education for Peace Building" with us. She spared no effort in contributing her valuable time and adding her distinctive professional touch to the project. Unfortunately, fate took her away from this world before the implementation began. May her soul rest in eternal peace.

Thanks are also extended to everyone who contributed to the review, translation, design, and provided valuable feedback. Lastly, but not least, appreciation goes to all colleagues at Duderi e.V. who dedicated a significant amount of time and effort to develop ideas and transform them into paths of hope and change.

**Researchers and experts**

- Dr. Rahaf Aldoughli is a Lecturer at Lancaster University and Director of Research at Harmoon Center. She was a Visiting Fellow at LSE Middle East Centre and also won a fellowship with WIIS (Women in International Security) in Washington DC. She had also been granted the highly competitive and prestigious fellowship by Kroc Institute at Notre Dame Univerity to do research on peace and conflict in the Syrian context. She has published extensively on topics related to nationalism, sectarianism, states co-optation of religion and also romanticised masculinity.
- Jamal Alshoufi. PhD in nuclear physics, Writer and Researcher, As-Suwayda paper
- Dommar al Soleiman, researcher specialized in political studies, Raqqa paper
- Safwan Qassam: specialist & researcher in sociology & social psychology, Idlib paper
- Sabiha Khalil, Gender expert
- Alise Mofrej, Project Manager

Intellectual Property Rights:
Copyright is reserved for Duderi e.V. Center, and the report or any parts of it may not be reproduced, printed, or copied without citing the source and obtaining written permission from Duderi e.V., under the legal liability for violating intellectual property rights.

**Rêz û Spasî**

Navenda Duderî e. V rêz û spasiyên gerim bo hevpaya taybet li gel Destpêşxeriya Jinan ya Euromed EFI-IFE ‹EuroMed Feminist Initiative, û bo hemî lêkolînerên jin û mêr ên ku bi hemû hêzên xwe ji hedan û aramî û pisporiyê di bicihanîna vê raporê de beşdar bûne, pêşkêş dike.

wek tîma Duderî em bizavên koma hevrêzkar ê meydanî li hundirî Sûriyê nemaze li Siwêda, Reqa û Idlibê û tevaya beşdaran ji kesên perwerdekar û serkirdatî û pêşengên civaka sivîl yên xwecihî û xwendekarên ji dibistanên duwenavencî û dêûbavên wan û hemû kesayetiyên ku encam û temînyên vê lêkolînê dewlemend kirine, bilinid dinirxînin.

Û em ji bîr nakin ku spasiya rêyên jiyanê û karê berdewam ê dilsoz bikin, yê ku em gihandine D. Besme Qedemanî ya ku ji nav me barkiriye, ji ber ku wê bi me ra nîgara pirojeya: " Perwerdehî ji Bona Avakirina Aştiyê" xêz kiribû, û dema xwe ya biha dabû me, û pêwendiya xwe ya profesyonel a berbiçav li pirojeyê zêde kiribû, lê qederê xwest ku ji gerdûna me bar bike berî ku dest bi cîbicîkirina pirojeyê bibe, aştî û hêminiya herdem bo giyanê wê.

Her wiha spas bo her kesê ku di karên lêvegerîn û wergerandin û dîzayin û pêşkêşkirina temîniyên nirxdar de beşdarî kirine, û li dawiyê em spasiyê bo tevaya hevkarên jin û mêr ên Duderiyê yên ku dem û karîn ji bo pêşxistina Ramanan û veguhertina wan di çêkirina hêvî û guhertinê de pêşkêş kirine, dişînin.

**Tîma Pispor û Lêkolînerên Jin û Mêr:**

1-Rahaf Aldoughli, mamosteya zanistên siyasî ye di zanîngeha Lancaster (England) de, û rêvebira beşê lêkolînan e di Navenda Heremon ya Lêkolînên Serdemî de, Aldoughli mafê hevaltiyê ji zanîngeha London ya aborî (LSE) û hevaltiya jinan di Ewlekariya Navdewletî de li Washington WIIS; û destûra hevaltiyê ji Peymangeha Kroc li Zanîngeha Notre Dame li Emerîkayê wergirtiye; û lêkolînên Aldoughli di kovarên cîhanî de nemaze Lêkolînên li ser têgeha neteweperestî, mezhebperestî û mêraniya leşkerkirî di rojhilata navîn de hatine weşandin.

2.Jamal Alshoufi, diktoraya xwe di fîzîka êtomî de ye, nivîskar û lêkolîner e di ramanê siyasî de, kaxeza Siwêda.

3.Dommar al soleman, lêkolînerekî pispor e di lêkolînên siyasî de, kaxeza Reqayê.

4.Safwan Qassam: Pispor û lêkolînerê civaknasî û psîkolojiya civakî ye, kaxeza Idlibê.

5.Sabiha Khalil, pispor e di dozên Gender ê de.

6.Rêvebira Pirojeyê Alise Mofrej

**Mafên Ramanî:**

Mafên çapkirin û weşandinê ji navenda Duderi e.V re parastî ye, û çênabe ku ji nû ve bê weşandin û çapkirin an rapor an hin beş jê kopî bibe bêyî ku çavkanî bête ziman, û pejrandina nivîskî ji Duderi e.V bê wergirtin, û çi binpêkirin di warê mafên ramanî de pêk were binpêker ê perpisyariya yasayî hilgire.

## Naveroka Lêkolînê

Pêşgotin……………………………………………………………………………………………………8

Çima Perwerdehî? ………………………………………………………………………………  13

Çarçoveya Bîrdozî ………………………………………………………………………………… 16

Çêkirina Lêkolînê û Rêbaza wê ………………………………………………………….. 20

Pirsgirêka ku Hatiye lêkolînkirin ……………………………………………………….. 21

Kaxeza Yekem: Rêbazên Perwerdeya Sûriyê – Siwêda ………………………….. 23

Rêxweşkirin ………………………………………………………………………………………… 24

Salixdana Ketwarê Perwerdeyê li Siwêda …………………………………………….. 25

Jêrxanî û Xerckirina Wezaretan li Ser Dibistanan ………………………………….. 26

Kadroyên Mirovî û Pirsgirêkên ku Karê Wan Asteng Dikin ………………………. 29

Dîyardeyên Tundûtûjiyê di Sîstema Perwerdeyê de li Siwêda ………………… 31

Şirovekirina Rêbazên Perwerdeyê ………………………………………………………… 35

Kesperestî û Pîrozkirina Kesperestiyê û Xocihbûna Desthilatdariyê …………. 38

Pirrengiya Sûriyê di Rêbazên nû de ……………………………………………………… 49

Cudakariya li Ser Bingeha Gender di Navbera Rêbazan û Ketwarê Perwerdehiyê de ……………………………………………………………………………… 53

Temînî ………………………………………………………………………………………………… 56

Kaxeza Duyemîn: Ketwarê Perwerdeyê û Hînkirinê di Bajarê Reqayê de … 59

Rêxweşkirin ………………………………………………………………………………………… 60

Salixdana Ketwarê Perwerdeyê li Bajarê Reqayê ………………………………….. 60

Rola Rêxistinên Civaka Sivîl û Bandora Wan li Ser Ketwarê Perwerdeyê li Reqayê ………………………………………………………………………………………………… 64

Sîstema Perwerdeyê li Reqayê û Tundî ………………………………………………… 65

Şirovekirina Rêbazên Perwerdeyê li Reqayê - Waneyên Dîrok û Perwerdeya Niştimanî ……………………………………………………………………………………………… 68

Gender û bîranîna jinan di rêbazên xwendinê de ………………………………… 75

Kesperestî ………………………………………………………………………………………… 84

Rêbaz û Cudabûna Wan ji Ketwarê Niha û Bandorên Wê li Ser Nifşê nû …. 91

Temînî …………………………………………………………………………………………………. 94

Kaxeza Sêyemîn: Rêbazên Perwerdeyê Li Parêzgeha Idlibê …………………….. 97

Rêxweşkirin ………………………………………………………………………………………. 98

Salixdana Ketwarê Perwerdeyê di Bajarê Idlibê de ……………………………… 99

Nîşaneyên Tundiyê di Sîstema Perwerdeyê de li Idlibê ………………………….. 103

Dezgeha Şerîetê di Perwerdeya Hikûmeta Înqazê û Pirosesa Perwerdeyê de ……………………………………………………………………………………………………… 109

Şirovekirina Rêbazên Perwerdeyê li Idlibê ………………………………………….. 111

Cudakariya li Ser Bingeha Nijad û Ol û Gender …………………………………… 111

Cudakariya li ser Bingeha Gender …………………………………………………… 111

Cudakariya Li Ser Bingeha Ol û Nijadê ……………………………………………….. 116

Cudakirina Li Ser Bingeha Nijadî ………………………………………………………. 118

Kesperestî ………………………………………………………………………………………. 120

Nasname ………………………………………………………………………………………. 122

Gelo ma Rêbazên li Idlibê Dikarin Aştiyê Ava Bikin?............................... 125

Temînî ………………………………………………………………………………………. 126

Dûmahî ………………………………………………………………………………………. 127

Jêder: (pirtûk û kaxezên lêkolînê) ……………………………………………………. 131

**Pêşgotin:**

Di vê lêkolînê de em ê şiroveyekê li ser ketwarê perwerdehiyê û rêbazên ku îro di nav sê deverên ku di bin destê hêzên serdest de ne, ên ku di desthilatdariya wan de hevpar in, û her hêzek sîstemeke wê ji baweriyên cihêreng û şerker heye, pêşkêş dikin, di vê çarçoveyê de ev lêkolîna dê xwendina ketwarê perwerdehiyê bike, û bandora cengê li ser bingeh û pergala wê diyar bike, di hundir sê deveran de; Siwêda, Reqa û Idlib, ev hersê dever di bin desthilatdariya hêzên leşkerî û îdîlojîk ên curbecur de ne, devera yekemîn(Siwêda) di bin kontirola rijêma Sûrî de ye, û devera duyemîn(Idlib) di bin kontirola Heyet Tehrîr Elşam de ye, û devera sêyemîn(Reqayê) di bin kontirola Rêvebiriya Xweser de ye, di riya pêşkêşkirina beşdariyekê di salixdana ketwarê perwerdeyê û destnîşankirina guhertinên ku di proseya perwerdeyê de, ku di encama şerê çekdarî de rû dane, nemaze guhertina rêbazan piştî sala 2015an li her deverekê, û bi taybetî guhertinên ku di babetên dîrok û perwerdeya niştimanî "netewî" (û babeta perwerdehiyê îslamî li Idlib)ê de. Girîngiya şîrovekirina van babetan ji ber wê yekê tê ku ew ji aliyekî ve amûrek pêwendiya siyasî ye di navbera desthilatdarên heyî û yên nû çêdibin de, û amûrek bingehîn e ji bo derbirîna tundiya sembolîk û nasnameya niştimanî û girêdayîbûnê ve, yê ku her aliyek ji hêzên nakok hewl dide bandorê li ser bike, û çîrok an vegotina xwe bi rêya wê pêşkêşî xwendekarên nûjen ên keç û xort bike, yên ku ji aliyekî dî ve di bin siya cengê de mezin bûne û fêr bûne.

Di lêkolînê de pêwîst e ku bal bê kişandin ser bihaneyên belavbûyî di helwêstên giştî de (political attitudes) derbarê azadiyên sivîl (civic liberties) di çarçoveya desthilatan de, û di dema qeyranan de, yên dibêje ku perwerde amûreke ji pêwendiyên siyasî re ye, û di encamê de bandorê li avakirina bingeheke îdeolojîk dike, li gorî pîvanên siyasî yên ku ji aliyê serweriyê ve hatine sepandin. Ev nimûneya dînamîkî a sepandina rijêmên desthilatdar ji nêz ve bi pirosesa avakirina (socialization) civakbûnê ve girêdayî ye, ya ku di riya pirosesa perwerdehiyê re tête çespandin, û hin lêkolînan diyar kirin ku rijêmên stemkar hewl didin ku çîrokên xwe yên siyasî yên bijare bi rêbazên hînkirinê ve gêrê bidin, yên ku alîkariya xurtkirina rewatiya rijêmê û pejirandina rijêmê di nav beşên berfireh ên gel de dikin. Bi vê awayî, "nirxên" di perwerdehiyê de hatine çandin ji hêla têgihiştiniyê ve ne bi felsefeyeke siyasî gelemperî tenê ve girêdayî ye, lêbelê têkildarî nerîtên partîtî an rayedarî nîşankirî ye, tevî ku ji aliyê têgihiştinê ve di pirên caran de gotûbêjkirin di riya lidarxistina lêkolînên taqîkirinê re dijwar e, da ku bandora perwerdehiyê li ser piştgiriya veguhastina demoqrasiyê were pîvan, an çespandina stemkariyê, ji ber dijwariya xwaspartina ser şêweyên asayî yên hevpeyvînan ji tirsa dozgeriyên ewlekariyê. Di heman demê de dijwar e ku meriv bandora demdirêj a van rêbazên ku li ser pîvanên "civakî" hatine sepandin bipêve, ji ber ku nayê zanîn ku çawa ev pîvan di jîngehên siyasî berdêl de serkeftî

bin, tevî vê yekê, girîngiya vê projeyê ji şiyana wê ya ku dê xwe bispêre hevpeyivînên kûr bi aktorên sereke di pêvajoya perwerdehiyê de, wek ji şênî, pispor û xwendekarên xort û keç re berçav dibe. Her wiha standina rêbazeke tekstî û salixdanî ji bo lêkolîna çawaniya bikaranîna têgihiştina (Gender indoctrination) û avakirina civakî (socialization) ji hêla her sê rijêman ve, û çawa hewldanên piropogendeya perwerdehiyê (educational propaganda) ya heyî bizavê dikin ku van rêbazan bikar bînin, da ku desthilatiyê bisepînin û rewatiyê têk bibin**,** û jîngehekê ji tundiyê (internalizing) re di warê civakî û kiryarî de çêbikin. Şîrovekirin çawaniya girêdana van rêbazan bi ketwarê perwerdehiya tundî re li ser asta sembolî û îdyolojî û kiryarî diyar dike, û beşdariyekê bo tijîkirina valahiyê di lêkolînên bandorên hînkirinê li ser avakirina aştiyê û redkirina çespandina tundî û cihêkariyê û dûrxistinê ger li ser bingeha cureyê civakî be an nijadî be an olî be, pêşkêş dike. Her wiha giringiya vê lêkolînê di şiyana wê de ye ku bighêje nimûneyeke mezin ya ku ji pisporên di hundir saktora perwerdehiyê çalakvan û serkirdeyên civaka sivîl û beşek ji zarokan de pêk tê, her wiha me 300 pirsname li ser malbatên xwendekaran belav kirin.

Divê bê zanîn ku hemû kesên bi vê projeyê radibin Sûrî ne, yên ku pirosesa perwerdeyê di bin desthilata rijêma Beis de derbas kirine, û ev cîgehbûna civakî û siyasî diviya bû ku em rêbazên perwerdeyê wek amûrek ji bo îdyolojikirin û ezberkirinê bibînin, ew bi xwe ne mijareke nûjen e, ji ber ku rijêma Esed xwe sparte keresteyên dîrokê û perwerdehiya niştimanî û islamî weke veguhêzekê, û mîna amûreke ku ji jor de bê sepandin, ji bo vegotina desthilatdariya Beis î weke îdyolojiya dûrxistinê û mêraniyeke leşkerkî, Ji dema ku Partiya Beis bi teqlekirina 1963an hatiye ser desthilatê, perwerdehî û hînkirin wekî dergehekê bikar anî, da ku sîstema xwe ya otoqratîk di heyama 12 salên perwerdehiya hikûmetê de ya ku neh ji wan neçarî ne, di hiş û mejiyê xwendekaran de bi cih bike, û di wê riyê re kar li ser windakirina cudahiyan û cihêrengiyên Gender û nijadî û olî kir, berdêla ku nasnameya besîtî a leşkerkî û mêranî bisepîne, û ev yek bêguman dê sînorê girêdayîbûna mirov bi dewletê re çarçove bike, bi nûnertiya "partî û artêş û serok", û di riya lîstika bi dîroka Sûriyê ya vê serdemê re, da ku li gorî mezinkirina rola partî û kesperestiyê be.

Divê bê zanîn ku bi şêweyekî li gorî rêbazên xwendinê ya ji bo xwemalkirina(kedîkirin) ciwanên Sûriyê yên keç û xort, ku dariştina sînorên nasname û girêdanê ne tenê berpirsiyariya dewletê ye, lêbelê rûbarek taybet di civakê de ji bo sivîlên cihêreng heye, ya ku Hafiz Esed ji dema ku hatiye ser desthilatê de, di sala 1970an de hêdî hêdî ew bi dawî kir. Ya di riya danûstandina pê re weku saziyên bi ser dewletê ve bin, û helandina wan ji gewher de, ji bo ku wan vala bike, an wek partiyên siyasî yên ku hebûn û avabûn û çalakiyên xwe bi awayekî eşkere qedexekirî bûn. Û tevgerên civaka sivîl bi saziyên alîkarê Partiya

Beis hatin guhertin, yên ku rola wan di çêkirina kêmasiya zanînê di nav ciwanan de ye, di riya çalakî û yaneyên çandî re, wek pêşengên Beis û Yekîtiya Ciwanên Şoreşger, yên ku nameyên desthilatê û partiyê desthilat di mijarên dîrok û perwerdehiya niştimanî de dubare dikirin, û silogan û peyam û stran mîna waneyên niştimanî hildidan, ew jî bû sedema bidawîbûna hebûna kartêker ya civaka sivîl yê ku dikare bandorê li pirosesa perwerdekirinê li Sûriyê bike, lê piştî dijwarbûna nakokiyê û paşveçûnan xizmetguzariyên hikûmetê li deverên rikberiyê û piştî dorpêçkirina wan deveran ji hêla rijêma Sûrî ve, pêwîstiyeke civakî ya lezgîn derket holê û divê ku valahiyê tije bike, û van xizmetguzariyan tevî perwerdehiyê pêşkêş bike. Lewra destpêşxeriyên ciwan û sivîl dest pê kirin, wek hewldan ji bo ku valahiya perwerdehiyê dagrin, bi tovên destpêkî û sade û nazik, yên li gorî mercên piştevan ne li gorî pêdviyên civakî, û perwerdehî wek piroseyeke berfireh dimîne li ser wezaretên perwerdeyê yên girêdayî hikûmetên defakto, li ser xaka Sûriyê bi rengekî sereke.

Li gorî vê yekê, û bi armanca şirovekirina ketwarê perwerdeyê û naveroka rêbazên li ser axa Sûriyê di nava her sê deveran de bikar tên, û her sê deverên Reqayê, Siwêda û Idlibê, yên ku desthilatên defakto di her deverekê ji wan rêbazeke perwerdehiyê li gor xwe çêkir, her wiha dariştina naverokên rêbazên îdyolojîk yên cudayî tiştê ku berî destpêka sala 2011an de hatin hilbijartin. Û her sê dever koka rêbaza xwe hevbeş in, ew jî rêbaza xwendinê ya rijêma Sûrî ye, ji ber vê yekê nirxê vê lêkolînê tê, ji bo ku tiştên hevbeş di mijarên dîrok û perwerdehiya niştimanî de berçav bike, û ka roja niha pirosesa perwerdehiyê li deverên rizgarkirî tevî cudahiya hêzên serdest çawa ye.

Em vê lêkolînê bi analîzkirina naveroka rêbazan bi sê hêmanên şîrovekirinê dest pê dikin: Nasname, girêdayîbûna mirov û kesperestiyê. Em wê ji sê pirsên sereke yên lêkolînê, ên ku pirosesa analîza cureyî di nav xwe de dihewîne dest pê dikin, ya yekemîn: Diyarkerên nasnameyê yên ku di van rêbazan de hatine çespandin çi ne? Ya duyemîn: Gelo sînorên girêdaybûnê li ser bingehê dûrxistinê, çi li ser bingeha cureyê civakî, nijad an ol têne çespandin? Ya Sêyemîn: Gelo şûnmayên kesperestiyê, yên ku di dema desthilatdariya serokê berê Hafiz Esed û kurê wî yê niha de hatiye çespandin, hîn di prosesa xwendinê de li deverên din hene?

Di rêya vê analîzê re, em armanca jihevşelandina nakokiyên nasnameyê yên ku xwendekarên keç bi taybetî di riya şopandina ketwarê perwerdehiyê re rû bi rû ne dikin, û ew çawa bandorê li ser çespandina tundiya li ser bingeha Gender dikin, û Ji aliyê din ve, armanca vê analîzê redkirina şertên kirîter ên hişk yên rola mêr û jinan e, lê em nasnameya Gender wekî avahiyek civakî dijmêrin, nîşan û belgeyên ku di vê lêkolînê de hatine em li wêjeya geşpêdanê bi çend awayên girîng zêde dikin, derbarê mîkanîzmaya perwerdehiyê li Sûriyê piştî sala 2011an ji ber ku xebatên vê dawiyê hatine weşandin berfireh bûne, ji bo gengeşekirina

bandora perwerdeyê di avakirina aşitiyê de, an xurtkirina berdewamiya stemkariyê, lê li gorî ku em dizanin ti lêkolînek berê bi analîzkirina ketwarê perwerdehiyê, di van her sê rêbazan de tune ye, di riya pêşkêşkirina nêzîkatiyek dîtaneyî re, ya li ser rêbaza cureyî di komên giringî pê hatiye dayîn û hevpeyivînên kûr de, her wiha pirsnameyan wek keresteyên destpkî. Di vî warî de, ev lêkolîna valahiyeke nîşankirî di naverokê de tijî dike, di riya jihevşelandina vegotinên rêbazan re, di vekolîna me ya li ser ketwarê perwerdehiyê ya di her sê jîngehan de, encamên me mezinbûna jîngeheke tundûtûjiyê li ser asta sembolîk, gotarî, madî û olî, yên ku ji sînorên naveroka rêbazan dertê, çesipand.

Ji aliyê pergalî ve, ev lêkolîn li gorî herêmên ku wek nimûne hatine girtin, di sê beşên sereke de hatiye dabeşkirin, û bi pêşniyarên giştî yên ku ji xwediyên berjewendiyê re, û ji rêxistinên xwecihî û navneteweyî re, yên ku di armancên xwe de başkirina ketwarê perwerdehiyê di dema kêşeyan de, yên ku çareseriyên bingehî dixweze, ne bi yên yekperçeyî re bi dawî dibe, û rûbirûyî operasyonên dûrxistin û cihêkariya rîçalbûyî di rêbazên perwerdehiyê de dibe.

Di sektora perwerdeyê û xebatên li ser jinûvavakirina wê de, ji ber ku rêbaza Sûrî hevwate ye bi destûrê re, ku pêwîstiya xwe bi rakirina qalibên asayî ên Gender heye, da ku cudahî li ser bingeha civakî an netewî çênebe, û tundiya îdyolojîk li dijî tevaya sûriyên jin an mêr ji holê rabe, û li ser bingeha têgehên mafên mirovan û mafê jinê û wekhevî û welatîbûnê ava bibe.

Ev proje bi armanca xwe ya dawîn dixwaze bigihêje avakirina rêbazên perwerdehiyê yên nûjen, yên ku çespandina îdeolojiya dîktatorî û dûrketinê û îslamîzma ku ji şêst salî di bin desthilatdariya Partiya Beis de derketiye holê ji aliyekî ve, û serdestiya desthilatdarên defakto ji encama cengê ji aliyê din ve, red dike.

**Çima Perwerdehî?**

Divê li vir em bersiva pirsa çima perwerdehî? Û giringiya têgihiştina ketwarê perwerdehiyê çi ye? û bandora wê li ser derfetên avakirina aştiya domdar û pêkanîna dadweriya civakî û siyasî çi ye bidin? Bersiva van herdû pirsan di hundir nîşankiriyên berpirsiya perwerdehiyê û rola wê di avakirina çanda giştî ya civakan de di dewletên li şûn û yên pêşketî de mîna hev tê, ji ber ku tevaya dewletan sîstemên xwe yên perwerdehiyê ji bo ku rewaya xwe ya siyasî ava bikin, û rêbazên perwerdehiyê yên li Sûriyê ji wê giştîkirinê ne awarte ne, ev veberhênana siyasî bo domdariya desteseriyê li ser xaknîgara Sûriyê bi taybetî giring e, ji ber du sedeman: Yek jê avakirina bingehkirina rewatiya demdirêj di riya destdanîna ser avakirina civakî (socialization) li ser têgeh û nirxên hişk, û nifşê nû di tevaya deveran de armanc dike, her wiha ev beşê civakî bi ser xwe ve bîne, da ku nerim û îdyolojîkirî be, û di warê siyasî de bête veberhênankirin, ev

piroje me vedigerîne giringiya şirovekirina naveroka rêbazan, û salxdana ketwarê perwerdehiyê û torên wê yîn têkildar wek şêweyekî xweparastinê dijî îdyolojiyên cihêkirinê yên neyînî û dûrxistinê.

Di pêşî de dibe were bibîranîn  ku danûstandina li gel gengeşeyên akademîk derbarê rola perwerdehiyê di çespandina stemkariyê de, an piştgiriya veguhartina demoqatîk de, çênabe ku derbasiyê bibin berî jê avêtina newekheviyên di têgehan de, û nêzîkbûna dîtneyî ya çanda siyasî ya ku di xaknîgariya Sûriyê de rîçalkirî bi dirêjiya her sê deverên ku em qalê dikin, yên ku ji nimûneyên pêşîn di vê lêkolînê de hatine birin, û di hemen warî de hejmarek mezin ji lêkolînan heye, yên ku behsa têkliya di navbera çanda sivîl û demoqratîk de dikin, di nav wan lêkolînan de lêkolîna (Lynn Davie) ya çawaniya rabûna çanda niştimanî ya sivîl bi rêxweşkirina pirosesa demoqratîk di riya nûavakirina perwerdehiyê re tekez dike, da ev pirose tenê dema ku mercên wê yên têr dabîn bibin wê demê dê berdest be, wek têkliya pêwendîdar di navbera desthilatdar û bindestan de, û ev têkliya pêwendîdar di hundir pirosesa perwerdehiyê û saziyên wê yên curbecur de eşkere dibe.

Dema gotûbêjiya rola perwerdehiyê di bicîanîna demoqrasiya destûrî de ya ku rê dide welatiyên jin û mêr ku beşdariyeke sivîl têde bikin, wek gengeşeyên siyasî li cihên giştî, ya ku bi hêz di bîrdoziya (Habermas) de gengeşe bûye, ji ber dît ku têkliî di navbera demoqrasî û cureya vegotina niştimanî de heye, ger ku sivîlî be an rewşenbîrî be, û di salxdana niştimanî ya ku li ser taybetmendiya çandî ava bûye de, (Habermas) balê dikşîne ser ku sepandina çanda sazav ne tenê dighêje tengkirina sînorê beşdarî û nûnertiya siyasî, lêbelê sazava çandî pîvanên tevlêbûn û dûrxistinê datîne, yên ku rijêmeke ne ku li ser bingeha mafdanên giştî yên distûr diçespîne ava dike, di dema ku rexneya (Habermas) ji netewiya çandî û nijadî re ya ku çandeka sazav disepîne derbirîna wê ji aliyê rikberê netewiyê yê naskirî (Elie Kedourie) ve di pirtûka xwe li ser netewiyê di sala 1960î de hate kirin, ji ber ku (Kedourie) têkliya xurt di navbera netewiya ku sazava merc dibîne û li ser paşguhkirina kêmnetewiyê û tiştê ku jê çêdibin  wek nakokî û cengên navxweyî tekez dike. Û sedema guhdana me bi çanda sazavî vedigere desteseriya ku desthilata partiya Beis ji şêst salî de sepandiye ser rêbazên perwerdehiyê, lêbelê sepandiye ser şêweyên jiyana rojane jî li seranserê Sûriyê, di vê çarçoveyê de em xwe dispêrin ser nerîna (Habermas) ya xwestekên spartekî yên rasteqîn bo avakirina vîna demoqrasiyê ya ku xwe dispêre derdorên pêwendiyê yên di warê siyasî ya giştî de, û em van derdorên têkildarî di vê lêkolînê de wek pirosesa perwerdehiyê di ketwar û naverokê de dinasînin.

Di çarçoveya Sûrî de jîngeha perwerdehiyê naveroka vegotina çandî ya siyasetkirî rû dide, ya ku di dehsalên borî de li ser sûriyan hatiye sepandin, ji ber ku partiya Beis xwe sparte rêbazeke li şûnmayî ne ya sivîl, û Eldiglî " Aldoughli"

ev cure ji çanda siyasî weke çandeke nû ava dibe salix da, ji ber ku xwe dispêre windakirina piralîbûna çandî û netewî û nijadî û sazaviya wê, û rewşa avakirina mêrtiyê di devoka niştimanî ya giştî de diçesipîne, ev jî me berve pêşkêşkirina bîrdozên giringtirîn têgeh dibe, yên ku perwerdehî xwe dispêre ser, wek alîbûna Gender/ ziyandyî li dijî jinan, an vederkirin û dûrxistina li ser binyada nijadî û olî û mezhebî di siya vê yekê de ev lêkolîna heyî li ser bingeha analîzên (Judith Butler) ya Genderê ye, wek berçavkirina bicihanînê ye (performativity), û cîgehekî kûr ya karê siyasî ê sembolî ye, li gorî (Butler), beşên Gender î ji koka xwe de ji gotarên siyasî û karê civakî yê dubare ava dibe, di vê nerînê de em tekez dikin ku rolên Gender ê û texmînên li ser wê di hundir rêbazên perwerdehiyê û ketwarê hînkirinê de rastî îdolojîkirinê hat, û gotara li ser bingeha şikodarkirina qurbanî û mêrantî û qehremaniyê bikar hatiye, û ezmûnên wek van bandorên xwe yên hêzdar û yekser li ser şêweyê nakokiya heyî û nerînên beşdarên jin û mêr di vê lêkolîna li ser tundî û dûrxistin û vederkirinê de heye, li gorî bîrdoziya (Butler) bo berhemînana jiyanê û nasnama Gender ê, weke ji encama hin texmînên asayî û tund, û di vê çarçoveyê de (Butler) dibîne ku Gender avakirineke civakî ye, û danasîn bo avakirina nasnameya Gender ya girêdayî bi cudahîkirina li ser bingeha cureya civakî tê, ya ku di civakên li şûn de bi şêweyên curbecur tevî saziyên perwerdehiyê hatin çesipandin.

Perwerdehî yek ji amûrê desteserî û libarkirina siyasî ye, bo berjewendiya desthilatên desteser li her sê deveran, armanca vê lêkolînê ku beşdariyekê bike û temîniyan bo civaka Sûrî û navdewletî derbarê girîngiya rêbazên nefretiya cudahîkirinê û alîgiriya Gender û dûrxisinê pşkêş bike, ev lêkolîna bi taybet keresteyên perwerdehiyê ên hundir herdû mijarên perwerdehiya niştimanî û dîrokî şirove dike, û nerînekê derbarê girîngiya têgihiştina desthilatên defakto li seranserî xaknîgariya Sûriyê û mîkanîzmên di sepandina rewatiyê û desthilatdariyê di riya perwerdehiyê re pêşkêş dike, û di mijareke pêve girêdayî de ev lêkolîn rewşa perwerdehiyê di her sê deveran de beranber dike, û di gotûbêjên berdewam de li ser nermahiya desthilata diktatorî û mîkanîzmên rewakirinê yên ku ji aliyê giropên çekdar ve ji xeynî dewletê bikar têne, beşdariyê dike. non state actors

## Çarçoveya Bîrdozî

Çarçoveya bîrdozî ya vê lêkolînê, xwe dispêre hejmarek ji çarçoveyên bîrdozî yên derbasî nav hev bûne û bi hev ve hatine girêdan, ev girêgoka bîrdozî ji hevgirêka zehmetî û pûçbûna siyasî dertê, di rewşa ceng û pevçûna navxweyî de, ya milîsên leşkerî yên ser bi rikberiyê ve ji aliyekî ve, û di navbera rijêmeke stemkar de ji aliyekî dî ve, me di warê rêbazî de xwe sparte sê pîvanên şirovekirinê di deranîna çarçoveya bîrdozî ya vê lêkolînê de:

- Ya yekemîn, me ji bîrdoziyên ku ji bo analîzkirina tundiya Gender ya li ser jinê, û pîvandina bandora vê cihêkariya neyînî li ser himbizkirina tundiyê di civakê de têne bikar anîn, sûd wergirt.

- Ya duyemîn, me xwe sparete bîrdoziyên pispor ên pîvandina dûrxistina li ser bingeha nijad û olî.

- Pîvana sêyemîn me xwe sparte bandora bikaranîna tundiya sembolîk di çespandina jîngehkirina (habitus) û dûrxistin û tundiyê de.

Di hundir pîvana yekemîn de, divê were zanîn ku welatên ku bi newekheviya bi nasnameyên Gender yên cihêreng ve têne binavkirin, di avahiya cureya civakî tê de diyar dibe, di nav dînamîkên ne yeksan de, ew jî derbirîna zincîreyên qatên di ser hev re yên ku li ser nasnameyên Gender re avabûbe dike, wêjeya serdest a li ser zincîra qatên Gender dibêje ku têkiliyek di navbera avahiyê û çespandina tundiya li ser jinê de heye, ya ku di encamê de tundiya govdeyî an derûnî an sembolîk pêk tê, di lêkolînek li ser bandorên cihêkariya Gender ya li dijî keçan li dibistanên li Afrîkaya Başûr de, û rola wê di himbizkirina tundiyê de, lêkolîn dighêje encama ku: Ev yek bû sedema kêmbûna akademîk, û bandorek neyînî li ser beşdarbûna jinan di civak û siyasetê de çêkir, evan nêzîkatiyan ji ketwarê saziyên hînkirinê li Sûriyê ne dûr in, ji ber ku cihêkariya li dijî keçan di hawîrdora hînkirinê de di çespandina çanda leşkerî ya mêran de diyar bû.

Ev cihêkariya neyînî ya li dijî keçan di siya şert û mercên dijwar ên di cengê de aloztir bûn, ji ber ku bêhtir ji 6,8 melyon ji niştecihan rastî derbiderî û koçberkirina kotekî hatin, an rastî ketina bin destê desthilatên defakto hatin, bandora xwe rasterast li ser berdewamkirina nerîna kêmdîtinê ya hînkirina keçan hebû, her wiha jîngeha ku li ser tundiyê han dide diyar kir.

Pîvana duyemîn cihêkarî û dûrxistina li ser bingeha nijadê dipîve, û li vir em têgeha dîtinên nijadî (critical race theory) bikar tînin, da ku balê bikşînin ser karên çarçoveyên bîrdozî, ya ku çawaniya destnîşankirina dînamîkên têkiliya di navbera nijad û desthilatê de, di rêya sîstem û saziyên civakî, aborî, yasayî û hînkirinê de şirove dike, ev bîrdozî ne tenê berçavkên lêkolînê yên pêbawer in, ji bo jihvkirina avakar di navbera nijad û desthilatê de, nemaze di warê vegotina saziyên hînkirinê de, lê dikare bi lêkolînerên jin û mêr re alîkar be, da nehêle bêhevsengiyên hêza ku beşên hatine bidûrhiştin armanc bike di hundir devera di bin kontirola wan de berdewam neke, (Jose Macias) di gotûbêjan de dibîne ku bidûrxistin bingeha nijadî ye, û şêweyeke civakî ye, û bi awayekî rêbazkirî û dubare dermafê hin komên taybet pêk tê, ew jî nahêle ku mafê beşdariyê û nûnertiya tam di civakê de bistînin, pirosesa dûrxistin û cudakarîya neyînî ya li dijî van koman dighê pîvanên cihêreng, ew jî di gotar û reftarên siyasî de têne xuya kirin, (Arendt) di sala 1973an de amaje bi wê yekê kir ku proseya dûrxistin

û cudakariya neyînî karekî siyasî yê rojane ye, û ne tenê bi jiyana siyasî ve girêdayî ye, lêbelê hema hema di hemû karûbarên rojane de heye, nemaze di prosesa perwerdekirin û hînkirinê de.

Giring e ku pirsgirêka li jor wekî nimûneyek civakî, an jî piroseyeke bi rêkûpêk be ji bo dûrxistina hin koman bi awayekî rêbazkirî da ku beşdariya tam di civakê de bikin bête têgihiştin, çimkê dibe ku ev yeka di nakokiyên stemkarî û dûrxistinê de diyar be, ya çalakiyên kartêker ji bilî yên dest danîne ser karta hînkirinê nemaze di warê têkildar bi perwerdehiya zarokan re di dibistanê de, (Arendt) got ku kartêkerên serdest sîstema bawerî û ramanên desteser diçespînin, û di riya wê re bihaneyê ji kiryarên xwe yên civakî re dibînin.44

Û (Daniels) di lêvegerîna xwe ya çandî de derbarê cihêkirina nijadî nîşan kir ku ew yek encama yekser ya rijêma zordestiyê ye, ya ku li ser bingeha serkutkirinê di hundir sînorê dewletê de pêk tê, ev paşguhkirina aliyên din ên di vegotinên siyasî yên ku ji hêla otorîterên serdest de hatine sepandin, ji bingeha wê de bi têgihiştinên asayî yên ku bi awayekî rêbazkirî berdewam ve girêdayî ne, û di riya amûrên curbecur re wekî perwerdehiyê têne sepandin.

(Lippman) amaje dike ku qalibên asayî ew "wêneya ku em li ser xelkê di seriyên xwe de hildigirin" in, ev wêne dibin riya tekane ya ku kes rasterast serpêhatiyên xwe vedikolin, di heman warî de, (Allport) tekez dike ku endamên wê civakê van qalibên asayî diparêzin, bi pejirandinek erêker ku çi guhertinek li ser avahiya di hundir van civatan de red dike, ev qalibên hanê di pêvajoya civakîbûnê de têne domandin, û di riya perwerdehiyê re hişk dibin, û hînkirin rolekî sereke di vê avahiyê de dilîze.

Di hundir pîvana sêyemîn de, ya ku jihevşelandina têgeha tundiyê ye, em xwe dispêrin têgehên bîrdozî yên (Pierre Bourdieu), yên ku çespandina xerabiya hişyariyê (misrecognition) ji tundiyê re, û pejrandina kiryarên quretî (condescension) di civakê de şirove dike, ya ku dê ji nû de serdestiyê û tundiyê di kiryarên rojane de û operasyonên sazî û riftaran re ava bike, li ser vê nerîna reftarên tundûtûjiyê û ji ber ku tundiya sembolîk asê ye û nayê dîtin, ew di heman demê de şêwazên din ên tundiyê jî rewa dike, û di heman demê de diparêze, wekî tundiya sembolîk li kêleka axaftinên kevneşopî yên tundiyê, ji ber ku têgihiştina di riya karê tundiyê re rêyin nû ji danîna têgehên derbarê tundiya çespandî û stratejiyên destwerdanê ji bo dev ji tundiyê berdin û bidawîkirina tundiyê dabîn dike.

Ji ber vê yekê, têgeha "tundiya sembolîk" (symbolic violence) ji aliyê (Pierre Bourdieu) ve hat pêşxistin, ku çarçoveyên bîrdoziyeke berfireh li ser dînamîkên hêz û kontrolê pêşkêş kirin, û tê de pirosesa rêzeqata civakî ya di ser hev re û newekheviyê wekî rengekî serdestiya sembolîk rave dike, (Bourdieu) didê zanîn

ku tundiya sembolîk yek ji şêweyên tundiya ku "bi piranî bi rêya kenalên pêwendiyê û "saziyan" re bikar tê, di Têgeha tundiyê de şiyana afirandina sîstemên sembolîk û wateyên sepandî yên ku komên din paşguh û bidûr dixîne hene, ew jî dihêle ku "hest bibin ku desthilatdariya li ser van koman rewa bikin." di riya analîzkirina nimûne û naveroka rêbazên li her sê deveran, paşguhkirin û dûrxistina li ser binyada nijad û Gender û ol toreyên hêzê yên di hev re derbas bûne ji me re diyar dike, ji aliyekî ve desthilatdarên ku sektora perwerdehiyê kontrol dikin, û ji aliyê din ve jîngehkirina (internalization) sinciyên tundiyê û nirxên wê ji hêla kesên xwecihî yên kartêker ve, aktorên xwecihî di nav nimûneya xwendekar û welatiyan de hatin destnîşankirin, ku encamên hevpeyivînên kûr û komên girîngî pê hatiye dayîn balê dikşîne ser pejrandina tundiyê, an nebûna zanînê da ku diyardeyên tundiya sembolîk di rêbazan de ji hev bişelînin, (weku şiroveya me ya dahatî jê re).

**Çêkirina Lêkolînê û Rêbaza wê:**

Daneyên lêkolînê di sê heyvên Gulan, Hezîran û Tîrmehê de hatine berhev kirin, û her lêkolînkarekî çavdêriya vekolîn û hilanîna daneyên nimûneyê yên taybet bi herêma xwe kir, û nimûne hate destnîşankirin ku: Rûniştinên gengeşiyê yên hûrgilî, û pirsname her wiha ..hevpeyivînên kûr ên nîv-sazkirî hebin. Ji her rûniştineke gengeşiyê li deverên lêkolînkirî beşdar ji mêr û jinan hatin hilbijartin, di nav sê beşan de, her beşekî mercên wê yên taybet hene; Ew jî: Beşê xwendekaran, û lêkolîneran û bijartina wan li ser bingeha niştecih û xwendinê li bajarên lêkolîn kirine bû, û temenê wan di navbera 13 û 17 salan de be, û ji kesên ku fêrnameya amadekariyê û lîse bidawî kiribin be, an yên ku xwe jê re amade dikin, û haya wan a zelal ji rewşa giştî ya xwendina li dora wan heye.

Beşên kadroyên perwerdeyê û rêvebirên wê, yên ku xwedî ezmûneke dirêj in, ku vedigere berî sala 2011an, ji bilî hevpeyivînên bi beşên çalakvan û rêvebirên civaka sivîl re, bi mercê ku kesên hatine hilbijartin pêbawer bin, ne alîgirê tu aliyekî siyasî an îdyolojîk an nijadî bin, da ku karibin ketwar bi dirustî veguhêzin, û di her sê rûniştinên kûr de hevsengiya Gender li ber çavan bigirin.

Gihîştina van koman ne hêsan bû, ji ber sedemên erdnîgarî, ewlehî, û tirsa ji desthilatdarên defakto û pirsgirêkên alavên (lojîstîk) ên girêdayî elektrîk û xizmetguzariyên înternetê li deverên ku wek nimûne hatine hilbijartin, vê yekê hişt ku em hevpeyivînan kod bikin, û em behsa tu daneyên nîşankirin an pêşniyarkirina nasnameya çi kesî ji beşdaran nekin.

Hevpeyvînên giringîpêdan di nav 9 rûniştinên diyalogê de hatin dabeşkirin, bi navînî sê rûniştin li her devera ku hatiye lêkolînkirin, rûniştinek diyalogê ji bo her beşekî re, û 15 hevpeyivînên kûr bi kesayetên hilbijartî ji beşên ku berê hatine hilbijartin re, ji bilî pisporên di nivîsandina rêbazan de, rayedarên xwedî post di

desthilatê de, bi navînî pênc hevpeyivînên kûr li her deverekê, ev jî wiha ye: 30 kesên ku têkildarî mijara perwerdeyê hatin armanckirin, di navbera 10-11 xwendekar, 10 mamosteyên rêbazên xwendinê yên pejirandî li bajêr, û endamên rêvebiriya dibistanê, tevî 10 nûnerên civaka sivîl yên têklidarî perwerdeyê, ji bilî 5 hevpeyivînên kûr bi kesên ku ji beşên berê hatine hilbijartin, û pirsnameyên ku arasteyî xelkê bûne, da ku nêrînên xwe li ser perwerdehiyê, çakiya wê, û rêbaza xwendinê ya pejirandî, li gel giraniya ku li ser pirsên lêkolînê nîşan bidin, û di her deverekê de 100 nimûne araste bû, bi tevahî 300 bersivî.

Me nimûneya paşîn di du geran de analîz kir, ku bi analîzek naverokê ya derêncamî dest pê kir, û dûv re jî analîzek cûreyî ya kûr, me dest bi lêkolîna rêbazan kir, girêdana wan bi hêmanên lêkolînê yên li jor hatine veqetandin, û piştre bi pirsên li ser hêmanên lêkolînê yên taybetî ji bo vê lêkolînê me xwe li beşdarên danişînên diyalogê girt, Ji bo verastkirina encamên hevpeyivînan, me pişta xwe da mîkanîzmeya sêgoşekirina daneyan, ew jî mîkanîzmayek e li ser verastkirina her perçeyek agahdariya kesane ya ku em ji çend çavkaniyan (bi kêmanî ji sê çavkaniyan) bi dest dixin, di nav de hevpeyivînên kûr, rûniştinên baldar, û lêkolîna di platformên nûçe û mafnasî de, bo zanîna rastbûn û pêbaweriya tiştên ku li ba me hene.

Û ji ber ku lêkolîna me li ser xebata çend lêkolîneran e, her yek ji wan xwedî kesayetî û şêwaza lêkolînê ya taybet e, û ji bo peydakirina hevgirtin û nêzîkbûnê, me di pêşî de daneyên ku hatine wergirtin şirove kirin, û piştre encamên vekolîn, hevpeyivîn, û hevberkirin, nêzîkbûnên hevberdan û xalên cudahiya wan nîşan didin û wan bi ketwar re beranber bikin, da ku bargiraniya îdyolojî û bîrdozî diyar bikin, ku di hundir van bîrdozan de nûjen bûne, û bandora wê ya nêzîk û dûr li ser deverên ku di navbera du qonaxan de lêkolîn lê çêbûne, berî û piştî nakokiya Sûriyê, ji bo ku di pirosesa kodkirinê de misoger bibe, me sê lêkolîn di nav pergalekî hevgirtî de kom kirin, dûv re me kodkirinek yekgirtî pejirand, û li ser sê lêkolînan hatine sepandin ji herikbariya nivîsê û gihandina encaman.

### Pirsgirêka ku Hatiye lêkolînkirin

Ev lêkolîn hewil dide ku ketwarê proseya xwendinê û nirxandin û rêbazên ku li sê deverên Sûriyê bikar hatine bişopîne, û bi riya xwendina mijarên dîrok, perwerdehiya niştimanî û olî li Idlibê, û pîvandina asta beşdariya wê di xurtkirina nasname û girêdayîbûnê de, û çawaniya danûstandina wan bi Gender re, û dûrxistina kesê Sûrî yê "din" li gorî nasnameya Gender, û nijad an ol, ta ku ev rêbaz wek amûrek ji bo domandina aliyekî an partî, an kesekî têne bikar anîn, û pirsa bingehîn ya jêrîn derdixe pêş: Gelo ma rêbazên xwendinê yên Sûrî wek amûrek îdyolojîk di destê hêzên defakto yên ku wan kontrol dikin de têne jimartin? çi gengaziyên ku xwe spartiniyê wek alaveke avakirina aştiyê di navbera

beşên civaka Sûriyê de, û pêkanîna dadmendiya nijadî û Gender ji hemû pêkhateyên gelê Sûriyê re? Ji bo ku em bigihêjin vê yekê, me xwe sparte rêbaza salxdanî ya analîtîk a pêkhateyên pirtûkên ku hatine lêkolînkirin, û ew bi kurtejiyana hevpeyivînên kûr û rûniştinên diyalogê yên ku li her sê deveran hatin lidarxistin ve girêda.

Wek bersivdan ji pirsên sereke ên projeya (Duderî) yê, yên ku di projeya "Perwerdehiya Ji bo Avakirina Aştiyê" (Education for Peacebuilding) yên ku balê dikişînin ser: Çima perwerde? Perwerde çawa dikare li ser bingeha Gender, ol û nijadî hawîrdorek tundûtûj û dûrxistinê çêbike? Çi giringiya şirovekirina naveroka rêbazan di heyamên nakokiyên navxweyî û kêşeyên li ser desthilatê û nasnameya leşkerî heye? Û bandora perwerdehiyê li ser avakirina nirxên hemwelatiya wekhev, rêzgirtina ji yên din re, û pejirandina cûdahiyê ji bo avakirina aştiya domdar.

## Kaxeza Yekem: Rêbazên Perwerdeya Sûriyê – Siwêda

### Rêxweşkirin

Li gorî serjimariya sala 2008an Wezareta Rewşenbîriyê ya Sûrî ragihand ku parêzgeha Siwêda ji kesên nexwendî vala ye, ew jî berî sê salan ji destpêkirina tevgera gelêrî li Sûriyê di sala 2011an de bû, parêzgeha Siwêda ya ku li bakurê Sûriyê dikeve, bandora tevgera gelêrî ya berfireh lê bû, di riya helmetên gritin yên berfireh dermafê rikber û çalakvanan û xerabûna rewşa aborî ya giştî ew jî bû sedema derketina pêleke koçberiyê mezin di nav ciwanên bajêr de, û ta îro jî ew pêl bidawî nebûye, li gel veguherîna temamê xaknîgariya Sûriyê di sala 2013an de, weke meydaneke cengê di nav pir aliyan de, Siwêda bi giştî xwediya çandeka sivîl e, piraniya niştecihên wê û bi rêjeya 90% ji pêkhateya Durzî ne, weke mezhebekî ne mizgînî ye, û awa û rênmayên olî li ser kesî ta xelkê Durzî bi xwe jî nasepîne, Siwêda hejmarek mezin ji koçberên Sûrî yên ji bajarên Sûriyê yên din xwe lê girtine hembêz kir, lewra hejmara niştecihên wê duqatî bû, û ti serhijmariyên hikûmetê fermî an navdewletî debarê hejmara koçberan ji parêzgehê derketine û yên ji bajarên hundir lê bûne niştecî tune ye.

Tevî ku Siwêda tevlî wêrankirina rêbazkirî ya ku desthilata rijêma Esed bi serê deverên ku serî hildane kiriye, nebû, lê wê jî para xwe ji çêja bobelatên cengê kişand, û rastî ziyana di warê aborî û koçkirina ciwanan de hat, Siwêda ji alafa cenga ku gihiştiye temamê Sûriyê helwesta bêaliya erênî stand, di pêşî de nehişt ku kurên parêzgehê biçin leşkeriya neçar li bal rijêmê, û wê tabûrên leşkerî ji xelkê xwe bo parastin û bergiriya di ber xwe de, ji çi karekî leşkerî ya ku hebûna wan dixe bin gefê ger ji artêşa rijêmê be, an ji hêla togeyên leşkerî yên li derdora parêzgehê ve be hêza xwe ava kir, lê bêyî ku dijîtiya kesekî bike an êrîşî ser kesî bike, û Tevgera Peyayên Elkerame togeya herî girîng û berçav bû li parêzgehê û ew di sala 2014an de hate damezrandin, lê tevî wê yekê jî parêzgeh rastî êrîşên hêzên tundrew hat, û ya herî tund têde ji aliyê rêxistina Daişê ve bû, di sala 2018an de, û xelkê wê rewşa dûrmana ji artêşa rijêmê wê demê û destnewerdana wê bo parastina xelkê parêzgehê û hiştina xelkê wê ku çarenivîsa xwe bi xwe çareser bikin û di riya togeyên navxweyî yên ku dê berevaniyê di ber xwe de bikin veqetandin, ev yeka bû sedema têkliya neyînî ya parêzgehê bi desthilatê re, û bû sedema zêdebûna rêjeya xweçekkirinê di parêzgehê de, li gel xebatên rijêmê ku parêzgehê ji hundir ve jihev bişelîne, di riya çeteyên revandin û bazirganiya keresteyên hişber re, nemaze di qonaxên di pêre de, weke sizayeke komî ji xelkê parêzgehê re, di riya piştgiriya bêserûberiya ewlehî û belavbûna wê re.

**Salxdana Ketwarê Perwerdeyê li Siwêda:**

Ti hejmarên serhejmariyê belgekirî derbarê qebarya xerckirina hikûmetê li ser perwerdekirinê li Sûriyê piştî sala 2014 tune ne, lê serhejmarên nêzîkane balê

dikşînin ser ku 3.5% sala 2022an derbas nekir, û ew bi gelemperî ta berî 2011an kêmtirî navîniyên cîhanî yê orte bi 14% bû, ew jî ji ber ku rêjeya xerckirina hikûmetê li ser leşkariyê û Wezareta Berevaniyê bû, li ser hesabê kartên geşepêdanê yên din di tavaya  Sûriyê de.

Rêbazên xwendinê li Sûriyî bi awayekî hêdî hêdî li ser du qonaxan ji her poleke xwendinê re nûjen bû, qonaxa yekemîn di sala 2008an de dest pê kir, û qonaxa duyemîn di navbera salên 2015 û 2018an de bû, û nûjenkirina wê ta roja îro berdewam e, û tevî nûjenkirina domdar lê jêrxaniya pergala hînkirinê (ji avahî û polan) ti guhartin tê de li gel rêbazên nû çênebû, nemaze ku nûjenkirina vê avahiyê di girîngiyê de ne kêmtirî nûjenkirina rêbazan e, ji ber ku amûreke alîkar e ji mamosteyan re di sitandina rola xwe ya tête xwestin de, ev yek jî ji hêla mamosteyekî di rûniştineke diyalogî de tekez kir, dema gotiye: Jêrxanî bi temamê wê ne guncav e ger di warê dibistan an kadro an amûrên hînkirinê û alavên wê de be.

**Jêrxanî û Xerckirina Wezaretan li Ser Dibistanan:**

Li kêlek pêşketina rêbazan li gel lawaziya şiyanên darayî yên hikûmetê û gel bi hev re, karê Wezareta Perwerdehiyê di xercikrina mezin li ser rêbazên xwendinê yên bi alavên xwedî bingeheke îdyolojîk guncavî qonaxa nû ya rêbaza rijêma Sûrî diyar bû, ya ku îro berve avakirin û geşepêdanê û çanda xwebexşiyê diçe, ew jî wek xwespartina rêbaza xwendinê ye wek giringtirîn amûrên îdyolojîkî yên rijêma Beis ji dema ku hatiye ser desthilatê de, ( li gorî bîrdoziya – çima perwerdehî) û tevî ku Wezareta Perwerdehiyê  gelek pere li ser rêbazên xwendinê xerc kirin, lê di heman demê de siyaseta kêmxerckirinê meşand û ev jî bandorên xwe gihiştin dibistanên hikûmetê û kadroyên wê jî, û yekî ji mamosteyan ev tişta piştrast kir, û got: " xizankirina bi mebest ya Wezareta Perwerdehiyê", ta gihişte asta ku nema dikare pirtûkan ji xwendekaran re dabîn bike, lewra bêhtirê caran pirtûkên kevin li ser qonaxa xwendinê ya seretayî belav dike, û bilindkirina nirxê pirtûkên xwendinê yên qonaxa lîseyê, li gorî ku me di hevpeyvînan de hest kiriye, nekarîna dibistanan ku keresteyên sereke bo ezmûnên taqîkirinê bikire, û taqîgeh bûn cihê tijîkirina demê û vexwarina Metê.


Rêbazên nû li gorî nerînên serdemî yên li ser têgihiştin û lêkolîn û danûstandina di navbera mamoste û xwendekaran de ava bûne, ne li ser vekîtiyê ye, ev jî li ser zemînê pêk nehat, ji ber ku polên kevneşopî yên berê îro tenê vekîtiya agahiyan xurt dike, û tiştê ku rewş xirabtir kiriye ku dibistanin nû ava nebûn, da guncavî zêdebûna hejmara xwendekaran be, ji xelkê parêzgehê û yên ku ji bajar û parêzgehên dîtir hatine wir re, di nav pêlên derbideriya navxwe ji encama operasyonên leşkerî, û polên xwendinê ji 50 – 60 xwendekarî re terxan bû, ev jî astengiyê dixe pirosesa hînkirina nûjen, û refên xwendinê ji keresteyên tiknîkî

wek ekran û kimbiyoter ..hew, yên ku ezmûna hînkirina nûjen pêk tînin bêpar bûn, û eger ku hebin jî birîna berdewam ya elektrîkê dê wan amûran bê sûd bihêle.

Îro dibistan nikarin waneya kimbiyoterê bi awayekê piratîk bidin xwendin, lewra wane ji warê piratîkî daketiye asta dîtaneyî û texmîniyê, li hember va ketwarî li bal me du beşê cudayî hev ji xwendekaran hene, li gorî şîyana darayî û çandî ya malbatên wan, tabî em rewşa derbiderî û awarebûna navxwe di ber çavan re dibin, beşek bi tiknîkiyên nûjen û çawaniya bikaranîna wê nizanin, li hember beşekî ku dikare alavên tiknîkî ji mamostayan bêhtir bikar bîne heye, ji ber ku girêdana wan bi van amûrên nûjen re gelekî baş e, ev yek jî di rûniştinên gotûbêjiyan de hatin ziman, û ku xwendekar di warê tiknîkî de ji mamoste zîrektir e, ev yek jî dihêle ku mamoste beşekî ji nirxê xwe yê wateyî winda bike.

Nayê veşartin ku Sûriyê derdeseriya rewşeke aborî û darayî gelekî pîs dikşîne, li gel hebûna 90% ji sûriyan di bin xêza hejariyê re ne, beşê pir ji wan jî li deverên di bin kontirola rijêma Sûrî de ne, ev jî bû sedema belavbûna gendeliya rêvebirî û ya darayî di saziyên dewletê de, yên ku karta perwerdehiyê ji vê yekê ne awarte ye, ev xizaniya giştî du pirsgirêk ji me re derxistin, Ya kekemîn: Dûrketina ji dibistanên hikûmetê ji ber ku nikarin keresteyên hînkirinê û kadroyên hînkirinê dabîn bikin, ev jî bû sedema zêdebûna navîniya derketina ji dibidtanan û destvekşandina mamostayan ji kar. û Ya duyemîn: Belavbûna gendeliya rêvebirî ya giştî ji postê herî jor yê Wezaretê de, wek diziya Wezîrê Perwerdehiyê yê berê yê ku çar milyar Sûrî revandine, ta bighêje kadroyên hînkirinê û yên rêvebir û destdanîna ser samanên ku ji aliyên bexşkar ve hatine dayin, gendeliyeke bê dawî ye ta bighêje asta gihiştina pirsên ezmûnên lîseyê ber destê xwendekaran.

Û ya herî belavbûyî şûndaçûna çakiya waneyên xwendinê ji ber ku mamoste berê xwe didin waneyên taybet li ser hesabê waneyên dibistanê da ku deriyekî dî ya darayî dabîn bikin, ev jî ger ku mamosteyê pola dibistanê hebe, û yên di pirsnameyên me de beşdarî kirine tekez kirin ku perwerdehiya hikûmetê têrê nake ku zarokên wan di warê zanistî de bidin xwendin bi rêjeya 61% li hember wan 3% ji sedî rikberî vê gotinê derketin, û rêjeya mayî baweriya xwe pê neanîn, ev jî dibe ku bi rewşa darayî a pîs ya xelkê ve bê girêdan, ya hiştiye ku 36% dudulî bin.




(wêneyê li jor nerîna xwediyên xwendekaran derbarê dibistanên hikûmetê diyar dike, weku agahiyên di xêzên berî wê de hatine nivîsîn).

Pirsnîşanên çendatî diyar kirin ku welatî bi rêjeyeke bilind xwe li waneyên taybet digrin, û şandina law û keçên xwe bo dibistanên taybet û serhêlî ya di riya entirnêtê re yên ku di du salên borî de derketine holê didan pêşiya dibistanên hikûmetê ger ku karibin berdêla darayî dabîn bikin.

**Kadroyên Mirovî û Pirsgirêkên ku Karê Wan Asteng Dikin:**

Sîstema perwerdehiyê di warê mirovî de li ser kadroyên rêvebirî û perwerdehî û derûnî ava dibe, û piştgiriya berdewamiya pirosesa perwerdehiyê dike û agahiyan pêşkêşî xwendekaran dike, û tiştê berçav li Siwêda wek nimûne ji deverên hikûmetê, ku karmendên di warê perwerdehiyê de rastî bendên ewlehî û rêzikên rêvebirî yên bi pergalê sîstema hînkirinê ve girêdayî ye tên, ew jî rola wan û tevgera wan lawaz dike, ji ber ku di hevpeyvînan de hat ku tevî hebûna kadroyên hînkirinê yên xwedî şiyan û karînên ku dikarin gelekî di hînkirinê de pêşkêş bikin, lê ew bi rêzikên rêvebirî û ewlehî ve bendkirî ne, bi giştî kadroyên perwerdehiyê rastî du tiştan tên, yek jê cudahîkirin û ya dî çavdêrîkirin, bi awayekî mezin li gorî eger û bendên ku piştî sala 2011an de derketine holê, ya girîng jî cudahîkirina di hilbijartina rêvebir û arastekaran de, ji kadroyên rêvebirî bi xwe, ji ber ku têne kategorîkirin wek rikber û alîgir, û di dibistanan de mamosteyên Beisî û alîgirên wan di pêşiya hemiyan de ne, yên ku li ser çespandina rola kevneşopiya mamoste di vekîtiyê de dikin, û bergekê ji azadiyê û ewlehiya giştî di pêşkêşkirina zanyariyan de bê arastekirin û çavdêriyê nadin wan, di pileya ku dibe kesê xizmetkar wek sîxur bikar were, û mamoste jê bitirse,

cihê wî û giraniya wa xizmetkarî ji tevaya mamosteyên jin û mêr bilindtir e, û bi ser wê de wêraniya rewşa aborî û kêmbûna mûçeyên mehane yên mamosteyan, ji ber ku nirxê wê 15 dolar derbas nake, ev jî dihêle ku mamoste li derfetên kar di warên dî de bigerin.


Ji bilî wê yekê bendên heyî ji berî kêşiyê ve, di riya bendkirina mamosteyan bi rêbazan û cîbicîkirina wan re, ji ber ku xebatê mamosteyan di riya karê çendatî de bi berçavkirina rêbazan hate nirxandin, wê jî berdewamiya rola kevneşopî ya vekîtî ya kesê bi pîşeya hînkirinê radibe hate çespandin, di dema ku rêbazên nû divê ku ji pirosesa hînkirinê re hêsan be, û bi awayekî lêkolînî bête pêşkêşkirin, ji bilî bendkirina azadiya derbirînê ya mamosteyên jin û mêr, û nehiştina wan ku rexneyan bikin, an nerîna xwe derbarê siyaseta perwerdehiya arastekrî li gorî pilan û arasteyên siyasî nîşan bidin, û mamosteyên jin û mêr wek kes li hev kirin ku ne serbixwe ne, û herdem aliyekî siyemîn heye (araste û rêvebirî) di nav mamoste û xwendekaran de nerîna xwe disepîne, û di waneyên dîrok û niştimanî de naverok di berjewendiya desthilata siyasî de bikar tê.

Ji bilî pirsgirêka xolên rahênankirina li ser rêbazên nû û rêyên xwendina wê yên ku di heyameke kin kêmtir ji 5 rojan de tên plankirin, û kesên ku pê radibin tên salxdan ku ne xwedî şiyan in, ji ber ku veqetandina wan li gorî gendeliya rêvebirî û darayî ye, û girêdayî nêzîkbûna ji xwediyên biryarê ye, ev jî balê dikşîne ser şaştiyeke rêbazî ya xwespartina mamosteyên jin û mêr, û sazavî li gel mîkanîzma şaş ya hilbijartina hejmar û pejrandina ciwanan da ku di zanîngeh û amojgehan de bibin mamoste, û rûniştinên gotûbêjiyan bal kişandin ser vê yekê "derçûyên wek mamoste ji amojgeh û kolîjeyan pêdviya wan bi pileyên bilind nîne û ev tişta jî nayê pejrandin".

Têkçûna sîstema perwerdeyê di bijartina kesê şareza û helbijartina mamosteyan ne tenê di warê mamostayan de ye, lêbelê dighêje tevahiya kadroyê mirovî, ji ber tevî ku perwerdeya leşkerî bi rênmaya perwerde û derûniyê hate pevguhartin di 2002an de, lê pisporên derûnî ne di asteka amadekirî bilind de ne, ya ku li gorî wê pêzanînê bi zarok û ciwanan re danûstandinê bikin, û ezmûn piştî bîst salan ji cîbicîkirina wê hîn li gorî jêhatiya şêwerdaran ne, û ew mîna mamoste bi şert û mercên hemû pêvajoya perwerdeya siyasî ve girêdayî ye, û xwendevan dibîne ku "di navbera xwendekar û rêber û rênîşanderê de danûstandineke rasteqîne nîne, û rêyeke kartêker di danûstandinê de bi me re wek xwendekar nîne, û bandorên wan neyînî ne û şêwaza wan ferman û qedexe ye."

**Dîyardeyên Tundûtûjiyê di Sîstema Perwerdeyê de li Siwêda**


Dibistan ji bo xwendekaran ne cihê handanê ye, di encamê de pirsgirêkên tundî û cudahiyê yên rastî xwendekaran tên vê yekê diyar dike, ji ber ku xwendekar di nêrîna mamoste û rêveberan de her tim sûcdar tê dîtin, yê ku bûye normek di dibistanên Sûrî de hatiye çespandin, di encama bermahiyên leşkerîkirina fêrkirinê de, ji ber ku bi xwendekaran re bi hînkirina qedexeyan dest pê dike, divê tu dengê xwe li pêş mamoste bilind nekî, û çavên xwe li pêşiya mamoste ranekî, şêweyê nehatiya guhartin bi guherîna rêbazan re, û tê de nasname û kesatiya xwendekar winda dibe, û ew tête rûxandin da ku îdolojîkirina wî/wê hêsan be, tiştê ku hevpeyvînan tekez kiriye, ji ber ku tim xwendekar li ser şaştiyê tê dîtin, û gengeşe bi mamoste re nayê kirin, û xwendekar di bersiva xwe de bi bêrûmetiyê tawanbar dibe, û xwendekara keç jî bi neperwerdeyê û bikaranîna vegotinên şerm tuhmetbar dibe, ev axaftina tundiya devkî û cihêkariya li ser bingeha Gender nîşan dide, li gel qalibkirina xwendekarên keç û salixdana wan bi kêmasiya fey û perwerdehiyê weku me di çarçoveya dîtaneyî de destnîşan kirî, ev jî dighêje sizayan, û xwediyên xwendekaran dîtin ku rê li pêşiya şaştiyan careka dî nagre, bi rêjeya dighêje 78% di dema ku rêjeya 18% dîtin ku cureyek ji rêgirtinê ye, û ev yek xerabiya hizrîna xwediyên xwendekaran diyar dike, û li gorî şiroveya Bordeaux (li beşa çarçovya bîrdozî binêre), li ser bandorên tundiyê ku ew tenê tundiyê zêdetir çêdike**,** bûyerên tundûtûjiyên dubare li pêşiya dibistanan vê yekê xuya dike, ku dibistanan li ber çavê xwendekaran dike cihekî ku ne ewle ye, wek gelek pirsgirêkên ku di dema derketina ji dibistanan de belav dibin li gorî hevpeyvînan, wek: "lêdan, zirar, qusîna por, bikaranîna kêran û çovên elektrîkê" li vir, dêûbav hişyariya bandora tundûtûjiyê li ser destkeftiyên kur / keçên xwe, bi rêjeya 86% nîşan dan, û ew di wê baweriyê de ne ku lêdan û tundûtûjiya devkî û govdeyî bandorê li ser asta xwendina wan xwendekaran dike.



(wêne nerîna xwediyên xwendekaran derbarê sizayên ku xwendekarên keç û kur di hundir sîstema hînkirinê de li Siwêda rastiyê tên, diyar dike).


Divê behsa rewşa awarte ya ku Siwêda tê de dijî û rewşa tundûtûjiyê ya ji çend aliyan ve li ser wê hatiye sepandin were kirin, wek gefa dubarekirina êrîşên DAIŞê û bêserûberiya ewlehiyê, dûrxistina wê ji derdora xwe, û bi peyketina lawên wê ji ber sedema neçûna leşkeriyê, û derxistina fermanên ewlekaryê dermafê piraniya ciwanên wê, ji bilî vê jî rewşa aborî ya xirab, li gel hebûna dijberiya giştî di navbera agahiyên di rêbazên nûjen de, di warê têgehên rêberî û xurtkirina ciwanan û demoqrasî û civaka sivîl û di navbera jiyana giştî ya ku xwendekarên kreç û xort tê de dijîn de, ger li dibistanê an di jîngeha civakî an siyaseta giştî de be, ev yek jî ji hêla kartêkerên civiyane tekez bû, ji ber ku"Naveroka pirtûkan bêkêmasî bû, û li ser erdê tune ye" nemaze ku gelek xwendekar naveroka perwerdehiyê wekî derew û dirûşmeyên bilind bi nav dikin, û li vir jî kesên kartêker dipirsin: "Em ê çawa karibin baweriyê bi xwendekarên xwe re li ser tiştekî ji naverokê çêbikin û tiştek jê nayên sepandin û ne jî bikar tê? û xwendekar ji tundiya ku pêk tê ne dûr in, û dizanin çi bi serê her kesê nerîna xwe bide tê, û di vir de cudahî heye, ji ber ku naverok ne li gorî ketwar re.

Li hember wê yekê rêyên tundûtûjiyê û cudakariyê li gel hawîrdora giştî û ya  perwerdehiyê hevaheng in, yên ku bandorê li ser perwerde û jiyana xwendekaran dike, Tevî ku agahîxwaz nîşan dide ku 41% ji beşdaran diyar kirine ku mijar û têgehên bîrdozî ên ku tundiyê di rêbazên perwerdeyê de xurt dikin sînorkirî ne, nemaze ku di rêbazan de windakirina hezkiriyên xwendekaran di dema cengê de li ber çavan nehat girtin, lê guhertina rêbazan cara duyem û sêyem di nav xwendekaran de faktorên paşveçûna derûnî  li bal xwendekaran çêkir, ji ber  ku hawîrdora jiyana giştî ya ku xwendekar tê de derbas dibin li ber çavan negirt: wek windakirina hezkiriyên wan, koçberkirin, tundî û kuştin û girtin û binçavkirina kotekî.




(wêneyê li jor danûstandina bi awayê tund di sîstema perwerdehiyê û hînkirinê li Siwêda, diyar dike).

Rêjeya 29% ji xwendekaran di riya sizayên mamosteyan re rastî tundî û zordariyê tên, û rêjeya 33% rûbirûyî sizayan nayên, di dema ku rêjeya 38% nebaweriya xwediyên wan diyar kir, û bersivên wen (hinekî) bû, ev jî rêjeyeke bilind e li pêşiya zagonên ku rê nadin ku ev tişt di dibistanan de pêk were, ev jî barê derûnî li ser xwendekaran duqatî dike, û wan bi rêjeya 79% dilzar dike, û rewşên xwekuştinê di jiyana ku tê de dijîn de di pênc salên vê dawiyê de zêde bûn.




(wêneyê li jor rêjeya bersiva pirsa ji xwediyên xwendekaran hatiye kirin derbarê dijminkariya derûnî an govdeyî di dibistanên Siwêda de?).

Rêjeya 79% ji dêûbavan piştrast kirin ku wan dizanibû ku kur/keçên wan di rewşên dilzariyê re derbas dibin, û ev tişt bi hatina Siwêda di salên dawiyê de di pêşiya parêzgehên Sûriyê de hatiye tête girêdan, bi hejmara kesên ku xwekuştine 117 bi navînî 23 her salê, û ev xal wek nîşaneke girîng e li ser dijatiyê di navbera têgehên bîrdozî yên di rêbazan de, û di ketwarê jiyana giştî de hatine, û kiryarên jîngeha perwerdiya rêbazî û qalibkirî ya xwendekar, ku mafê wî/wê yê derbirîna raman û nerînê red dike, tê dîtin.

**Şirovekirina Rêbazên Perwerdeyê**

Ji destpêka milmilaneya di sala 2011an de, pêşdebirina rêbazên xwendinê yên rijêma Sûriyê nehate rawestandin, û guhertin di navaroka pirtûkan de di warê tûjbûn û nermbûna pêşkêşkirina ramanan de,  da ku li gorî her qonaxekê be, û ku nêrîn û vegotina rijêma Sûriyê û armancên desthilatdariya wê nîşan bide, tevî tiştên ku me berê derbarê kadroyên perwerdehiyê û binesaziya rijêmê ya sîstema perwerdehiya jihevketî raber kiribûn, û di sala 2020an de guhertoyek nû ya rêbazan ji pola nehemîn re hate derxistin.

Li gorî vê yekê, em ê pirsên lêkolînê yên ku berê hatine pirsîn gengeşe bikin, giringiyê bidin ser pirtûka perwerdehiya niştimanî ya nûvekirî ya sala 2020/2021,


û mijara dîrokê ya sala 2019/2020, ya taybet bi pola nehemîn- amadekariyê yê sêyem, bi danberhevên rêbazî ji giringtirîn xalên ku di pirtûka perwerdeya niştimanî de hatine guhertin, li gorî her sê diyarkerên giştî yên vê lêkolînê, yên ku bi awayê danûstandina rêbazên nûjenkirî li gel Gender û pêkhateyên olî û nijadî yên civaka Sûrî, û astên terxankirina têgeha dewletbûnê bo berjewendiya desthilata rijêmê û partiya Beis di warê îdyolojî de, ya ku dikeve deriyê kesperestî û yek partiyê, ber bi têgeha nasnameyê ve, û çawaniya xurtkirina nasnameya Sûrî an jî destwerdana bi naveroka wê.

**Kesperestî û Pîrozkirina Kesperestiyê û Xocihbûna Desthilatdariyê**

Sêgoşeya Partiya Bais, "Şoreşa 8ê Adarê" û "Tevgera Serrastker" stûnên sereke yên vegotina rijêma Sûrî ne, ji salên heftêyî yên sedsala borî ve, ku bi berfirehî ji bo çespandina çîroka xwe ya dîrokî û xurtkirina hestên niştimanperwerî û neteweyî bikar aniye, û xwedî nasnameya wê ye ku girêdana di navbera welat de di têgîna xwe ya berfireh bi desthilatdariyek tekane hate çêkirin, û terxankirin di riya kesayetiya Hafiz Esed re, lê piştî destpêkirina tevgera gelêrî, desthilatê li ser guherîna naveroka rêbazên perwerdeyê kar kir, da ku wekî desthilatdariyek demokratîk xuya bike, ku li dijî tundrewiyê, terorê û komploya li dijî Sûriyê şer dike, bi sivikkirineke hindik di xwespartina sêgoşeya xwe ya ku me li jor qalê kiriniyê, û derbaskirina têgehên demokrasî û hemwelatîbûnê li gor pêwîstiyên navneteweyî yên rêbazên perwerdeyê.

**a-Hebûna Yekpartiyê di Ketwarê Dibistan û Rêbazên Perwerdeyê di Navbera du Rêbazan de**

Ji dema damezrandina Yekîtiya Ciwanên Şoreşger di dawiya salên 1970ê de, wek rêxistineke alîkar ji Partiya Beis a Erebî re li Sûriyê, hate pejirandin ku bibe berdêl ji komeleyên ciwanên sivîl (yane, giropên vedîtinê, kombûnên meşiyan û awayên din ên çalakiya sivîl), yên ku rijêma Hafiz Esed dawî li hebûna wan anî, û hêdî hêdî civaka sivîl, rêxistinên wê û desteyên sivîl û sendîkayan bi demê re bi Partiya Beis û hikûmeta bi ser wê ve bi awayekî ku berovajî têgeha xebata sivîl bi desthilatê ve girêdan.



أغني معلوماتي

الاتّحاد العامُّ لنقاباتِ العمّال:

تأسّس الاتّحادُ العامُّ لنقابات العمالِ في عام ١٩٣٨م ومع بداية الاستقلالِ عام ١٩٤٦م صدرَ قانونُ العملِ الذي يوفّرُ الحمايةَ القانونيةَ للعمّالِ، وبعد قيام ثورةِ الثامنِ من آذارَ عام ١٩٦٣م وضعَ قانونٌ جديدٌ للتنظيم النقابيِّ الذي أعادَ للنقابة حقوقَها ومكانتَها واستقلالَها.

(Agahiyên zêdetir li ser Yekîtiya Giştî ya Sendîkayên Karkeran ya ku di 1938an de hatiye damezrandin û di destpêka serxwebûna welêt de di 1946an de yasaya kar derket holê, ya ku bi awayekî yasayî karkeran diparêze, û di şoreşa 8 adarê di sala 1963yan de yasayeke nû bo rêxistinkirina sendîkayan hate danîn).

Tevî ku herdû Rêxistinên Pêşengên Beis ê û Ciwanan têkliya xwe bi perwerdeyê re nîne jî, lê ew bi pirtûkên dîrok û niştimanperweriyê di dibistanên rijêma Sûriyê de bûn hevwate wek du rêxistinên siyasî yên girêdayî Partiya Beis bin, û li ser xocihbûn û kûrbûna girêdanê di navbera welat û desthilatdariya rayedar de, û bi dirêjiya 12 salên perwerdehiya dibistanê li ser xwendekaran tê sepandin ku beşdarî waneyên heftane yên zêde bibin, yên ku xocihbûna têghên Partiya Beis armanc dikin, wekî serokê dewlet û civakê, û siyasetên wî yên otorîter di birêvebirina dewletê de bi awayekî siyasî ye, û ew hîn bikar tîne, tevî ku ev pirtûka di makezagona 2012an de hat guhertin, armanca sereke ya van rêxistinan ew bû ku civakê amade bikin, da ku dilsozî û girêdana xwe bi partiya pêşeng re ragihîne, di riya bikaranîna amûra vekîtiya îdyolojîk re, di dema avakirina hişyariyê de li bal nifişê nû û di çarçoveya karê perwerdeyê û hînkirinê de, û xocihbûna desthilatdariya heyî weke modela yekane ya desthilatdariyê, ku tê de vegotina rayedar weke serekê herdemî yê dewletê xuya dike, û taybetmendiya pîroziyê dide wî, tiştê ku di rêbazên perwerdehiya niştimanî de pêk hatiye, ya ku amûrek ji bo gihandina vegotina rêxistinên girêdayî Partiya Beis ê bû, û Sendîkayên zanistî, pîşeyî û çandiniyê bi Şoreşa 8ê Adarê ya ku ji aliyê partiyê ve hatibû birêvebirin girêdan, ji ber ku wê ev maf dabûn van sendîkayan, û kadroyê perwerdehiyê amaje bi vê yekê kirin, û gotin ku girêdayîbûna Beis û arasteyên wê di pîşê de ye, û dilsoziya bi wê re di ser her tiştî re ye.



الوحدة الأولى | المنظّمات الشعبية | الدرس الرابع

إنّ ممارسة الشعب لحقوقه الديمقراطيّة على نحو واعٍ ومنضبطٍ ومسؤول يقتضي تنظيمَهُ في منظّمات ونقاباتٍ تمنحُهُ القوّة، وتدفعه نحو المشاركة الفعالة وتعمل على توعيته سياسيّاً واجتماعيّاً...


لنتعرّفْ بعضَ المنظّمات الشعبيّة (الاتّحاد العامّ للفلاحين، الاتّحاد العامّ لنقابات العمّال) ونحدّدْ أهدافَها وآليّةَ عملِها، ثمّ نبيّنْ أهمّيّةَ هذه المنظّمات في تنظيم المجتمع وحشد طاقاتِهِ، ونستخلصْ دورَها في حفظ حقوق المنتمين إليها.

الوحدة الأولى
المجتمعُ العربيّ السوريّ
١- الانتماء الوطني.
٢- السلطات.
٣- الرعاية الصحّيّة في الجمهورية العربيّة السورية
٤- المنظّمات الشعبية.
٥- مشكلات المجتمع.

طُبعَ أوّل مرّة للعام الدّراسيّ ٢٠١٢ - ٢٠١٣م

(ev wêne li ser waneyên di yekîneya yekem a danasînê bi rêxistinên gelêrî dike ye, û ji wan rêxistinan: Yekîtiya Giştî ya Cotkaran, Yekîtiya Giştî ya Sendîkayên Karkeran û armanc û mîkanîzma karên rêxistinan diyar dike, danasîna ku di çapa yekemîn ya pirtûkê di sala xwendinê ya 2012-2013 de hatiye).

Ev pêşniyar heyanî sala 2020an berdewam kir, dema ku waneya rêxistinên gelêrî yên taybet bo çapa 2012 ji holê rabû, û guhertineke bingehîn di naveroka perwerdehiya niştimanî bi xwe de çêbû berdewam kir, li gel sivikbûn û kêmkirina axaftinên li ser "Şoreşa 8ê Adarê" an jî ya ku bi yekîtiyan û sendîkayan ve wekî berê girêdayî ye, û li dawiyê babeta xwendinê bi temamî hate veguherandin û tenê li ser danasînên civaka sivîl yên vê serdemê axivî. (Weku forma jêr diyar dike).




الوحدةُ الأولى: تطوير الذات

| الدّرس | عنوانُ الدّرس | رقمُ الصّفحة |
|---|---|---|
| الأوّل | التفكير الناقد | ٨ |
| الثاني | المثابرة طريق النجاح | ١٥ |
| الثالث | المشاركة المجتمعيّة | ٢٣ |
| الرابع | الإعلام ودوره في المجتمع | ٣٠ |

طَبع أوّل مرّة للعام الدراسيّ ٢٠٢٠ – ٢٠٢١ م

(ev wêne ji waneya yekîneya yekme ya pirtûka ku di sala 2020-2021 de cara yekemîn çap bûye hat, û tê de çar sernavên waneyan bibîr tîne, wek: hizra rexneyî, berdewamî riya serkeftinê ye, beşdariya civakî û ragihandin û rola wê di civakê de).

Em dikarin bibêjin ku rêbazên nûvekirî naveroka wê ya îdyolojîk ya kevin bi cilin nû hate veguherandin, lê bi aktorekî nû ji bo çespandina nameyên rijêmê bi awayekî ku bê belavkirin, ji bo ku Sûriyê li ser asta navdewletî nîşan bide ku ew demokrasî û civaka sivîl diparêze, da ku sûdê ji fonên wê yên Neteweyên Yekbûyî werbigire, da ku xezîneya xwe têr bike, di heman demê de ku Partiya Bais û rêxistinên alîkar ên wê berdewam heman rolan dileyizin, lê bi dariştineke kêmtir zelalî ji ya berî wê bîranîntir, û veberhênana amûrên nû li gorî guhartina ku di destpêka tevgera gelêrî de çêbûye, bi avakirina komeleyên sivîl û çalakiyên civakî û xwecihî re, ya ku ketwarê cengê û destpêşxeriyên welatiyan, û helbet bilindbûna bi sedan komeleyan û girêdana wan bi pereyên navdewletî ve ku hin ji wan ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne, û hin ji wan jî bê destûr ji Wezareta Karûbarên Civakî û Kar dixebitin.

Di dema xwendina rêbazên nû de - bi taybetî Pirtûka Perwerdehiya Niştimanî, em dibînin ku hindik behsa "Partiya Beis" an "Tevgera Serrastker"  an "Şoreşa 8ê Adarê" tê kirin, ya ku em ê li ser wan gengeşe bikin, ji aliyekî din ve, waneyên li ser pirrengiya Sûriyê, nasnameya Sûriyê, yekîtiya axa Sûriyê heye, û ya herî girîng jî bicihkirina vegotina rijêma Sûriyê û pêdariya rêberê wê yê efsanewî yên mîratî hene, weku di waneyê vîna niştimanî de "vîna me pêşeroja me çêdike" û careka dî bo rewakirina rewşa dîrokî bikar hat, di riya girêdana şoreşa Sûrî ya gewre bi cenga cotmehê ya rizgarkirinê re, ya ku di pirtûkê de di pênc cihan de bibîr hatî, ji bo ku bi şerê terorê ve girêde, û bilindkirina alayê di sê cihan de, û têkbirina artêşa dagîrker di cihekî din de, girêdana cenga cotmehê bi sembola alaya niştimanî ve, ji ber ku bilindkirina wê yek ji serkeftiyên wê ye, û berdewamkirina çîrokê di şeş cihan de, Ji bo ku bigihêje rewşa Sûriyê ya îro, weke şerekî hovane yê kolonyalî li dijî Sûriyan, ew hewl dide ku sembola al û artêşê ya ku derbirîna nasnameya niştimanî dike bikar bîne, da ku wê bi rêberê cengê û gelê Sûriyê ve girê bide, û bi vî awayî sembolîzmê bi rêberê qonaxa niha ve girê dide, û bi vî awayî Beşar Esed di dergehê destkeftên bavê wî re dihêle, û di hundirê xwe de wekî sembola mayîna dewletê tê jimartin.

## – مفهوم الإرادة الوطنيّة


حصلت سورية على استقلالها من المحتلّ الفرنسيّ في ١٧ نيسان عام ١٩٤٦م، بعد مقاومة وطنيّة عبّر السوريّون فيها عن إرادتهم الحرّة المستقلّة ووحدتهم وإيمانهم بوحدة وطنهم.

خاض الجيش العربيّ السوريّ بعزيمة وإرادة صلبة حرب تشرين التحريريّة عام ١٩٧٣م ضدّ العدوّ الصهيونيّ حيث تمكّن من تحقيق الانتصار وتحرير مدينة القنيطرة ورفع العلم السوريّ فيها.

واجه السوريّون بإرادة وعزيمة - على مدار عدّة سنوات - الحربَ الغاشمة التي شُنّت عليهم منذ عام ٢٠١١م، حيث صمدوا في وجه المخطّطات الاستعماريّة، وحطّموا أدواتها الإرهابيّة، وقدّموا دروساً في الوطنيّة والانتماء.

)Ev wêne li ser têgeha vîna niştimanî diaxive, û tê de hin agahiyan li ser serxwebûna Sûriyê di 17 nîsana 1946an de, û li ser Cenga Cotmeha 1973yan ya li dijî israîlê û bûyerên sala 2011an, ya ku wek cengeke ji derve ve li ser Sûriyê dibîne, ne weku şoreşa gelê Sûriyê ye).

Li gorî vê yekê, bikaranîna zelal a rêbazên perwerdeyê di berçavkirina siyaseta desthilatdariyê de ye, wek ku me berê di pêşgotina bîrdozî ya vê kaxezê de behs kiribû, û wê hişt ku em ji xelkê Siwêda nêrîna wan li ser pirosesa ji hev cudabûna rêbazên perwerdehiyê ji meyla siyasî ya desthilatdariyê bipirsin, ji ber ku 90% ji wan razîbûna xwe bi vê beşê re diyar kirin; di dema ku yên ku ew red kirine 4% bûn, û 6% bêalî rawestiyan.



(Ev wêneyê li jor bersiva vê pirsê diyar dike: Gelo ma divê ku rêbazên perwrdehiyê ji nerînên siyasî serbixwe bin? – Siwêda. Tabî bersiv di xêzên li jor de hatine zelalkirin).

Heza xelkê bi awayekî eşkere ber bi dûrkirina rêbazan ji siyaseta desthilatdariyê ye, ev heza ji cihêkirina van rêbazan û waneyên wan ji ketwar e, û bikaranîna rasterast ji aliyê rijêma Sûriyê ve, ji bo guhertina ramanan û berovajîkirina bûyerên ku têde tê, ya ku îro pêk tê, ji bo ku wek ku rijêma Sûriyê dixwaze were vegotin, di "Têkoşîna li dijî terorîzmê û medyaya nedurist " de, ew jî bi komkirina wan di bîrdanka komî ya ciwan de pêk tê, wekî bûyerên ku hîn nebûne dîrok, lê dibe ku dest bi avakirina dîrokeke nû ji bilî ya ku em tê de dijîn di riya amûrên perwerdehiya nerm re bike, û li vir rijêma Sûriyê desthilatdariya baviksalarî ya yekdestdar li dewlet û çavkaniyên wê berdewam dike, û vegotina xwe li ser gelê birçî disepîne.

Beranberkirina hevpeyivîn û pirtûkên rêbazên nû yên ku nîşan dide guherîneke îdeolojîk a ku di navbera du nifşan de rû daye, ango nifşek ku rêbazên berê yên ku wekî partîzanî, perwerdehî, rêbazî, û arasteyeke siyasî û bawerdarî li ser hatine bicihanîn, ji bo ku wek yek ji stûnên berdewamiya rijêma Beis ya leşkerî ava bibe, û ev nifişê ku kadroyên perwerdehiyê yên ku rêbazên xwe dispêrin rêbazên nû pêk tînê ye, ya ku ev kadro dê hîn bike û bi reftarî bide nifşeke din, ku li ser bingehên dewlet û hemwelatîbûnê fêr dibe, da ku çîrokek din a îdeolojîk pêşkêş bike, ku Sûriyê dewleteke serdemî ye di warê siyasî û perwerdeyî de, bi awayekî ku di bingehê xwe de berovajî pêvajoya ketwarê Sûriyê yê bobelatî ye, ya ku ji ber desthilatdariyê bi xwe û awayê wê û îdyolojiya wê çêbûye.

**b- Kesperestî**

Di waneya duyemîn a Pirtûka Perwerdehiya Niştimanî ya nûjenkirî de (guhertoya 2020/2021), ku bi sernavê berdewamî riya serkeftinê ye, di paragrafek li ser berdewamiyê ji bo vegerandina mafan heye, û tê de dîroka Sûriyê ya nûjen bi rewşa ku niha Sûriyê tê de dijî girê dide, û bêje: Rizgarkirina xakê meşeke ku nayê rawestandin, û tiştê ku îro Sûriye tê re derbas dibe, cîbicîkirina projeyên welatên kolonyalîstiyê ye, ya ku ji bo perçekirina Sûriyê dixebitin, lê ev heza kolonyalîstî bi berxwedana gel, artêş û rêber û pêdariya wan a efsaneyî hate têkbirin, bilêvkirina peyvên ku sembolîzma welat û ya ku dewlet li ser hatiye avakirin mîna gel û artêşê, û pêvekirina wan bi pêdariya rêbertiyê hewldanek e ku wî bikin sembolek niştimanî ku hemwelatiyên jin û mêr û xwendekaran ber bi hesta berpirsiyariyê derbarê wî bibin, û xwesteka fedakariyê ji bo wî, û ji bo destkeftiyên wî wekî sembola dilsoz a dewletê nîşan bidin.



– تحرير الأرض مسيرة لا تتوقف: (المثابرة لاستعادة الحقوق)

- كان جلاء آخر جندي فرنسيّ عن الأراضي السوريّة في ١٧ نيسان ١٩٤٦م بعد مقاومة لا هوادة فيها وعزيمة وإصرار على التحرر والاستقلال.

- في ١٥ أيا... الصهيونيّ.

- في عدوان ... قطاع غزة ...

- في ٦ تشرين الأوّل عام ١٩٧٣م، شنّ الجيشان السوريّ ... متزامناً على العدوّ الصهيونيّ، حيث تمكّن الجيش العربيّ ...

دخلت سوريّة عام ١٩٩١م، مفاوضات مؤتمر مدريد للسلام وفق مبدأ "الأرض مقابل السلام"، الّتي استمرّت ما يقارب عقداً من الزمن دون أن تفضي إلى نتيجةٍ، ويعود ذلك إلى التعنت الصهيونيّ والطبيعة العدوانيّة والنزعة التوسعيّة، والدعم الأمريكيّ لمواقفه، ما دفع سورية إلى تعزيز جبهات المقاومة لاستعادة

وفي عام ٢٠١١م لجأت الدول الاستعماريّة إلى أساليبَ وأدوات جديدة في تنفيذ مشاريعها في المنطقة، باستخدام الجماعات الإرهابيّة من أجل تفتيت الدولة السوريّة، ولكنّها هُزمت بمقاومة الشعب السوريّ وجيشه وقائده وصمودهم الأسطوريّ في مواجهة تلك المخططات.

لقد كان الشعب العربيّ السوريّ على ثقةٍ بأنّ مصير المشاريع الّتي تستهدفه ستبوءُ بالفشل، استناداً إلى خبرته التاريخيّة وتمرسه الطويل ومثابرته بعزيمة لا تلين في الصراع مع القوى الاستعماريّة بدءاً من الغزوات الصليبيّة والمغوليّة والاحتلال العثمانيّ (التركيّ) فالفرنسيّ فالصهيونيّ.

(Ev perçe nivîsên li kêlek û ser hev (paragraph) li ser derketina leşkerê Firansî yê herî dawîn ji Sûriyê di 17 nîsana 1946an de, û cenga cotmehê di sala1973an de û danûstandinên Sûriyê di sala 1991an de ya kongirê Medrîd yê aştiyê di navbera Sûriyê û Îsraîlê de, û bûyerên piştî sala 2011an diaxive).

Di çarçoveyeke pêwendîdar de, Şoreşa 8ê adarê di pirtûka dîroka nû de carekê di rûpela 74an de hatiye bîranîn, ku tê de bibîr hatî ku ev şoreş dixwest ku (piştgiriya aramiya siyasî û civakî di bin serokatiya Partiya Beis a Erebî ya Sosyalîst de, û yek ji wê Encamên herî girîng ew bû ku li ser avakirina bingeheke aborî ya bihêz bixebite) û piştî wê behsa Hafiz Esed wek serokê partiyê tê kirin, di riya bikaranîna wêneyê wî û zanyariyên derbarê wî de wekî çîrokek dîrokî bilêv dike, ku tenê armanca wê ku avakarê Sûriyê diyar bike, di heman pirtûkê de navê Hafiz Esed tenê li du cihan hatiye bilêvkirin, ya yekem di rûpela navborî de hatiye, û ya duyem jî di rûpela 80 de hatiye, ji bo berçavkirina axaftina wî ya di Şerê Rizgariya Cotmehê de, di bin sernavê "Niştiman û Nasname" yê de.




(Ev perçe nivîs (paragraph) li ser pênc qonaxan li Sûriyê diaxive: qonaxa teqlekirinên leşkerî di 1949an de, qonaxa paşketinê ya cudahiyê di 1961an de, şoreşa heştê adarê di 1963an de, paşketina heyva pûşber di sala 1967an de, û rêya serastkirinê bi rayedariya Hafiz Esed di 16 mijdara sala 1970ê de diaxive).


Di pirtûkê de behsa "Şoreşa 8ê Adarê" hatiye kirin, di paragrafeke bi navê "Qonaxeke Nû" de, ku bi referandûmeke gelêrî wergirtina kurê wî ku desthilatdariyê di riya refrandomeke gelêrî re vedibêje, û behsa wî û ya destkeftên wî wek yek ji pêkhateyên Sûriya nûjen ji bo piştrastkirina vegotina wî ya "berxwedanê" wiha got: "Pabendbûna wî bi vegerandina erdên Erebî û Colana Sûriyê ya dagîrkirî, û bihêzkirina pêwendiyên navdewletî, û di serdema wî de tevgera vekirî ya têkliyan û bikaranîna teknolojiyê, zêdekirina dahata serekî ya navîn e, û avakirina gelek projeyên aborî û kêmbûna rêjeya bêkariyê, û rê da medya û rojnamegeriya nû ku derkeve holê", Xwendekar van destkeftan di dema ku welat wêrankirî de dixwîne, û naveroka pirtûkê dide xuyakirin ku Sûriyê beriya cengê dewleteke pir li pêş bû, û ji aliyê Beşar Esed ve bi ramanên wî yên pêşketî piştî hilbijartina wî ji aliyê raya giştî ve di sala 2000 de hate damezrandin, nîşankirina wî weke bûyereke sereke di dîroka nûjen ya Sûriyê de, û pênaskirina wî weke sembolek ji sembolên berxwedanê, û ku ew kilîta rizgarkirina wê ye, ji êşên ku ji ber komploya cîhanî çêbûne – bi vê awayî Esed di ber rewşa bobelatî ya roja îro neberpisyar dike, ev paragraf li ser danasîna Sûriyê di sala 2011an de ya ku rastî fişarên derve hatiye berdewam dike, û ku gelê Sûriyê hişyarî û hevgirtina xwe di riya berdewamiya karê saziyên dewletê û aramiya wan çesipand, û ku her kes li dora kesayetiya rêber ji bo derbaskirina vê krîzê kom bû.

"Em naxwazin li Sûriyê mirovekî hevseng û hişmend ku bikaribe birame ava bikin, bi rastî piraniya astengiyên li pêşiya perwerdeyê, çi xwendekar, çi mamoste, an

pirosesa perwerdeyê radwestin têkildarî stemkariyê ne, ji ber ku nasnameya niştimanî di wateya civakî de ne dilsoziya bi welatê xwe re ye, lêbelê heyf û mixabin bi desthilatdariyê re ye". Li vir pirsgirêka naverok û armancên rêbazan derdikeve holê, ji ber ku balê dikişîne ser "siyaset û armancên perwerdehiya arastekirî, yên ku bi awayekî rêbazkirî di rêbazên taybet bi pirtûkên perwerdeya niştimanî û dîrokê de cih girtine, tevî ku têgehên serdemî yên di pirtûkên dibistanê de destnîşankirî bi awayekî fermî û dîtaneyî pîvanên perwerdehiya navneteweyî li ber çavan girtine, lê di heman demê de çend têgînên ku bi wan re berevajî di nav xwe de dihewîne, û hewcedarî nerîneke şirovekirinê kûr di vedîtina wê de ne.

Di vê çarçoveyê de, nîşanên di pirtûkên dibistanê de û yên ku ji aliyê pisporên perwerdehiyê ve hatine piştrastkirin, "xocihbûna desteseriya siyasî ya talankirî di berjewendiya desthilatdariya siyasî de, û îdeolojiya wê ya partîtiya totalîter li gel cudakariya çandî û Gender/zayendî ya berbiçav" wekî berdêla  azadiyê nîşan dide,  her wiha vekirîbûn wekî têgînên ku di rêbazên nûjen de hatine destnîşankirin, û bi awayekî dijberî bi naveroka xwe ya giştî û têgînî re ye.


Rêbazên perwerdehiya Sûriyê yên berê di dîrok û perwerdeya netewî de zelal û baldar bûn, û li ser piştrastkirin û xocihbûna desthilatdariya baweriya Partiya Beis û domandina îdyolojiya totalîter ya ku yekdestdariya desthilatdariyê dike kar dike, xwendekar bîrdoziyên partiya Beis tê de dixwînin, di dema ku bikaranîna têgînên nûjen ên wekî hizra rexneyî û afirîner, ku di rêbazên nûjen de cih digirin, ku bi navên nûjen (dozên dîrokî û perwerdehiya niştimanî) hatine, li ser nûvsazkirina vê arasteyê bi rengekî nûjen bû, tevî nebûna destnîşanên desthilata siyasî û Partiya Bais di van rêbazan de, di dema ku "li cihên taybet û lêkolînkirî yên ku bi mijarên nûjen ên girêdayî rola jinên Sûriyê û rêyên ramana afirîner û derxistina encaman ve girêdayî ne têne berçavkirin" Rêya hûrbîn a daxistina van babetên veqetandî di nav rêbazan de û cihê wan di pirtûka xwendinê de, ji bo berdewamkirina têgeha welatparêziya Sûrî û dewleta serdemî û girêdana wê bi şêwe û amûrên serdemî ên ku têgeha Partiya Beis a desthilatdar ava dike kêrhatî ye, û hêza siyasî ya heyî, bi awayekî ku hêz û saziyên dewletê weke nemûneyeke tekane a rêveberiyê yekdestdar dike, ev yek jî berovajî têgehên demokrasî û civaka sivîl ên di rêbazan de ne.




(Ev nivîs weke bîrokekê ye li ser hin bûyerên demê yên têkildarî Sûriyê wek: pevçûna Merc Dabiq di sala 1516an de, pevçûna Meyselon di 1920an de, yekîtiya di navbera Misir û Sûriyê di sala 1958an de, wergiertina postê serokatiya Sûriyê ji hêla Beşar Esed ve di sala 2000an de, helmeta Firansî li ser Misrê di 1798an de, serxwebûna Sûriyê di sala 1946an de, cenga cotmeha sala 1973an de).

**Pirrengiya Sûriyê di Rêbazên nû de**

Pirtûka Perwerdehiya Niştimanî ya nû guhertinên girîng di danûstandina hikûmetê li gel babeta pirrengiyê di hewlekê de bo vegerandina rola pêkhatên  gelê Sûriyê bi cudahiya nijad û olên wan di rêbazên berê de nîşan dide, ji ber ku rêbaza nû bi afxaftina li ser civaka Sûrî û mozayîka wê dest pê kir, û danasîn ku civaka Sûrî wek “yek ji civakên herî cihêreng û jimartin e di cîhana erebî de” ye, lê bi xweber bi erebîtiyê civaka cihêreng binav kir.




(Ev nivîs li ser taybetmendiyên civaka Sûrî diaxive, wek civakeke curbecur û piralî û xwedî pêkhatên cihêreng yên xwedî dîrokeke hevbeş).

Di heman nivîsê de wê salixdanê dubare dike, û xwe berovajî xwe dike, û dibêje: “Civaka Erebî ya Sûriyê bi cihêrengiya xwe cuda ye… û bi nasnameyeke niştimanî ya berfireh tê derbirînkirin”, ji bo ku civakê weke Ereb cuda bike, û vê civaka “Erebî” bi nasnameya niştimanî ya yekbûyî ve girê bide.

Bi gelemperî di danasîna civaka Sûrî de, di şeş cihên cuda de peyva "cudahî" hatiye bilêvkirin, bêyî ku li ser nijad û netewên ku ev cihêrengî li ser wan hatiye avakirin, di nav wan de Kurd, Tirkmen, Suryanî biaxive, û tenê bi Erebbûna civakê bi bîr tîne, di waneyan de, peyvên Erebbûna civaka Sûriyê, Erebbûna destûrê û Erebbûna Komarê derbasdibin, ev jî weke dirêjkirina siyaseta dûrxistin û cudakirina li ser bingeha nijad û netewiyê tê dîtin, heya dema ku pirtûkê behsa pejrandina “yên din” dikir jî, ji aliyê olî û nijadî ve nehate gotin, ku bikeve nav xeleka xapandinê û nenaskirina pêkhatên civaka Sûriyê, tevî ku ev cihêrengî ji aliyê pêkhatî ve bi têgeha niştimanperweriya Sûrî re ne dujber e, bi qasî ku bibe bingehek hêzdar ji cihêrengiya giştî re û bingehek ji bo têgeha ku vîna giştî pêk bîne, ya ku li gorî (Rousseau) hemî pêkhateyan ji hev re dipejrîne, û ku dibe sedema peymana lihevhatinê ya derbarê nasnameya niştmanî de, li ser bingeha hemwelatîbûn û mafên sivîl ên gumankirî yên di rêbazan de cih digirin.

– التنوُّعُ مصدرُ قوَّةٍ وغنىً للمجتمعِ السوريِّ

الموقعُ الجغرافيُّ المتوسِّطُ لسوريةَ جعلَ منها موطنَ جذبٍ للعديدِ من المجموعاتِ البشريَّةِ التي تفاعلتْ قديماً وحديثاً على الأرضِ السوريَّةِ، وشكَّلتِ المجتمعَ العربيَّ السوريَّ بكلِّ ما يتمتَّعُ بهِ من شخصيَّةٍ متميِّزةٍ وخصائصَ عديدةٍ، تمثِّلُ قاسماً مشتركاً بينَ أبنائِهِ.

**من دستورِ الجمهوريَّةِ العربيَّةِ السوريَّةِ**

_ المواطنة مبدأ أساسي ينطوي على حقوق و واجبات يتمتع بها كل مواطن، ويمارسها وفق القانون.
_ المواطنون متساوون في الحقوق والواجبات لا تمييز بينهم في ذلك بسبب الجنس أو الأصل أو اللغة أو الدين أو العقيدة.

(Ev wêne li ser guhêrbariyê diaxive, û dibêje ku ciyawazî jêdera hêz û dewlemendiya civaka Sûrî ye, û qala xaknîgariya Sûriyê dike, û du xalan ji destûrê dewleta Sûrî bibîr tîne).

Di çarçoveyeke pêwendîdar de, pirtûk behsa nasnameya niştimanî dike, û rola hemwelatiyê baş diyar dike, bêyî ku hemwelatî bi taybetmendiyên wî yên giştî bizanibe (bi taybetî bi zimanê bîranînê) ji bo parastina vê nasnameyê bi bendên ku bala me kişandiye, ji wan: (bilindbûna di ser hemû pêkhateyên şaxî (eşîrî, êlî

û mezhebî) re, yên ku nasnameya niştimanî lawaz dikin, rijêm di wê baweriyê de ye ku endambûna ji çi bloka olî û nijadî girêdana bi welat re lawaz dike, welatê ku bi kurteya sembolên "artêş û rêber" tê binavkirin, Encama eşkere ev e ku dilsoziya bi welat re bi kurteya dilsoziya bi partiyê û rêberiyê re tê kurt kirin, û di pirtûka dîrokê de, hûrguliyên li ser pêkhate û pêkhateya civaka Sûrî ya netewî û nijadî û olî kêm têne behs kirin, ji bilî çend destnîşanan ku tê de behsa rêberê şoreşa peravê "Şêx Salih Elelî" dike, û di pirtûkên din de li ser rêberê şoreşa mezin a Sûriyê Sultan Eletraş ji Cebel Elereb diaxive, û armanca li pişt wê girêdana desthilatdariya heyî bi dîrokê re, weku berdewamiya tekoşîna wî ya li dijî hêzên kolonyalîzmê ye.

Piştî piştguhkirina ku bi dehan salan berdewam kiriye, di pirtûka perwerdehiya niştimanî de behsa bajarê Reqayê bi taybetî bajarê "şoreşê" hat kirin, û kir ku hebûna wê û girîngiya wê ji ber avakirina Bendava Firatê ye, ya ku di şoreşa 8ê Adarê de pêk hatiy, û ku ew tabloyeke zengîn ji cihêrengiya tevna Sûriyê pêk tê, bêyî ku behsa pêkhatên vê tevneyê bike, û ew weke parêzgeheke bi dehsalan hatiye jibîrkirin wesif kir, ji bo tenê ronîkirinê bide ser destkeftên Hafiz Esed, ew jî hewldaneke din e ji bo girêdana giringiya navçeyeke Sûriyê bi destkeftên serokê desthilatê re.


### – صورة عن المجتمعِ السوريّ

مدينةُ الثورةِ، حسناءُ الفراتِ، تقعُ على الضفَّةِ اليمنى لنهر الفرات، وتبعدُ ٥٥كم عن مدينةِ الرقّةِ و١٥٠كم عن حلب. وقد شكَّلتْ عبرَ التاريخِ نقطةَ جذبٍ للسكّانِ بحكمِ موقعِها وخصوبةِ أراضيها، وقد كانت عبر التاريخ مركزاً للتبادل التجاري، ومكاناً لتجميعِ المحاصيلِ الزراعيَّةِ وتصديرِها إلى الخليجِ العربيِّ وبابلَ والهند. ومعَ قيامِ ثورةِ الثامنِ من آذارَ عامَ ١٩٦٣م، تمَّ بناءُ سدِّ الفراتِ بالقربِ منها ممّا جعلَها مركزاً بشريّاً واقتصادياً وثقافيّاً لمختلفِ أبناءِ المحافظاتِ السوريّةِ. لتشكّلَ لوحةً فنيةً غنيّةً للنسيجِ السوريِّ تعكسُ صورةً رائعةً عن العيشِ المشتركِ والتناغمِ والانسجامِ بينَ أفرادِ المجتمعِ.

(Di vê wêneyê de civaka Sûrî ya cihêreng dide ber çavan, û wek mînak li ser bajarê Elsewra (Eltebqa) çelenga çema Ferêt diaxive, û nemaze qala bendava wê bajarî dike, yê ku li pêşiya çemê Ferêt hatiye avakirin, û xelkê wî bajarî ji hemû pêkhatên gelê Sûrî ne).

Li gorî nerîna 71% ji xelkê ku beşdarî pirsnameyên hejmarî bûne, bawer dikin ku divê rêbazên xwendinê bêhtir mijarên li ser cihêrengiya çandî ya Sûrî di nav de cihêrengiya nijadî û netewî hebe, di heman demê de 88% bawer dikin ku divê rêbaz ji olê serbixwe be, ev yeka xwezaya parêzgeha Siwêda ya vekirî nîşan dide, û ji ber ku ew cihêrengiyê weke taybetmendiyeke erênî di civakê de dibînin, em li vir nabêjin ku hilbijartina herêma Siwêda li gorî lêhatinê bû, ji ber ku parêzgeh di van 12 salên dawî de dîdevanê pirrengiya olî û çandî ya eşkere bû, ji ber ku bi

destpêşxeriyên xwe yên gelêrî û sivîl koçber û derbiderên ku bi darê zorê reviyane li wir hatin bicîkirin, yên ku ji ber amûra leşkerî ya desthilata leşkerî a rijêmê reviyane, wê parêzgehê ew hembêz kirin, û kesên cuda di warê ol û çandê de pejirandin, ev yek jî bi encamên pirsnameyê re hevaheng e, her wiha parêzgeh bi xwezaya xwe ya nerm û nebûna tundrewiya olî û xwedî rêjeya bilind e di xwendinê de, ji ber vê yekê beşek li ba me nirxa têgehên hevwelatîbûn û jiyana sivîl baş têdighê.





(Wêne nerîna dêûbavan li ser zêdekirina babetên li ser ciyawaziya cihêrengên civaka Sûrî yên nijadî/netewî û olî li Siwêda diyar dike, û tabî rêjeya bersivan û pirsê li jorî wêne hatine nivîsîn).

## Cûdahiya li Ser Bingeha Gender di Navbera Rêbazan û Ketwarê Perwerdeyê de


Pirtûka Perwerdeya Niştimanî bi zelalî li ser jinan û rola wan di civakê de neaxivî, bêyî ku nimûneyekê an rol an beşdariyeke jinan bibîr bîne, lêbelê berûvajî wê yekê axaftina li ser jinan di riya çend diyalogan re kurt bû, wek diyalogên biçûk ya rojnamevaneke jin bi zanyarekî û bijîşkekî girîng re, û bi diyaloga mamosteyekê û axaftina dapîrê bi niviyên xwe re, pir kêm navê jinekê dihate gotin, di dema ku pirtûka dîrokê behsa hin kesayetên jin dike, lê bi awayê bikaranînê bû, peyva jin 10 caran bibîr hat, û gotina jina Sûrî carekê di beşa "Jinên Sûriyê rûmet çêkirin" de derbas bû, ev gotara mêraniyê bi rastiya ku xwendekarên keç li bajarê Siwêda dijîn re hevaheng e, ji ber ku derdeseriya kiryarên cudakirinê dikşînin, û bi wan re weke hewldanekê bo xocihkirina nerîtên civakî û cihêkariya Genderî didin û distînin, û wek mînak mamostya derûnasî tenê me hişyar dike ku em "hez nekin", û em jiyan û hestên taybet nejîn, dema

ku berve cihêkirina xwendekarên xort ji yên keç tête kirin, ya ku tê bawerkirin ku ev yek ji aliyê civakî ve tê pejrandin, lê şêweya pirojeyê li ser cihêkariya Gender ê ye, û têkiliya xwendekar û hevalên wan ên keç ber bi warê destdirêjiyên li dijî jinan ve tête kurtkirin, û dê agahdarî tenê arasteyî keçan bêyî xortan bibin, û yek ji xwendekaran ji me re got ku yek ji mamosteyan redike ku em bi hevalên xwe yên xort re li ser daniştokê danişin, bi bihaneyên bênirx yên têkildarî destdirêjiyê û gote min: texmîn bike ku carekê zincîra pantironê te daketiye, her wiha hişyarî û têbînî tenê ji bo keçan tên gotin û hişyariya xortan nîne!




(Cihêkariya Gender û asta ewlehiya jîngeha perwerdehiyê li Siwêda, û di vê nivîsa wêneyî de, rêjeya bersivên van pirsan hatine dayîn: Gelo ma jîngeha dibistanê ewle ye? Ma mijarên xwendinê yên ku perwerdeya çanda cihêkariya di navbera herdû ziyandeyan di rêbazên xwendinê de hene?)

Û li gorî dêûbavan, cihêkariya li ser bingeha Gender/zayendî di hawîrdora perwerdehiyê de heye, Ji ber ku ew dibînin ku hin mijarên ku di rêbazan de hatine pêşkêş kirin ji sedî 36 cudahiya Gender di nav xwendekaran de xurt dikin, di dema ku ji %26 ji wan jî bawer dikin ku ew hinekî vê cihêkariyê xurtir dike, û li gorî ku mamoste behsa nerihetkirina di nav xwendekaran de dikin, nerîna %34 ji dêûbavan bawer dikin ku dibistan ne hawîrdorek ewle ye, lê 51% ji wan dibînin ku ew hinekî ewle ye, û wan ev gotin li ser bingeha bihîstina gelek haletên nerihetkirina keçên xwendekar ên ku rastî nerihetiyê tên pejirand, ji ber ku 43% tekez kirin ku wan bûyerek nerihetkirina xwendekaran bihîstiye.




(wêne bersiva vê pirsê dide; Gelo ma we bihêstiye ku kes ji xwendekarên keç/kur di dema li dibistanê an di rêya ber bi dibistanê ve rastî destdirêjiyên govdeyî hatine? Bersiv tabî li jorî wêne bi hûrgilî hatine nivîsîn).

Rêjeya 43% rêjeyeke ne hindik e, û dema ku me ji dêûbavan pirsiye gelo ew mijarên têkildarî tenduristî û perwerdehiya Gender vediqetînin? rîjeya 82% tekez kir ku bi hebûna rêbazên xwendinê li ser tenduristî û perwerdehiya Gender re ne, û yên kartêkerên sivîl tekezî li ser pêwîstiya wê di perwerdehiyê de kirin, ji ber ku ew "zarokan dihêlin ku xwe ji destdirêjiya zayendî biparêzin". Ev yek haydariyek cureyî ye bo pêwîstiya perwerdekirina zarokan, û destnîşan e da ku ew karibin xwe biparêzin.

**Temînî:**

Avakirina aşitiyê pêwîstiya wê bi gelek faktorên yekbûyî bo pêkanîna wê heye, pêkanîna dadwerî û dewleta hemwelatiyê û dabînkirina derfetên wekhev li pêşiya hemû welatiyan ji bo beşdarbûna di avakirina nasnameya niştimanî ya Sûriyê de, pêkanîna veguhastina demoqrasî û guhartina siyasî dixwaze, her wiha bidestxistina pîvanên jîngeheke ewle û bêalî, ya ku tê de pirosesa veguhêz tevdigere, da ku ji nû ve pirosesa perwerdeyê ava bibe.

Girêdana geşepêdana domdar û bidestxistina aramî, dadmendî û serweriya yasayê hewce dike ku guhartin di meyla siyasî ya otorîter a heyî de were kirin, ev jî bo nûvekirina rêbazên perwerdehiyê mercekî sereke ye, da ku ji nifşê cengê û

desteseriyê û tundiyê berve nifşekî fêrkirin û hînbûnê û geşepêdanê û pisporiyê û afrêneriyê biçe, û derbarê vê axaftinê divê pêngavên yeksan bên avêtin, ew jî ev in:

- Guhertina hawirdora perwerdehiyê bi guhertinên siyasî re, ev jî pêwîstî bi guhertina avakarî û hişmendiya desthilata siyasî û wezareta wê ya perwerdeyê heye, û bidawîanîna rêxistinên siyasî yên ne-perwerdeyî (ciwan û pêşengên Beis ê) û pirosesa perwerdeyê bibête piroseyeke geşepêdanê ya ku xwe dispêre kesên pispor, jêhatî û şareza.

- Serxwebûna rêbaza xwendinê ji desthilatdariya siyasî an olî, bi mercê ku cudahiyên ziman û ol û rêzgirtina azadiya baweriyê û xurtkirina hînkirina sinciyê wekî waneyeke sereke û girêdana perwerdeyê bi demokrasî, welatîbûn û peymana civakî re li ber çavan bigire, ji bo avakirina nasnameya niştimanî ji aliyê rêbazî û reftarî ve, û divê ku ev têgeh di destûra Sûrî ya dahatî de bi hev re cih bigirin.

- Daraştina destûreke berfireh ku bi nerîna civakî ya zayendî re sazgar be, û danîna yasayan li ser bingeha wekheviya hemwelatîbûnê, û prensîba nehiştina cihêkariyê li ser bingeha cureyê civakî an nijad an ol an çi cûreyek din.

- Amadekirina binyada dibistanan ji aliyê cureyî û hejmarî ve, û kadroyên mirovî li gorî pîvan û awayên hînbûnê yên nûjen e.

- Karê li ser amadekirina tîma nûjenkirina rêbazan û ku xwedî amadehiyeke akadîmîk bin, û xwedî pisporên zanistî bin, û şareza bin, û di warê siyasî de serbixwe bin.

## Kaxeza Duyemîn: Ketwarê Perwerdeyê û Hînkirinê di Bajarê Reqayê de

**Rêxweşkirin:**

Îro Reqa di bin desthilata Rêveberiya Xweser a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ye, piştî ku hêzên li pey hev di van diwanzdeh salên dawî de serdestiya wê parêzgehê kirin, ew heya sala 2011an de di bin desthilata rijêma Sûrî de bû, û di sala 2013yan de kete bin destê hêzên rikber, weku cara yekê ji bin desthilatdariya rijêmê dertê, û piştre di navbera sala 2014an û ta mijdara sala 2017an de bajar kete bin destê rêxistina Dewleta Îslamî ya naskirî bi navê DAIŞ, û di heyama rizgarkirina bajêr ji va rêxistina terrorist bajar bi temamî hate rûxandin, û qebareya wêraniyê derdora 80% ya jêrxaneyê bû, ji ber lêdanên asîmanî tevî avahiyê hînkirinê û dibistanan.

Ev Lêkolîn li ser şirovekirina rêbazan û ketwarê jîngeha perwerdehiyê, û şert û mercên rojane yên ku pirosesa perwerdehiyê li bajêr, çi di warê karîn an di kiryaran de, bi hemî tiştên ku tê de ji tundiya berçav an sembolîk, an piroseyên cihêkariya tundûtûjiyê û dûrxistinê vedihewîne, çi cihêkarî li ser bingeha nijad û ol be, çi mezhebî an Gender be kar dike, her wiha pêşkêşkirina xwendinekê derbarê ketwarê perwerdeyê li Reqayê, û ev beşa armanc xwe ku naveroka pirtûkên dibistanan yên pejirandî nemaze yên perwerdehiya niştimanî û dîrokî ji

hev veke, çi ji aliyê saziyên perwerdeyê yên ku ji aliyê "Encûmena Perwerdeyê ya Reqayê" ve tên birêvebirin, çi yên taybet bin, divê bê zanîn ku cudahiya di navbera rêbazên xwendinê yên pejirandî di navbera van her du desteyên perwerdehiyê de girêdayî merc û factor û encama ne, yên ku em ê di çarçoveya kaxeza xwe de binirxînin.

**Salixdana Ketwarê Perwerdeyê li Bajarê Reqayê:**

Xwendekarên deverên Rêveberiya Xweser bi giştî, û Reqa bi taybetî, neçar dimînin ku hînkirinê ji du rêbazên xwendinê yên bi temamî cudayî hev werbigrin, Ya Yekemîn: Girêdayî Rêveberiya Xweser e, û di dibistanên wê yên giştî de hatiye pesendkirin, û du cure wê hene. Ya yekem; xwendina ji def xwe yanê ew xwendekarên ku dev ji xwendinê berdane armanc dike, ew "rêbaza ji bo xwefêrbûnê ye, rêbazek hêsan e, ji ber ku xwendekar amade dike, berî ku mamoste were, da ku di dema waneyê de danûstandina mamoste û xwendekar baş pêk were. Ya Duyemîn: ew jî ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hatiye pejirandin û pirtûkên wê bi zimanên erebî û kurdî hene", me hewl da ku em wan pirtûkan bi dest bixin lê pirtûkên wê peyda nebûn, lê di hevdîtinan de hat diyarkirin ku ew rêbaza perwerdehiyê asta xwendekaran li ber çavan nagire, û ne li gorî temen û astên xwendekaran e, wek mînak, rêbaza zimanê erebî tê dîtin: "rêbazeke pir giran û dijwar e ji bo xwendekarên xort û keç" û wek nimûne: xwendekarên di asta yekem de di qonaxa amadekariyê de xwendina helbesta beriya îslamê (Cahiliyê) tête kirin, û tabî ew ji bo xwendekarên kurd dijwariyek zêdetir e.

Di dema ku piraniya şagirtên bawernameyên navencî û duwenavencî berve xwendina rêbaza Wezareta Perwerdehiyê ya rijêma Sûriyê ve diçin, di riya amojgehên taybet yên li Reqayê re, û ezmûnên xwe li devera Sebxa ya di bin desthilata rijêmê de pêşkêş dikin, û dema ku me bi sedema hilbijartina xwendina rêbaza hikûmeta rijêmê hizirîbûn, em li ser du tiştan rawestîyan:

Yekemîn: Ew bi ketwarê dibistanên Reqayê ve tê girêdan, ji ber ku hejmara dibistanên qonaxa navencî û duwenavencî yên ku rêbaza Rêveberiya Xweser dipejirînin tenê (26) dibistanan in, bi hejmareke hindik ya xwendekaran û kadroyên hînkirinê yên xirab, "di komika dibistanên Miawiye bin Ebî Sufyan yên ku li navenda bajarê Reqayê ye, di nav yek ji taxên yekem ên ku niştecihên wê piştî rizgarkirina bajar vegeriyane bajêr, û yek ji herî qelebalix tê de heye, û tê de 40 pol û 59 mamoste hene, di dema ku hejmara xwendekarên dibistana navebcî ji 150 xwendekarên keç û law derbas nabe, û bi ser wê de nebûna hemî alavên pêwîst ji bo prosesa perwerdehiyê, wek pirtûkxane û taqîgehan, û li vir hêjaye ku bal bê kişandin ser cûdahiya mezin di navbera ketwarê polan di dibistanan de, yên ku li derûdora bajêr in, û dibistanên ku li navenda wê ne.




(wêne di riya Google earth pro re hatiye wergirtin, û tê de cîgiehê dibistana Miawiye Bin Ebî Sufyan li bajarê Reqayê, û du amojgehên taybet yên li rex hev diyar dike.

(form1)

Ji aliyê din ve, piraniya mamostayên Reqayê girêdayî sîstema perwerdeya Beşar Esed in, piştî rizgarkirina Reqa ji destê DAIŞ ê, rijêma Sûriyê rê neda karmendên perwerdeyê yên ku tê de kar dikirin ku vegerin wê, û mamosteyên ku li bajêr mabûn xistin bin xala yasayî ya "li ber dest", ku tê wateya ku ew nikare karê xwe yê pîşeyî bike xêjnî di riya arastekirina Wezareta Perwerdeyê re, ji ber vê yekê hejmarek mezin ji mamosteyên jin û mêr karê perwerdehiyê berdan, yan ji tirsa dozgeriyên ewlekariyê, yan jî ji ber birîna mûçeyên wan, ev yek jî bû sedem ku nifşek ji kadroyên perwerdehiyê yên ne ewqas amadekirî ji xwediyên bawernameya duwenavencî derkeve holê û wê valahiyê dagre, valahiya ku ji encama birîna mamosteyên berê û dûrmana wan ji qada kar çêbibû.

Ya duyemîn jî mijara "venasîna" bawernameya xwendinê ye, ku beşeke mezin ji daxwazên xwendekar û malbatên wan û sedemên wan ên çûyîna berve xwendina rêbazên rijêmê di amojgehên taybet de; keçkeka xwendekar got:"Ji bo min bawernameya xwendina duwenavebcî "li vir" danpêdan pê nayê kirin. Ez bawernameya ku li her derê danpêdan pê hebe dixwazim. ev " Tiştê ku dihêle xwendekar yan dev ji dibistanên Rêveberiya Xweser berdin, piştî qedandina qonaxa seretayî, yan jî xwe li polên heştan û nehan li yek ji peymangehên taybet tomar bikin; bawernameyên dibistanên Rêveberiya Xweser yên ku danpêdan pê nebûne, di hişê xwendekar û malbata wî de cûreyek rewatiyê ji rijêma Esed re çêdike, û meyleke civakî çêdike ku bernameyên berdest red bike, û hewl bide ku wan bi pêş bixe an bi wan re biguncîne, û xwe bixe metirsiya dem, pere, û zarokan ji bo pêşkêşkirina ezmûnên bawernameyê li deverên rijêmê.

Pirosesa rewakirina rijêma stemkar, di rêya rêbazên xwendinê û mijara danpêdana bi wê piroseseke berdewam e, ku dûrketin û cihêkarî û tundiya derûnî li dijî beşekî berfireh ji xwendekaran nîşan dide, û perwerde weke amûreke siyasî xuya dike, ya ku rijêma stemkar di sepandin û domandina wê de bi ser ketiye, ev jî nermbûna rijêma stemkar û zehmetiya hilweşîna wê nîşan dide.

Xwendina rêbazên rijêma Sûrî li deverên Rêveberiya Xweser rastî gelek pirsgirêkan tê. Ya herî berçav jî aloziya peymangehên perwerdehiya taybet û destûrdayîna wan e, ji ber ku ev peymangeh xwendekaran amade dikin ji bo ku azmûnên bawernameyên navencî û duwenavencî pêşkêş bikin, û danûstandinê bi rêveberiyên perwerdeyê re bikin, da ku navên xwendekarên Reqayê di daneyên wê de cih bigirin, her wiha sazkirina ezmûnên "pîvana agahîyan", ji ber ku rijêma Esed wan ji xwendinê dûrketî dibîne, lê di 03.07.2023an de hevserokatiya Komîteya Perwerdeyê û hînkirinê li bajarê Reqayê destûrdanên van peymangehan pûç kirin, bi behaneya ku hebûna wan li dijî prensîba perwerdeya bêpere ye. Ev yek dihêle ku malbat kurên/keçên xwe weku di dema dagirkirina bajêr de ji aliyê DAIŞ'ê ve bi dizî wan fêr bikin."

Ji bilî tiştên li jor hatine gotin, pirsgirêka peydabûna pirtûkên dibistanê derket holê, ji ber ku piraniya xwendekaran pirtûkên rijêma Sûrî dikirin, û ji xalên kontrolê yên Rêveberiya Xweser vedişêrin, da ku wan pirtûkan bi dizî derbas bikin, ji tirsa desteserkirina wan bi tevayî an beşekî ji wan, ji ber ku bêhtirê caran pirtûkên dîrok û perwerdehiya niştimanî  bi awayekî taybetî tên desteserkirin, Tiştê ku xwendekaran dihêle ku xwe bispêrin kurtenivîsên ku di pirtûkxaneyan de têne firotin, da ku ji qaçaxçîtiya rêbazên xwendinê ya rijêmê û keysebaziya qaçaxçiyan û rêbendan dûrbikevin, lewra berê xwe didin pirtûka PDf da ku kursên xwe bi rêya ekranên telefonên destan bixwînin."

## Rola Rêxistinên Civaka Sivîl û Bandora Wan li Ser Ketwarê Perwerdeyê li Reqayê

Civaka sivîl û xwecihî li Reqayê piştî rizgarkirina parêzgehê di sala 2017an de hebû, û gelek destpêşxeriyên xelkê ava bûn, da ku kar li ser nûjenkirin û nûavakirina gelek dibistanan bikin, Xebata van destpêşxeriyan di çarçoveya xelkê sivîl de berdewam kir. Di qonaxeke di pey wê re, gelek rêxistinên xwecihî û navdewletî dest bi karê nûavakirin û vegerandina gelek dibistanan kirin, bi hevkarî li gel "Encûmena Perwerdeyê ya Reqayê", bi rêya yadidaşteke ji hevtêgihîştinê di navbera her du aliyan de, vê yekê rê da rêxistinan ku bi nûjenkirina dibistanan rabin, wek destwerdaneke erkî û dem sînorkirî, bi ser de jî rola van rêxistinan di warê pêşkêşkirina piştgiriya derûnî, şopandina kesên

kêmendamên govdeyî û amadekirina dibistanê de, da ku bikaribe kesên xwedî pêdiviyên taybet bihewîne, an jî kesên ji xwendinê qetiyane qerbo bike.

Destwerdana wê bandorek erênî li ser ketwarê perwerdehiyê kir, lê encamên wê yên neyînî hebûn, yên herî girîng ev in: dema destwerdana ya sînorkirî, hişt ku destwerdana awarte û bijartî bo hin dibistanan be, ti nerîneke stratejîk an pêşerojî bo dibistanê nîne, va yeka bû sedema cudahiya di navbera dibistanên heman bajarî de, lewra dibistan ku rêxistinekê serpereştiya wê dikir baş bû, bêyî rawestandina piştgiriyê her tişt tête guhertin" û bandora rasterast ya mûçeyên mamosteyan û sedema cudabûna wan li gorî mûçeyên ku tên dayîn ji aliyê Rêveberiya Xweser ve, ev jî bû sedem ku gelek kesên jêhatî yên ku divabû ku kêmasiya di sektora perwerdehiyê de heye dagirin, ku dest ji dibistanên ku nepiştgirî berdin.

**Sîstema Perwerdeyê li Reqayê û Tundî**


Xwendekaran destnîşan kirin ku di peymangehên taybet de sizayê lêdan û tundiyê nayê dayîn, û li dibistanên di bin kontirola Rêveberiya Xweser de bi awayekî eşkere heye, ew yek ji sedemên pejirandina rêbaza xwendinê ya rijêma Sûriyê ye, ji ber ku yek ji kesên ku di gotûbêjên me de beşdar bibû, bal kişand ser girêdana tundûtûjiyê bi dûrketina xwendekaran ji dibistanan, mana zarokan pênc-şeş katijmêran bi awayekî berdewam, di bin fişarên berdewam de li dibistanê dê zarokan bighîne rewşa teqînê di dema derketina wan de.

Tundiya ku li ser xwendekaran tê kirin ne nû ye, belkî beşek ji sîstema perwerdehiyê ye ku Hafiz Esed ava kiriye be, ji ber ku dibistan mîna baregehên binçavkirinê yên mezin bûn, tê de nizimkirin dermafê mirov dihate kirin, û kesayetiya wî ji holê tête rakirin, û mamosteyek ji me re dibêje: "Divê dibistanên heyî bên hilweşandin û ji nû de bên avakirin, ji ber ku ew weke girtîgehan e, bêhtirî ku dibistan bin, û ger ne weha bûna, rijêmê û DAIŞ weke navendên girtinê û xalên leşkerî bikar nedianîn". Ev yek pêwîstiya guhertina ketwarê dibistanê di asta rojane de û xwezaya têkiliyên jor ta jêr ya ku pirosesa perwerdehiyê bi rê ve dibe, wekî dirêjkirina ber bi desthilatdariyê ve nîşan dide.

Di nava dibistanên Rêveberiya Xweser de kiryarên mîna mamostayên perwerdeya leşkerî û serdestiya wan a li ser xwendekaran hate dîtin, ya ku ji daxwaza cil û bergeke taybet û birêkûpêkkirina por, qedexekirina boyaxa xemlandinê û nizimkirina xwendekarên keç bi bihaneya xemlandinê li pêşiya hevalên wan dest pê dike, û ev yek jî bû sedem ku yek ji xwendekaran ji dibistanên Rêveberiya Xweser derkeve: "dema ku em derbasî dibistanê bûne yek ji mamosteyan an ewa ku karê berdevkiyê dike " rêvebir " em niçar kirin ku em rûyê xwe li pêşiya wê bişon, da ku tekez bike ku me boyaxa xemlandinê li ser

rûyê xwe nehişt” û ya din jî got: “Di katijmêrên dibistanê de girnijîn li min qedexe ye, di pileya ku yek ji mamosteyan carekê li min xist.” û bi bêsinciyê gumanbarî li min kir.

Tê dîtin ku dibistanên Rêveberiya Xweser taybetmendiyeke leşkerî ji dibistanên rijêma Sûriyê wergirtne, û vê yekê bandor li ser têkiliyên di navbera dê û bav û saziya perwerdeyê de kir, ji ber ku xwediyên xwendekaran dibînin ku dibistan çi nirxên li ser asta siyasî û sincî pêşkêş nake, piroblêma di axaftina mamoste bi xwe de û di sinciyên wî de, ew e ku peyvên pîs bikar tînin, û xwe dispêrin şêweyên danûstandina nebaş, û dijminkariya devokî ya eşkere li ser xwendekarên keç û law heye, ev yeka jî di encamên pirsnameyan de diyar dike, ji ber ku 68% ji dêûbavan anîn ziman ku ew tenê dema ku hewce dike diçin dibistanê, lê 51% ji wan ragihandin ku kurê/keça wan pêwîstiya lêvegerîna dibistanê ger ku hewcedarî hebe ji wan dikin, û ev yek nîşana birîna pêwendiya di navbera dêûbav û saziya dibistanê de ye, ya ku destdirêjiya derûnî û devkî li ser xwendekaran dike, dûrî pîvanên perwerdehiyê, û ev e ku kêmbûna nirx û balkêşiya wê li cem civata perwerdekar berdewam dike.




(Ev wêne rêjeya bersivên vê pirsê diyar dike; Gelo ma xwendekarên keç û kur ji ber rewşa xwendinê ya giştî rastî dilzaroyê tên?bêguman bersiv bi awayekî nivîskî û hûrgilî li jor hatine nivîsîn).


(form2)

Ji aliyê din ve %58 ji xwediyên xwendekaran gotin ku wan bi xwe dîtin an bihîstin ku hin xwendekar di dibistanan de rastî destdirêjiyên govdeyî hatin, lê %73 ji wan

li dij derketin ku mijarên girêdayî çanda Gender ê di rêbazên perwerdeyê de bên girêdan, û ev tişt dibe ku bi nasnameya olî ve were girêdan, ya ku piştî dagîrkirina bajêr ji hêla rêxistina DAIŞê ve zêde bû, û hewldana wê ku hişkiya olî li ser deverê bisepîne.

**Şirovekirina Rêbazên Perwerdeyê li Reqayê - Waneyên Dîrok û Perwerdeya Niştimanî**

Li vir em pirtûka perwerdeya niştimanî ya pola nehan a Wezareta Perwerdeyê di Hikûmeta Esed de, çapa 2012/2013, ya ku ji çar beşên perwerdehiyê pêk tê, dixwînin, ku tê de ev mijar hatin: civak, raman, ketwarê Erebî û asoyên pêşdebirina wê, û daxwazên kolonyalîzmê û şêwazên wê yên di welatê erebî de. Ya ku di pêşgotinê de bibîrî tîne ku armanc ew e ku kesatiya niştimanî ya baweriya xwe bi dozên miletê ereb ava bike, û ku xwendekaran fêrî zaniyariyên girêdayî prensîbên sivîl û xwezaya dewletê û stûnên wê û pêşketina ramana siyasî di civakan de bike, ta bighêje deverên desteserkirî ji welatê erebî.




(Di vê Formî de naveroka rêbazên perwerdeya niştimanî ya rêza nehan diyar dike, ew jî zaniyariyên bingehî ne yên ku divê xwendekar werbigre piştî ku wê naverokê bixwîne, ew jî ev in: Girîngiya rêxistinên herêmî û navdewletî, pirensîpên mafên mirovan û rola hikûmetan di parastina wan de, dewlet û stûnên wê û saziyên demoqratîk, pêşketina ramana siyasî di civakan de û perçeyên dagîrkirî ji welatê ereban).

(form3 pilana naveroka rêbazê pirtûka netewî ye)

Di dema ku pirtûka dîrokê ya xwendekarên pola nehan "Dîroka Sûriyê ya Nûjen" ya sala 2019/2020an ji çar beşên perwerdeyê pêk tê, ew jî li gorî rêzê ev in: Asoyên aborî, guhertinên siyasî, reseniya civakê û projeyên rewşenbîrî û destkeftiyên ramanî. û li gorî rêbaza bibîr hatî em ê rêbazan li ser binyada

naveroka wan û têkliya wan bi ketwarê perwerdehiya bajarê Reqayê re binirxînin:

**Pirrengî û Cihêkarî**

Pirtûka perwerdehiya niştimanî bi nêzîkatiya "Civaka Erebî ya Sûriyê" ji koşeya hizirkirin û gotûbêjên girêdayîbûna niştimanî ve dest pê dike. di vegotinê de, di pêşgotina pirtûkê de behsa civaka Ereb hate kirin, weke cureyekî xurtkirina cudahiya nijadî ya Ereban li ser pêkhateyên civaka Sûrî, ya ku rijêma Beis danpêdan bi hebûna wan nekirî, bi rêya desthilata Bav û kur(Hafiz û Beşar) ya ku gelek caran hewil didin ku wê ji holê rakin, di heman waneyê de endamên civaka Sûrî wiha hatine pênasekirin: Endamên civaka erebî ya Sûrî, bi dilpakiya girêdana xwe û pabendbûna xwe bi mijarên niştimanî û netewî...).

الوحدةُ الأولى          المجتمعُ العربيّ السُّوريّ

يتميَّزُ أفرادُ المجتمعِ العربيِّ السُّوريِّ بصدقِ انتمائِهم والتزامِهم القضايا الوطنيَّةَ والقوميَّةَ، ويمارسون حياتَهم الديمقراطيَّةَ من خلالِ مؤسَّساتٍ ديمقراطيَّةٍ تمكِّنُهم من أداءِ أدوارِهم ضمنَ المنظَّماتِ الشعبيَّةِ والنقاباتِ المهنيَّةِ والمجتمعِ المدنيِّ في إدارةِ شؤونِ الدولةِ وقيادةِ المجتمعِ لتحقيقِ المجتمعِ المتطوِّرِ والمزدهرِ.

(Ev wêne ya waneyê yekemîn e ji yekîneya yekemîn ya pirtûka perwerdeya niştimanî).
(form 4)

Piraliya nijadî û olî di beşa sêyem a pirtûka dîrokê de ya ku behsa reseniya civakê dike bibîr hat, û bi awayekî eşkere weke bingeha yekemîn ya çi bilokeke civakî di berjewendiya malbatê de paşguhkirina endamê civakî dest pê kir, her wiha paşguhkirina nijadên din jî bo berjewendiya erebtiyê, wek netewa ku karibû tevayan di hundir xeleka çandî ya dawî û hevbeş de bihelîne, û weke çarçoveyê cihêrengiyê ya ku hemî pêkhatên piştî cenga cîhanî ya duyemîn bihewîne, peyvên pirtûkê wiha hatine gotin: (tevgerîna yên nû hatine li gel civaka Sûrî di çarçoveyeke çandî hevbeş de bû, ew jî neteweya erebî ye, û li ser binyada erebtî girêdayîbûneke şaristanî ye, û zimanê erebî hêmana wê ya herî girîng e). hevpeyvînan bal kişandin ser ku pirtûka dîrokî weku Sûriyê xwedî xwezayeke erebî be danûstandinê dike, û cihêrengiya nijadî û netewî tê de paşguh dike, û bi nerînekê li rêbaza perwerdehiyê wek mînak pirtûka dîrok di warê şirovekirina mîkanîzma danûstandinê li gel belgeyên dîrokî de yên ku pirtûk amade kirine wêneyê nasnameya welatiyekî Sûrî ji devera Îskenderonê bikar tînin, ji bo tekezkirina nasnameya Erebî ya wê navçeyê, ne weku beşek ji dewleta Sûriyê ye,

weku girêdanekê di navbera Erebî û girêdayîbûna Sûriyê de, û pêkhateyên Sûriyê yên ne Ereb ji têgeha welatîbûn, nasname û girêdayîbûna Sûriyê derdixe.

Girêdana girêdayîbûna welat bi yek nijadiyê ew jî ku“ereb e” û zimanê erebî bibe hêmana herî girîng a girêdayîbûna welêt, li bal kesên ku ji netewî û nijadekî cuda wek Kurd, Tirkmen, Asûrî û yên din, hesta dûrketinê û hebûna hemwelatîyekî nedîyar an hemwelatiyekî di pileya duyemîn de çêdike, wekî ku di gengeşiya me ya dîtaneyî a li jor de jî hat behskirin, û çêbûna bertekên li dijî têgînên hemwelatîbûnê, da ku em îro bigihêjin ezmûnek ku tê de encamên paşguhkirina pêkhateya civaka Sûrî ya rasteqîn xuya dike, bi awayê cudakirina nijadî ya berevajî li dibistanên xwendinê yên bajarê Reqayê, yên ku di bin kontrola Rêveberiya Xweser de ne, bi nasnameya nijadî ya ne ereb.


Di hevpeyvînan de, bûyerên dualîbûn û cudakirina li ser binyada nijadî di nav xwendekarên ji neteweyên Ereb û Kurd ên li dibistanên Rêveberiya Xweser de bibîr hatin, û ji sepandina zimanê kurdî weke zimanekî sereke yê rêbaza perwerdehiyê li ser hemî xwendekarên keç û kur dest pê dike, ew yek ji sedemên ku xwendekar ji xwendinê veziqitin e, û gotûbêjan tekez kirin: “Em wek mamosteyên zimanê kurdî, me pir derdeserî kişandin, ji ber ku em rastî bertekên xwendekaran hatin, nemaze dema ku biryara piştpêbestina wê hatiye standin, pir kes bi mijarê re tevnegerîn, nemaze yên ereb, di pola ku ji 30 xwendekarên keç û kur pêk tê de, tu ji 10 xwendekaran zêdetir yên bi mijarê re tevdigerin nabînî, û gelek ji wan dibêjin ku em naxwazin ku zimanê kurdî fêr bibin, em dixwazin ji polê derkevin, sepandina ziman, nasname û neteweyek taybet li ser yê din bertekên dûrxistinê çêdike, wek ku di sepandina zimanê kurdî de li ser xwendekarên ereb/kurd, û li şûna hewildanên êkbûna “yên din” (bi dîtina ku “yê din ”di vê çarçoveyê de wekî her kesê/a ku rastî dûrxistin û cudakariya neyînî hatibê ye), em dibînin ku em li pêşiya pirosesa hilberîna hawîrdorek ku ji ”yên din” nefret dike re rû bi rû ne. Di bûyereke mîna wê de yek ji xwendekarên keç ku li dibistanekê dixwend wiha got: “Di polê de xwendekarên kurd kursiyên yekem girtin û hin ji wan xwestin ku “yên din” tevî xwendekarên erebîaxêv jî bi kurdî biaxivin, ji encama vê yekê tu dibînî ku xwendekar dabeşkirî ne, yên kurd tenê bi kurdan re dicivin, û xwendekarên Ereb jî li aliyê din mîna wan in.”

Hin karmendên di beşa perwerdeyê li Reqayê de diyar kirin ku nexwestiya xwendekaran ji danûstandina bi hevkarên xwe re, bi belavnekirina pirtûkên rêbazê yên çapkirî li ser xwendekaran heya roja amadekirina vê lêkolînê girêdayî ye, ji ber ku xwendekar neçar dimînin ku bi riya fêrbûna xweser xwe bispêrin, "eger pirtûk peydakirî be" ew e tiştê dihêle têkildariya baş hebe û xelk û xwendekar bêhtir bizavê bikin ku bawernameya xwendinê ya ku ji aliyê rijêma Sûriyê ve hatiye danpêdankirin werbigrin, ji ber ku ew di warê rêveberî û sîstema perwerdeyê de bihêztir e, û ew tişt rewatiya wê zêde dike, û desthilata defakto

wek desthilateke awarte nîşan dide, û hêmanên domdariyê li bal wê nîne,  û li ser asta dîtaneyî rêveberiya xweser weke desthilateke ku ta herdem bimînê ye lê bi rastî kiryarên wan weku yê ku dê sibe barkê ne."

Di çarçoveyeke din de, paşguhkirina ku rijêma Esed bi rêya saziyên xwe yên perwerdeyî ên çandî û heta xizmetguzariyê derbas kirî, ta ku bigihêje paşguhkirina parêzgehan, tê xuyakirin ku di dîrokê de tu rol û bûyerên girêdayî bakurê rojhilatê Sûriyê nehatine gotin, ji bilî berfirehkirina aborî ya bajarê Helebê, û ku"surgûnkirina Fexrî Elbarûdî di serdema Fermandeya Fransî di Sûriyê de" bû, bêyî ku behsa rola deverê di Peymana Sevrê de an jî di konferansa lihevhatinê ya Parîsê de 1919an de bike, û bi temamî tevgera herêmê li dijî desthilatdariya Fransa hate paşguhkirin, an jî veberhênanên eva  paşîn di wê de, di axaftinên me de wiha bibîr hat: “Herêma Cezîrê qehremanên xwe hene ku rûbirûyê dagirkeriya Fransiyan bûne, wek “Remezan Paşa Şilaş” yê ku bibîr nehatî, an bîranîna çi şêwe ji şêweyên berxwedaneke li dijî dagirkeriya Fransiyan di vê deverê de.

Her wiha tê dîtin ku pirtûkê navê "Dewleta Çiyayên Laziqiyê" û "Dewleta Cebel Elereb" girtiye, tevî ku di belgeyên dîrokî de navên "Dewleta elewî" û "Dewleta Çiyayê Durzî" hatine destnîşankirin. Ev jî hewldaneke ji bo berovajîkirina dîrokê û xebata li ser pêşkêşkirina vegotina ku ti cudahiya mezhebî derbarê mezheba “serokê artêş û hêzên çekdar” hilnegire, û wek cureyeke karê rêbazkirî ye ji bo jinavbirina hemû mezheb û nijad di yek beroşê de, da ku mezheba partiya ereb tenê bimîne.




(Vê nexşeyê qala Sûriyê di dema ku ji gelek dewletan pêk dihat kiriye,wek: Dewleta Helebê, Dewleta Ciyayê Laziqiyê(Dewleta Elewiyan) Dewleta Libnanê ya Mezin, Dewleta Şamê û Dewleta Çiyayê Ereban(Çiyayê Duruziyan).

(form 5)

Û derbarê piralî û cihêrengiya olî ya ku Sûriye li ser hatiye avakirin, navên gelek kesayetiyên dîrokî yên ku rolek di veguhertinên aborî yên li welat de lîstine, hatin binavkirin.


لصناعة البروكار خصوصيّة في الحرف التقليديّة السوريّة، فقد ازدهرت إلى أنْ وصل صداها إلى جميع بلدان العالم، وارتبط اسمها بمدينة دمشق التي ابتكر أهلها أنواعاً منها حتى أصبحت كنزاً أثريّاً مرتبطاً بهويّة دمشق، ومن أنفس المقتنيات التي يتباهى بها الملوك والأمراء، كالملكة **إليزابيث الثانية** التي ارتدت ثوباً من البروكار الدمشقيّ بمناسبة زفافها، نُسج خصّيصاً لها من الحرير الطبيعيّ الموشّى بخيوط الذهب والفضة، والمحلّى برسوم نباتيّة خاصّة وطيور، قام بنسجه المعلّم قاسم الأيوبيّ على نول يدويّ قديم، في معامل النعسان بباب شرقيّ، شهدت هذه الصناعة تعديلات بإدخال آلات حديثة، (**كأنطون مزنر**) الذي نقل صناعة البروكار من نول يدوي إلى نول ميكانيكيّ كهربائيّ عام ١٨٩٠م، فوُجدت أعداد كبيرة من المصانع كالشركة السوريّة للنسيج تأسست عام ١٩٣٧م.

الشكل (١٢): الثوب الذي ارتدته الملكة إليزابيث الثانية، مع نماذج من قماش البروكار الدمشقيّ.

(Di vê nivîsa wêneyî de li ser pîşesaziya Birokar hatiye axaftin, ya ku bi bajarê Şamê ve hatiye girêdan, ji ber ku xelkê wa bajarî ev cure pîşe derxistibûn holê, û kirasê di wêne de jî ew e yê ku şaha Ingilîzî Elizabeth Alexandra Mary li xwe kiribû).

(form 6)

Lê, ew şêwaza pirrengiya olî ya pêşniyarkirî li Sûriyê bi pîvana îslamî-xiristiyanî ve sînordar dike, û ev yek bi ronîkirina rêyên ziyaretê yên Xirîstiyanî û Islamî li Sûriyê tê piştrast kirin, ev yek li gel hewildanên desthilatê ye ji bo jinavbirina her nasnameyeke din, bi behaneya ku negirêdayînbûna ji bilî welat û partiyê, bêyî ti nasnameyeke olî, nijadî û heta navçeyî, ji ber ku her behsa wê yekê bibe dê kesayetiyên dîrokî yên ku ji aliyê mezheb an nijad ve bi wan ve girêdayî ne geştir bike, ev yeka hewildanên domdar ên desthilatdariyê yên ji bo diyarkirina pîvanên girêdayîbûnê û çarçovekirina wê di nav sînorên nasnameya ku ji jor de hatiye sepandin piştrast dike, li şûna ku li ser xurtkirina cihêrengiyê bixebite.



سورية مهد الدّيانات:

أدّت سورية دوراً أساسيّاً في التّاريخ وتطور الحضارة الإنسانية، منها انطلقت الأديان ابتداءً من عبادة الآلهة إلى الديانات التوحيدية، وظلّت أرضها مرحلة تاريخية طويلة جزءاً مهماً من طريقي الحج المسيحيّ والإسلاميّ، اعتنى أبناؤها بهذه المسارات وأولوها اهتماماً خاصاً.




الخريطة (١): طريقي الحج المسيحيّ والإسلاميّ عبر سورية.

أبني أفكاري:

(Di vê nexşeyê de riya heca xiristiyan û mislimanan diyar dike, û Sûriyê weke dergûşa olan nîşan dide).

(form 7)

Di çarçoveyeke pêwendîdar de, pirsa (Gelo ma divê ku rêbazên xwendinê ji olan serbixwe be?) ya ku di pirsnameyê de hatiye nîşandayîn bi bijartina “Na” ji %67 hat bersivandin, ev yek seruştiya olî ya xelkê Reqayê radixe ber çavan,  ya ku di dema şer û desthilatdariya DAIŞ'ê de zêde bûye, û diyar kir ku gelek faktor hene ku di vê lêkolînê de nayên destnîşankirin, û dibe ku di çarçoveyek din de kar li ser bên kirin, di dema ku 27% bersiv dan ku ev rêbaz ji olê serbixwe ne, û bilebile ev bijarde encama bandora wan bi arasteyên Rêveberiya Xweser e, ya ku ji hêla nasnameya nijadî ve tête livandin, an jî wekî bertekek berûvajî li ser salên desthilatdariya DAIŞa tundrew in.




(Di va perçe wêneyî de rêjeya bersivên vê pirsê xuya dike: Gelo ma divê ku rêbazên hînkirinê ji olan serbixwe bin?

(form 8)

**Gender û Bîranîna Jinan di Rêbazên Dibistanan de**



الشكل (١٠): مصنع الحرير في لبنان عام ١٨٨١م، مرحلة فرز الحرير وتنظيم لفّ الخيوط.

(Wêne karsaza hevirmiş ê ye li Dewleta Libnanê di sala 1881z qonaxa cudakirina hevirmiş û lêgerandina deziyan).

(form 9)

Rêbaza rijêmê a guhertî ya ji bo pirtûka dîrokê rola jinê û di çarçoveya qalibekî de, an ji bo gihandina bîrokeyekê, an jî ji bo pênasekirina wê wekî piştgirê mêran e bikar anî, tevî ku çend agahî derbarê jinan hatin gotin, û "Nazik Elabêd wek

"Mînaka têkoşîna jinan a li dijî desthilatdariya Fransayê hate binavkirin, û navê wê piştî vegotinên avaker ên li ser rawestana jina berxwedêr li çiyayên Laziqiyê li kêleka şoreşa ku lehengê wê "Şêx Salih Elelî" hat nîşandan, û hevjîna Şêx Salih Elelî weke mînak pêşenga jinan bi nav kir, weke cureyek ji rakêşkirina jinên kes û derdora alîgiriya rijêmê dikin re, di dema cengê de, nemaze jinên ku ji deverên peravê yên Sûriyê ne, di heman demê de bi tevahî tevgerên dîrokî yên jinên Sûriyê li parêzgehên mayî yên Sûriyê û çalakiya wan a li dijî desthilatdariyê paşguh kir, tevgera jinan zelal û bibandor bû, û di ti qonaxeke dîrokî ya diyar de ranewestiya, û pirtûkê ew bi çend wêneyan kurte kir,  yên ku mafê xwe di gotûbêjên dibistanê de negirtin, ji bilî paşguhkirina zimanê hestiyar yê Gender ê.

١- كيف واجه السوريون الاحتلال الفرنسيّ لأراضيهم؟ من خلال: ........، ........، .......
٢- لماذا انضم المتطوعون لثورة جبال اللاذقية؟
٣- علام يدلّ عقد الشيخ صالح العلي مؤتمراً قبل إعلان الثورة ضد الاحتلال الفرنسيّ؟
٤- لماذا اتخذت المرأة هذا الموقف من الثورة؟
٥- ما أسباب انتصارات ثورة جبال اللاذقية ضد الاحتلال الفرنسيّ؟
٦- ما الدليل على الانتصارات التي حققتها الثورة؟
٧- أ حقيقة أم رأي تصريح الاحتلال الفرنسيّ؟
٨- فسر أهميّة منحوتة الجرف الصخريّ؟
٩- ما أهميّة التعاون والتكاتف بين أفراد المجتمع السوريّ في التصدي للاحتلال؟
١٠- تحترم شعوب العالم وتقدر أبطالها وتعمل على تخليد ذكراهم من خلال صنع نصب تذكارية لهم، هل رأيت نصباً تذكارياً لأحد الأبطال السوريين؟ صف لنا هذا النصب من حيث: مكان وجوده – كيف تعرفت على شخصية صاحب النصب التذكاريّ – بيّن رأيك.

(Di vê wêneyê de weha hatiye nivîsîn:
1-Çawa Sûrî rûbirûyî dagîrkerê Firansî bûn?
2-Çima xwebexşkar tevlî şoreşa çiyayê Laziqiyê bûn?
3-Lidarxistina kongirekî berî ragihandina şoreşê li dijî Firansayê ji aliyê şêx Salih Elelî ve çi nîşanê dide?
4-Çima jinê ev helwest derbarê şoreşê stand?
5-Sedemên serkeftinên şoreşa çiyayên Laziqiyê li dijî dagîrkerê Firansî çi ne?
6-Nîşanên ku şoreşê pêk anîne çi ne?
7-Ma rastiye an tenê nerîn e daxwiyaniya dagîrkerê Firansî?
8-Girîngiya peykerê ji latan rave bike?
9- Girîngiya hevkariyê di navbera kesên civaka Sûrî de di rûbirûbûna dagîrker de çiye?
10-Gelên cîhanê rêz û hurmetê didin qehremanên xwe û ji bo bîranîna wan peykeran çê dikin.

(form 10)

١- ما أعمال الجنرال غورو لتنفيذ اتفاق سان ريمو؟
٢- كيف أثّر احتلال فرنسا المناطق الداخلية على ثورات المنطقة الغربية؟
٣- ما أهميّة معركة ميسلون؟
٤- كيف استعدّ الوطنيون لمعركة ميسلون عام ١٩٢٠م؟
٥- ما نتائج معركة ميسلون؟



**النقيب نازك العابد:**



تميزت نازك العابد بنشاطها ونضالها ضد الاحتلال
الفرنسيّ في سورية

Page 60 / 144

(Em di vê wênenivîsê de du mijarên ji hev cuda dibînin, yek tê de dibêje:
1-Karên Ciniral Goro bo cîbicîkirina rêkeftina San Sîmon çi ne?
2-Çawa dagîrkeriya deverên navxweyî ji aliyê Firansa ve bandor li şoreşên devera rojavayê kir?
2-Çi giringiya pevçûna Meyselon heye?
3-Çawa welatparêzan amadehî bo pevçûna Meyselon ya sala 1920an kirin?
5-Encamên pevçûna Meyselon çi ne?
Û Perçê din ji wêne tê de hin agahdarî li ser Nazik Elabid hene, ya ku li dijî dagîrkerê Firansî têkoşerî kiriye.

(form 11)


إرادة قوية من بلدي:

١٩٢٠م: مناقشة حق الانتخاب للمرأة السورية في المؤتمر السوريّ.

١٩٤٩: حصلت المرأة العربيّة في سورية على حق الانتخاب مشروطاً بشهادة ابتدائيّة.

١٩٥٣: منحت المرأة حقّ الوصول للنيابة، وتصدّر الجلسات ووضع القوانين، وكانت المربيّة **ثريا الحافظ** أوّل سيدة تترشح للمجلس النيابي، لكن لم يحالفها الحظ في حينها.

١٩٦٥م: **عائشة دباغ** أوّل امرأة في سورية والوطن العربيّ تدخل المجلس النيابيّ.

أبني أفكاري:

١- ما الحقوق التي حصلت عليها المرأة السّوريّة؟

٢- علام يدل إقرار شرط الحصول على الشهادة الابتدائيّة للترشح للانتخابات؟

٣- ما شعورك عندما تعلم بأن أوّل امرأة في الوطن العربيّ دخلت المجلس النيابي كانت امرأة عربيّة سوريّة؟

(Di vê perçe wêneyî de hin agahî li ser tevgera jina Sûrî hatine rêzkirin:
Di sala 1920an de mafê dengdana jina Sûrî di kongirê Sûrî de hatiye gotûbêjkirin.
Di sala 1949an de jina Sûrî mafê dengdanê wergirtiye li gel merca ku divê bawernameya seretayî pêre hebe.
Di sala 1953an de mafê gihiştina dozgeriyê bo jinê hate dayîn.
Di sala 1965an de Aîşe Debax jina yekemîn li Sûriyê û dewletên ereban a gihiştibû Encumena dozgeriyê.
Û di beşê jêrîn de pirsên girêdayî destkeftên jina Sûrî ji xwendekaran hatine pirsîn.

(form 12)

Navê "Meqbûla Şiliq", nivîskar "Qemer Kêlanî", "Selma Elhaffar", "Sureya Elhafiz" û "Eyşa Eldebax" bibîr hatin, jinên ku pêşeng yên ku hewl dane ku derbasî parlamentoyê bibin, û "Nazik Elabêd", yek ji damezrênerên yekem ên komeleyên sivîl di salên pêncî yên sedsalê borî de bû, bi rastî bîranîna van jinan ne ji valahiyê hat, ji ber ku hemî di heyamek berî Esed bighê ser desthilatê de bûn, û rola wan xuya bû, û kar kirin, bi çalakiyên ku mîna yên ku hevjîna Serokê Sûriyê Esma Esed li ser dixebite, rêbaz hewl dide ku navê wê bi navê jinên Sûriyê yên pêşeng ve girêde, da ku xwe xuya bike ku di karê civakî de riya wan dişopîne, û piştî çend rûpelan pirtûk bibîr tîne ku Esmai Esed sponseriya kesên taybet dike, di dema ku navê çi jinekê ku di serdema Esed ê bav an kur de çalak bû yan jî karê wê derketibû holê ji bilî wê nehatibû nivîsandin.

**الأولمبياد العلميّ السّوريّ:**

تقيم هيئة التميّز والإبداع بالتعاون مع وزارة التربية السوريّة مسابقة في العلوم الأساسيّة (الرياضيات والفيزياء والكيمياء والمعلوماتيّة وعلم الأحياء) لطلاب المرحلة الثانوية، للكشف عن الطّلاب المتميزين في كلّ المحافظات من خلال الأولمبياد العلميّ السوريّ، وتمثيل وطنهم في المحافل العلميّة الدوليّة، والتي تهدف إلى تقوية المهارات وخلق جيل مبدع من الشباب العربي السوريّ.



الشكل (١٤): صورة تذكارية في تتويج الفائزين الأوائل في المنافسات النهائية للأولمبياد العلميّ السوريّ برعاية السيدة الأولى أسماء الأسد بتاريخ الأثنين ٢٠١٧/١/٢٢م.

(Wêneyeke bîranînê bo kesên di pêşbaziyên dawîn de ya lîstikên olompî hatine xelatkirin, ya ku bi serpereştiya Jina Sûrî a yekemîn Esmai Esed bû di 22/1/2017an de).

(form13)

**موقف إنسانيّ:**

ظهرت في سورية جمعيات تُعنى بالمجتمع وشؤونه، فمنها من اهتمّ بالأعمال الخيريّة وافتتاح المدارس كالجمعيّة الخيرية التي تأسست عام ١٨٧٨م، ومنها اهتم بالمرأة والطفل كجمعية (حماية الطفل) التي أسستها **مقبولة الشلق** في قرى الغوطتين (داريا) وبلدة دمّر، بينما أخذت (جمعية مبرّة التعليم والمواساة) على عاتقها تربية الأطفال الأيتام، أسستها الأديبة السوريّة **سلمى الحفّار** مع زميلاتها عام ١٩٤٥م، ولم يتوقف عطاء السوريين هنا بل امتدّ حتى شمل مختلف أنحاء العالم، فالمهاجرون السوريون أغدقوا على كلّ مشروع إنسانيّ سواء أكان داخل سورية أم خارجها، وأسّسوا جمعيات خيريّة في بلاد المهجر كـ«الميتم السوريّ» في **سان باولو** و«المستوصف السوريّ» في **تشيلي**.



الشكل (٦): الأديبة والروائيّة سلمى الحفار (١٩٢٣-٢٠٠٦م)، ولدت في دمشق والدها لطفي الحفار أحد أقطاب الكتلة الوطنيّة في سورية كان رئيساً للوزراء عام ١٩٣٩م، نشرت أولى مقالاتها في السادسة عشرة من عمرها في مجلة «الأحد» فازت بجائزة البحر المتوسط الأدبيّة من جامعة بالرمو في صقلية عام ١٩٨٠م، ووسام «شريط السيدة» من إسبانيا عام ١٩٦٥م، من مؤلفاتها كتاب لطفي الحفار.

أبني أفكاري:

Page 87 / 144

(Di va wêneya nivîskî de hin zanyarî derbarê dibistan û komeleyên ku li Sûriyê hatine damezrandin berçav dike, nemaze ya ku di sala 1878an de hatiye çêkirin, û hin agahî li ser torevan û romannivîsa Sûrî Selma Elhefar dihewîne, ya ku di sala 1923an de hatiye dinê û di 2006an de koça dawî kiriye).

(form 14)



الدّرس الثاني

سوريّات صنعنَ المجد

دور المرأة لا يمكن أن تختزله السطور فهناك المئات من النساء.. في القرى والمنازل والمدارس والمعامل، قدّمْن الكثير وشاركْن في صنع الحياة العامة، رأينَ أنّ الحياة تستحق أنْ تعاش بواقع أفضل استطعن أن يضعن بصمتهن في تاريخ سورية الحديث.

مرآة التغيير في المجتمع:

تعد تربية البيت أساس لتطوير الواقع الاجتماعيّ، فالأسرة تحقق الاستقرار وتنمّي شخصية الفرد ليتمكن من تطوير ونقل معارف وأهداف مجتمعه، ولأن للمرأة دور كبير في تنشئة وتوجيه أبناء المجتمع، ساهمت في العصر الحديث في بناء مجتمع قوي متماسك من خلال عملها في المجالات كافّة: الثقافة والتربيّة والتجارة والاستثمار، والصناعة الوطنيّة.

**تقول الرائدة قمر كيلاني عن نفسها:**


«ولدتُ في دمشق عام ١٩٢٨م، ودرستُ فيها، ودخلتُ جامعتها التي تخرجتُ منها حاصلة على إجازة في اللغة العربيّة، ثم دبلوم التربيّة عام ١٩٥٤م، اشتغلتُ بالتدريس، وساهمتُ في تأسيس **اتّحاد الكتّاب العرب**، نشرتُ عدداً من الدراسات الأ...

Page 89 / 144

(Di vê wênepostî de hin agahî li ser eynikên guhertinê di civakê de derbas dibin, û nemaze rola jinê tê de, û hin zanyariyên girêdayî nivîskara Sûrî Qemer Kêlanî dihewîne).

(form 15)

Qalikirina piçekê ya jinan û rolên jinê di rêbazan de, cihêkariyê li gorî Gender (wekî di çarçoveya dîtaneyê de) berdewam dike, û me datîne pêşiya rasteqîniya hebûna cihêkariya dûrxistinî di warê rêgehî de, di girêdana "erebbûna" jinan bi mercê ku ew mafê dengdanê bistîne, ev cihêkarî di asta zimanî de jî dînamîka dûrxistin û cudakirina pêkhateyên din derdixe holê, her wiha em girêdana belgeyên ku “Erebîzmê” weke nasnameyeke siyasî ya sepandî dibînin, û nirxên “destkeftiyên” jina Sûrî kurt dike, bi girêdana wê bi têgeha erebiyê re, ya duyemîn: Hewldana ji bo kurtkirina dîroka jinan bi awayekî zelal nîşan dide, û diyarkirine ku ew îro di rewşeke baştir de ne, bi awayekî ku li dijî rastiyê ye, nemaze ku raporên navndewletî yên vê dawiyê balê dijşînin ser paşguhkirin, dorpêçkirin, û tundiya ku îro jin rastiyê tên.




(Di wêneyê de dergehê pirtûkxaneya Elzahiriyê li Şamê tê xuyakirin, û giropek ji jinên ku mamostetî di amojgeha Heleb de di sala 1968an dikirin xuya ye, her wiha pirtûkxaneya Esed ya niştimanî li Şamê ya ku di sala 1984an de vebibû).

(form16)

Sêyem: Derketina van nakokiyan di navbera ketwarê niha û texmînên derbarê rastiya jinên Sûriyê de, bikaranîna Wezareta Perwerdehiya Sûriyê ji pêwîstiya vegerandina rewşa berê ya ku ji aliyê Wezareta Perwerdehiya Sûriyê ve hatibû destnîşankirin, bo armancên pirpogendayî ji rijêmê re, wek ku piştgiriya mafên jinan bike ye, û bi taybetî danasîna wêneya şervanên jin di nav refên artêşa dewletê de, yan jî di nav Hêzên Sûrîya Demokratîk de, ya ku gelekî belavbûye û deng vedaye, û hewl daye ku standardîze bike, di riya vegotina xwe ya dîrokî re, û ketwarê heyî biçespîne.





(Wêne nexşeya dewletên ereban e, û li ser wê bersivên pirsa li jorî nexşeyê hatiye pirsîn xuya dike, dema dibêje: gelo ma çêdibe ku jin ji malê derkeve bêyî destûra xwediyê malê?

(form 17)

**Kesperestî**

Mijarên perwerdehiya niştimanî û dîrok piraniya bargiraniya bîrdozî ya ku rijêma Sûriyê di beşa perwerdehiyê de bi kar tîne, dihewîne, û em dikarin bêjin pirensîpên gelemperî ne, ji ber ku endamê Sûrî ji salên heyştê de ketwarekî cudayî tiştên ku di rêbazan de wergirtine dijî, û li gorî vê yekê, me ji dêûbavan nêrîna wan derbarê serxwebûna rêbazên perwerdehiyê ji siyaseta hikûmetê pirsî? û ji wan 79% tekezî li pêdiviya veqetandina wê kirin, ev yeka haya dêûbavan ji ketwarê rêbazên xwendinê ya Sûriyê nîşan dide, ji ber ku ew amûrek bîrdozî ye ku xizmeta hêza serdest dike, di heman demê de 19% dîtin ku ew bi vê yekê re hevaheng e. (form 21)




(Di va wêneyî de rêjeya bersivên vê pirsê ne; Gelo ma divê ku rêbazên perwerdeyê ji nerîna siyasî cuda bin?).

(form18)

Pirtûka Perwerdehiya Niştimanî wekî alavekê ji bo sepandina rênimayiyên serokê desthilatê li Sûriyê bi xurtkirina hest, sembol û rêzikên ku niştimanperwerî li ser bingehê wan wek peyveke gelekî fireh hate bikar anîn. Pirtûkê bi danasîna girêdayîbûna niştimanî wiha dest pê kir: "Girêdana ku welatiyekî bi welatê wî ve girê dide, û li ba wî di ser têkiliyên eşîrî û êlî re ye, û beşdarbûna di bone û cejnên niştimanî de"(form 22), hêjayî gotinê ye ku ev çapa ji rêbazê ya nûavekirî û piştî tevgera gelêrî di sala 2011an de dest pê kir, dema ku têgeha welatparêziyê bi pabendbûna bi al û sirûda neteweyî ve hat girêdan, dest bi hînkirinê kir. û kesên ku tevlî serhildana Sûriyê bûne, û ala serxwebûnê rakirin û sirûda rijêmê red kirine, ji xeleka girêdayîbûnê tên derxistin. Tiştê ku hişt ku em di vê beşî de li ser girêdana neteweyî biaxivin, gotara ku arasteyî xwendekaran bibû, ya ku hestên welatparêzî û kesayetiya takekesî ya ku giyan bi heza xwe guncan dibe, da ku bibe beşek ji pêkhateyek mezintir, û mirov bi Sûriyê û sembolên wê yên niştimanî wek a û sirûda niştimanî ve girê dide. Yên ku bi artêş û hêzên çekdar re rasterast girê dide, da ku di waneya pêş de werin, û li ser sê desthilatdarên dewletê biaxivin, li gorî pênaseyên ansîklopediya siyasî, û pêwîstiya cudakirina desthilatdaran ji hev berovajî dike, û wan weke desthilatdarên ku ji hev veqetandina wan zehmet e berçav dike.

### مفهومُ الانتماءِ الوطنيِّ:

تتشكّلُ في حياةِ الفردِ مجموعةٌ كبيرةٌ من الانتماءاتِ الاجتماعيّةِ والسياسيّةِ والفكريّةِ والدينيّةِ... تؤثّرُ في مسارِهِ وسلوكِهِ، ويبدأُ الانتماءُ لدى الفردِ من دوائرَ صغيرةٍ تأخذُ بالاتّساعِ بدءاً من الأسرةِ وجماعةِ الأصدقاءِ والزملاءِ في المدرسةِ والمجتمعِ المحلّي إلى أنْ تصلَ إلى دوائرَ أكثرَ اتّساعاً كالانتماءِ الوطنيِّ والقوميِّ، وهنا تتشكّلُ الرابطةُ التي تجمعُ المواطنَ بوطنِهِ وتسمو لديه فوقَ العلاقاتِ القبليّةِ والعشائريّةِ...، وتتمثّلُ بالتزامِ الفردِ القيمَ والمبادئَ الوطنيّةَ التي يعتنقُها، ويقدّرُها جميعُ أبناءِ الوطنِ، وتتجلّى مظاهرُ الانتماءِ بالاعتزازِ بالرموزِ الوطنيّةِ كالعلمِ والنشيدِ الوطنيِّ... والمشاركةَ في المناسباتِ والأعيادِ الوطنيّةِ، وأداءِ الواجبِ بدقّةٍ وإتقانٍ، والقيامِ بالأعمالِ التطوّعيّةِ بأنواعِها كافةً، وتقديسِ الوحدةِ الوطنيّةِ والمحافظةِ على ثرواتِ الوطنِ،واحترامِ قوانينِ المجتمعِ، وتشجيعِ المنتجاتِ الوطنيّةِ، والشعورِ بالحنينِ إلى الوطنِ في حالةِ البعدِ عنه، والدفاعِ عن الوطنِ حينَ يتطلّبُ ذلك.

**أغني معلوماتي**

حماةَ الديارِ عليكمْ سلامْ أبتْ أنْ تذلَّ النفوسُ الكرامْ
عرينُ العروبةِ بيتٌ حرام وعرشُ الشّموسِ حمًى لا يُضامْ
ربوعُ الشّآمِ بروجُ العَلا تُحاكي السّماءَ بعالي السَّنا
فأرضٌ زهتْ بالشّموسِ الوِضا سَماءٌ لَعَمرُكَ أو كالسَّما
رفيفُ الأماني وخفقُ الفؤادْ على علَمٍ ضمَّ شملَ البلادْ
أما فيهِ منْ كُلِّ عينٍ سَوادْ ومن دمِ كلِّ شهيدٍ مِدادْ؟
نفوسٌ أباةٌ وماضٍ مجيدْ وروحُ الأضاحي رقيبٌ عتيدْ
فمنّا الوليدُ ومنّا الرّشيدْ فلمْ لا نَسودُ ولِمْ لا نشيدْ؟

مستند(٤)



**من قراءتك النّصّ والمستندات حاول أنْ:**

- تضعَ تعريفاً للانتماءِ الوطنيِّ.
- تستنتجَ مظاهرَ الانتماءِ الوطنيِّ.

(di vê wêneyî de danasînek derbarê girêdaybûna niştimanî û sirûda Sûriyê Humat Eldiyar (Parêzgehên War).

(form19)

Ne gengaz e ku li Sûriya ku li ser bingeha desthilatdariya takekesî ava bûye, her sê desthilatdarî ji hev bên veqetandin, bi nûnertiya kesayeta Hafiz Esed yê ku tekane girêdana van desthilatdaran bû, ji ber ku ew serokê dadwerî û cîbicîkar û yasayî bû.

(form 23)

مستند(٥)

إن جوهر مبدأ فصل السلطات يتلخص في دعامتين الأولى تقسيم وظائف الدولة إلى ثلاث وظائف (تشريعية، تنفيذية، قضائية)، والثانية عدم الجمع بين هذه الوظائف الثلاث في سلطة واحدة.

وبما أن عمل هذه السلطات متكامل من الصعب تطبيق الفصل العضوي بين هذه السلطات بشكل كامل.

الموسوعة السياسيّة

(Ev wêneya kurt agahiyên li ser gewherê cudakirina desthilatan diaxive).

(form 20)

Ji ber vê yekê perwerdeya niştimanî yekem deriyê îdyolojiya civaka Sûriyê bû, ya ku ji tu kesî nayê veşartin, û di hevdîtinan de yek ji bavan nêrîna xwe li ser pirtûka perwerdehiya niştmanî wiha anî ziman: “Bi rastî ez jê re nabêjim perwerdehiya niştimanî, ji ber ku ji destpêkê ve perwerdeyeke bîrdozî bû, û beriya sala 2011an pirtûka perwerdehiya niştimanî li ser bingeha pîrozkirina desthilatê bû”.

The Separation of Powers

Séparation des Pouvoirs

مبدأ سياسي للحكم ، يقوم على أساس فصل السلطات الرئيسية الثلاث للحكم : التشريعية ، والتنفيذية والقضائية ، بعضها عن بعض ، بهيئات تنظيمية مستقل كل منها عن الأخرى .

الدافع الرئيسي لظهور هذا المبدأ السياسي ، الخوف من الاستبداد الذي يترتب على تركيز السلطات الثلاث في يد واحدة أو هيئة واحدة .

دعا هذا المبدأ جون لوك في انجلترا ، ومونتيسكيو في فرنسا في كتابه « روح القوانين » . وقد اتخذ اساسا في دستور الولايات المتحدة الامريكية .

لكن التطبيق العملي هذا المبدأ على مستوى الحكم الواقعي اثبت استحالة الفصل المطلق بين السلطات الثلاث مما جعل من المبرر واقعيا حدوث تداخلات بين السلطتين التنفيذية والتشريعية وجوازا نسبيا لكل منها للقيام بمهام الأخرى .

أما السلطة القضائية فقد بقيت مستقلة نسبيا باعتراف جميع انظمة الحكم والدول الديمقراطية ضمانا لنزاهتها وعدالتها .

وتختلف نظم الحكم باختلاف سيادة او موازنة السلطتين التشريعية والتنفيذية .

تسود السلطة التشريعية في النظام المجلسي وتسود السلطة التنفيذية في النظام الرئاسي . وتتوازن السلطتان في النظام البرلماني .

٥٤٦

(Di va wênenivîsa li jor de behsa pirensîpa siyasî ya desthilatdariya li ser bingeha cudakirina her sê desthilatan dike, û tirsa ji stemkariyê ya ku sedema sereka ji

derketina pirensîpê re, û ev pirensîp John Locke li ingiltra û Montesquieu li Firansa xwestka wê kiribûn, û li Emerîkayê bû bingeh ji destûrê dewletê re).

(form 21)

Ji wê derê, sembolên niştimanî (al, sirûd, artêş) bi her sê desthilatdarên ku bi yek kesî Hafiz Esed ve girêdayî bûn, û piştî wî Esed ê kur, yê ku hemî postên rûmetê yên wî ji bav de jê re mane girtibûn.

Şêwaza pîrozkirina kesane û dîtina wî wekî rewşek niştimanperwerî sembolî kêm dubare, di pirtûkê de derdikeve pêş. Di rûpela 54an de, peykerekî bîrdariyê li yek ji gundên Tertûsê yê yek ji kesayetiyên ku li kêleka Şêx Salih Elî bû bibîr tê,(form 25) û ji xwendekaran tê xwestin ku li ser bîranîna yek ji lehengên Sûrî biaxivin, û bi ravekirina li ser wê kesayetî rabin, tişta ku dê bi Hafiz Esed bi dawî bibe, nemaze ji ber ku piraniya peyker û bîranînên li Sûriyê yên wî ne, Ew berdewam dike ku wêneyê rizgarker ê serokê "Nemir" derxîne, di waneya paşîn de di heman yekîneya perwerdeyê de.



الشكل (٣): بانوراما برمانة المشايخ بمحافظة طرطوس، فكرة النحات السوريّ عدنان خطيب الذي
حول جرفاً صخرياً إلى أضخم عمل بانورامي نحتي عربيّ، يمثّل صورة القاضي خليل الخطيب في
المنتصف، الذي كان قاضياً لثورة الشيخ صالح العلي والمخبأ الأمين لمستودعات السلاح للثورة، حتى
أنّ الفرنسيين حكموا عليه بالإعدام نتيجة ذلك، إلا أن قادة الثورة تمكنوا من تهريبه، بلغ طول العمل

(Ev penorameya li ser keviran li parêzgeha Tertûsê hatiye çêkirin, û peykersazê Sûrî Ednan Xetîb çêkiriye, û wî hunerkarî kendalekî ji zinêr kiriye penorameyeke hunerî, û wêneyê dadger Xelîl Elxetîb di nîvê peyker de ye, yê ku dadgerê şoreşa Şêx Slahi Elelî bû).

(form 22)

Di bin sernavê "Serboriya Welatekî" de, pirtûk kêşeyên piştî serxwebûnê û hewildanên yekitiya Ereban berçav dike, ya ku digihêje sala 1970, kêliya ku Esed

ê bav hatiye ser desthilatê, û desthilatdariya wî wekî "kêliya aramiya siyasî û aborî” salix dide, li vir hişê xwendekar bi vegotina hêzê hatiye bernamekirin, da ku wî bide bawerkirin ku girêdayîbûna niştimanî ew e welatê ku tê de dijî ye, û ev kes awarte ye, û ew jî nivîskarê serborî an jînenîgariya wî yê herî baş e. (form 26)



مسار التَّصحيح:


قامت الحركة التصحيحيّة بقيادة الفريق حافظ الأسد في ١٦ تشرين الثاني عام ١٩٧٠م وضعت برنامج عمل كان من أهم نتائجه تحقيق الاستقرار الداخليّ وتحقيق تنمية اقتصاديّة واجتماعيّة وثقافيّة، فارتفع شأن سورية عربيّاً وعالميّاً.

الشكل (١٨): الفريق حافظ الأسد، ولد في محافظة اللاذقية عام ١٩٣٠م درس في مدارسها، التحق بالكلية العسكريّة، وقد تولى رئاسة الجمهوريّة العربيّة السوريّة عام ١٩٧١م.

(Li kêlek wêneyê Hafiz Esed nivîs behsa tevgera serrastikirinê bi rayedariya wî di 16 mijdarê sala 1970ê dike, û hin agahiyên li ser Hafiz Esed weku di sala 1930 de hatiye dinyayê û tevlî kolîjeya leşkerî bûye, û di sala 1971an de postê serokatiya Sûriyê wergirtiye).

(form 23)

Pirtûk ber bi gihiştina Beşar Esed bo desthilatê ve diçe, wek pabendbûna bi neguhêrên niştimanî salix dide, û di encama vê pabendbûnê de, Sûriyê rastî "fişarên ji derve" hat, û bi rêya hişyariya gel û kombûna wan li dora kesayetiya "rêber" hat derbaskirin, ango pirtûk hewl dide xwendekaran bi ketwarê ku stemkariya wê de dijîn kedî bike, û bibêjin; van du kesan em gihandin vir, eger komployên derve li ser Sûriyê nebûya, nemaze ya ku Sûriyê armanc dike.(form 27)



**مرحلة جديدة:**

تولّى رئاسة الجمهورية العربية السورية الدكتور بشار الأسد بعد استفتاء شعبيّ عام ٢٠٠٠م، شهد عهده ثباتاً راسخاً في التمسك باسترجاع الأراضي العربية المحتلة والجولان السوري المحتل، ومواقف سورية من القضايا العربية، مع توطيد للعلاقات الدوليّة، في الوقت نفسه بدأت بوادر حركة انفتاح كبير لاستخدام التقانة والتكنولوجيا، مع ارتفاع متوسط دخل الفرد، وقيام مشاريع اقتصادية كبيرة، وظهور صحف جديدة، وتراجع في نسبة البطالة.

وعندما تعرّضت سورية لضغوط خارجيّة عام ٢٠١١م أثبت الشعب العربيّ السوريّ وعيه وتماسكه، من خلال المحافظة على استمرار عمل مؤسسات الدّولة واستقرارها والتفّ الجميع حول شخصيّة القائد لتجاوز هذه الأزمة كما اعتاد السوريون في تاريخهم الطويل.

الشكل (٢٠): السيد الرئيس الدكتور بشار الأسد، رئيس الجمهورية العربية السورية، ولد في دمشق عام ١٩٦٥م، ودرس في مدارسها، درس الطب في جامعة دمشق.

(Qonaxa nû, Beşar Esed di riya hilbijartineke gelêrî re hatiye ser desthilatê, û agahiyên li ser serok ev in: li bajarê Şamê di sala 1965an de hatiye dunyayê, û li beşê bizîşkiyê li zanîngeha Şam xwendiye).

(form 24)


**Rêbaz û Cudabûna Wan ji Ketwarê Niha û Bandorên Wê li Ser Nifşê nû**

Pirtûka perwerdehiya niştimanî pirsgirêkek girêdayî derbirîn û têgehên niştimanî û sivîl ên mafî ku bikar tên dihewîne, ya ku gelek bervajî peyda kirine, hin ji wan berê bi asta dîtaneyî û rêbazî ve hatine behs kirin, û ya din jî bi nakokiya van têgehan li gel ketwarê Sûriyê bi giştî di bin desthilata rijêma Sûriyê de ye, li vir em bala xwe didin berevajiya ku xwendekarên ku van têgehan li bajarê Reqayê ji derveyî desthilatdariya rijêmê ve werdigirin, di rewşek tevlihev a li ser astên siyasî, aborî û civakî de, ji ber ku ev têgeh ji wan re balkêş û qanîker xuya dikin, ev e ya ku yek ji xwendekaran derbirîna wê dike: "Divê şert û mercên bajarê Hemayê, Lazqiye û bajarên din ji "devera me" çêtir bin, lê gelek ji xwendekar şokbûna xwe ji berevajiya di navbera wêneyê pêşkêşkirî de li gel rewşa bajarê ku tê de ezmûnên xwe pêşkêş kirine anîn ziman.

Pirtûk bi wêneyên di pey re gelek berûvajîyan dubare dike, ya hiştiye ku mamosteyên perwerdehiya niştimanî bêjin: “Min hemû gotinên girîng ji bo şagirtên xwe nîşan kirin, û ez bi wan re eşkere bûm, ji ber vê yekê min got: tu neçar e van gotinan ezber bikî, di hişê xwe de embar bikî, û dyîne ser kaxwzê, û piştî wê ji bîr bikî, çimkê ji bingeh de tu pê ne bawer î, di çarçoveyeke pêve

girêdayî de, xwendekarekê têkliya xwe bi sîstema hînkirinê re bi temamî kurt kir, di riya paşguhkirina rêbazan û hiştina wê tenê di asta pejrandina wê ji mamosteyê jin an mêr di sîstema perwerdehiya taybet de, di riya gotina wê re: “Di sala derbasbûyî de min zêdetir ji mamosteyekî ji bo çend waneyan guherî, ji ber ku her roj em li ser hebûna mamosteyekî nû dibihîzin û dibe ku ew ji mamosteyê ku niha waneyê dide min çêtir be."

Nezelalbûna taybetmendiyên sîstema perwerdeyê, xwendekaran dihêle ku ji aliyê berjewendiyê ve biramin, ne ji nirxê mijarên pratîkî ve, ji ber ku ew bi xwendinê re wekî dergehek ji xwendina şaxek taybet li zanîngehê didin û distînin, ketwareke bêyî çi nirxek zanistî ya çaverêkirî tê sepandin, ya ku di pirsnameyê de bi vê pirsê xuya bû: Gelo ma dibistan xizmetguzariyên  perwerdehiyê yên têr ji xwendekaran re bi awayekî baş pêşkêş dikin?(li forma 28 binêr) Rêjeya 65% ji dêûbavan gotin ku ew xirab e û tiştê ku jê tê hêvî kirin pêk nayîne, û yekî ji bavan ev yek piştrast kir û got: "Bi rastî ez neşiyam ku zarokên xwe bi kêrhatina perwerdeyê bi giştî bawer bikim, hetta li ser asta mamosteyên ku bi karê perwerdeyê radibin, ew ne xwediyê şiyaneke pêwîst in, û ne jêhatî ne ku zarokên me jêhatî bikin."




(Di wêne de rêjeya kesên ku bersiv dane li ser vê pirsê: Gelo ma dibistan xizmetguzariyên perwerdehiya xwendekaran bi awayekî baş pêşkêş dikin?).

(form25)

Û derbarê pirsa: Gelo ma xwendekar di encama rewşa giştî ya xwendinê de tûşî dilzariyê dibin? di bersivê de hat gotin ku %57 ji xwendekaran bi dilzariyê re rû bi rû mane,(form2) sedema wê jî em Karin bêjin ku di berûvajiya di nav naverokên pirtûkên xwendinê û ketwar de ye, ya ku li gorî hevpeyivînan pîvanên

din distîne: "Têgehên di Pirtûkê de tiştek e, û ketwar tiştekî din e, em şagirtên xwe hînî tiştan dikin, lê ew bi xwe li ser rûyê erdê tune ye, û ne pêkan e ku xwendekar di vî temenî de van berûvajiyan li hev bîne", hinek din jî dibêjin:"Pirsgirêka herî girîng a ku em rastiyê tên ew e ku di rêbaz an dibistanan de tiştekî hîn dikin û ezmûn jî tiştekî din e, û berûvajiya din a ku tûjtir xuya dike, ew e ku xwendekar di dibistanên Rêveberiya Xweser de rêbazekê dixwîne û ezmênên xwe li gorî rêbazeke din pêşkêş dike, ev tişt ji bilî Reqa û Idlibê li hemû cîhanê çênebûye, tirajîdiya ku em tê de dijîn texmîn bike, bihizir ku xwendekar bi dirêjiya salê rêbazekê dixwîne û ezmûnên xwe jî li gorî rêbazeke dî pêşkêş dike?"

**Temînî:**

Em dikarin dîmenê perwerdehiyê û hînkirinê yê li bajarê Reqayê bibînin, weke ketwarekî tevlîhev û girêgokî ye di hemû astan de, di asta nebûna diyalog û qutbûna peywendiyan di navbera aktorên perwerdeyê de, ji bilî têkiliya sertejêriya desthilatdariyê ya tevaya pirosesa hînkirinê, berûvajî di navbera babet û têgehên ku di waneyên xwendinê de tên û ketwarê jiyana rojane de diyar dike, û bala xwe didin têgihiştina sûdarî ya hejmarî a girêdayî gihiştina pileya herî bilind, weku armanca pirosesa perwerdehiyê ye, ev jî rê dide şêweyê vekîtî û ezberkirinê, ya ku tê de naverokên dûrxistinê yên ku han dide ser tundî û tundiya sembolîk dihewîne, her wiha şêweyê çespandina çanda cihêkariyê.

**Di Warê Perwerdehiyê de:**

1- Şirovekirina rêbazên desthilatdarên "defacto" û gotubêjiya wê ji aliyê Gender ê ve, da ku pîvanên wekhevî, welatîbûn û danasîna bi piraliyê pêk were.

2- Nîşankirina sedemên nebûna planên perwerdehiyê yên ku bi erkên geşepêdanê re hevaheng in, wek nebûna eşkere ya perwerdeya pîşeyî ya girêdayî nûavakirinê wek mînak, weku yek ji astengiyên ketwarê Sûriyê di roja îro de.

3- Hevrêzkariya di navbera komele û rêxistinên ku têkildarî perwerdeyê ne de, da ku destwerdana wan mîna stratejî û berdewamî be.

4- dîtina pirograman bo kesên ku dev ji perwerdeyê berdane, û vegerîna wan bo dibistanan di nav bernameyên perwerdehiyê û komeleyên têkildarî perwerdeyê de.

5- Amadekirina dersxaneyan bi alavên pêwîst ên ku dê alîkariya mamoste bikin, da ku agahiyan bi baştirîn şêweyê gengaz dûrî vekîtinê pêşkêş bike.


6- Mamosta û berpirsên pirosesa xwendinê han bidin ser beşdarbûna korsên rahênanê ji bo bidestxistina şarezayên pêwîst, û pêwîstiya sînordarkirina karê mamostatiyê bi wan kesên ku bi awayekî zanistî şareza ne.

7- Dabînkirina gengaziyan di tevaya dibistanan de bo fêrbûna zimanên li Sûriyê tên axaftin, wek: Kurdî, Suryanî û yên din.

8- Lidarxistina workşopên ku kesên pêwendîdar bi sektora perwerdehiya Sûriyê armanc dikin, ji bo ronîkirina karzanî an ezmûnên welatan di perwerdeyê de piştî pevçûnên demdirêj.

**Di Warê Siyasî de:**

9- pêwendiyên li gel desteyên navdewletî yên girêdayî bi danûstandina li gel desthilatdarên defakto re, ji bo çareserkirina pirsgirêka danpêdana herdû bawernameyên navencî û duwenavencî yên ku weke şêweyeke fişarê bikar tê, û xwendekar û malbat û saziya perwerdehiyê dibin Qurbana wê bikaranîna xerab.



Rêveberiya Sivil a Demokratîk ya Reqayê
Meclisa Reqa ya Sivil
Komîteya perwerde u Fêrkirinê
hêjmar:
Dirok: / / 2023

الإدارة المدنية الديمقراطية في الرقة
مجلس الرقة المدني
لجنة التربية والتعليم
الرقم:
التاريخ: / / ٢٠٢٣

مجلس الرقة المدني لجنة التربية
الصادر رقم ٤
تاريخ ٢٠٢٣/٧/٣

قرار رقم /106/
الرئاسة المشتركة للجنة التربية والتعليم في الرقة
ووفق مقتضيات المصلحة العامة وحسن سير العمل التربوي
وبناءً على توجيهات هيئة التربية والتعليم لشمال وشرق سوريا
وموافقة مجلس الرقة المدني رقم/3285/ تاريخ2023/6/24
تقرر ما يلي:

مادة(1):
يتم إغلاق مكتب التعليم الخاص لدى لجنة التربية والتعليم بالرقة حيث أن وجوده يتنافى مع مبدأ مجانية التعليم لكل المراحل في شمال وشرق سوريا
مادة (2):
تعتبر جميع الرخص الممنوحة لمراكز دورات التقوية والمعاهد الخاصة ملغاة من تاريخه
مادة(3):
ترجع تبعية المعاهد العامة في الريف والمدينة إلى المكاتب الفرعية
مادة(4):
يعتبر هذا القرار نافذاً من تاريخه
مادة (5):
يبلغ هذا القرار لمن يلزم تنفيذه أصولاً

شاكرين تعاونكم

الرئاسة المشتركة في لجنة التربية والتعليم
زليخة عبدي
خلف المطر

الديوان العام في لجنة التربية والتعليم

(Ev wêneyê li jor biryareke girêdayî girtina ofîsên hînkirina taybet e û ji hêla serokatiya hevbeş ya komîteya perwerde û hînkirinê li Reqayê derketiye.

**Kaxeza Sêyemîn: Rêbazên Perwerdeyê**

## Li Parêzgeha Idlibê

### Rêxweşkirin

Parêzgeha Idlibê li bakurê rojavayê Sûriyê ye, û ew yek ji yekemîn parêzgehên ku ji bin kontrola rijêma Sûriyê derketibû, piştî destpêkirina şoreşa Sûriyê, û di sala 2012an de komên leşkerî yên rikberî rijêmê bajar û beşên mezin ji parêzgehê kontirol kirin, li wir encûmenên xwecihî û desteyên rêxistinî ava kirin, bi armanca birêvebirina karûbarên sivîlan û pêşkêşkirina xizmetguzariyên bingehîn ji niştecîyan re, curbecuriya beşên çekdar û cihêbûna wan ya îdyolojîk û nijadî û armancên taybet li ba hin beşên leşkerî rewşeke ji hevrikiyê û desthilandiyê di nav wan de afirand, û hema çend heyv derbas nabibûn heyanî ku nakokî û pevçûnên navxweyî di navbera komên çekdar de dest pê kir, û wê yekê hawîrdorek guncav ji derketina şepêlên tundrew mîna Dewleta Îslamî (DAIŞ) çêkir, yê ku karakterek nû li nakokiyan zêde kir.

Li kêleka van nakokiyan hevsengiya hêz û kontrolê li Idlibê her tim dihate guherandin, nemaze bi berfirehbûna Cebhet Elnusra û tevlîbûna komên çekdar, û di 28ê Çileya 2017an de avakirina Heyet Tehrîr Elşam hat ragihandin, da ku dest bi armanckirina komên çekdar yên din li deverê bike, bi armanca kontrolkirina parêzgeha Idlibê ji hêla leşkerî û rêveberî ve, û ev yek piştî ku komên leşkerî di destpêka sala 2019an de bi temamî dane aliyekî  pêk hat, û bandoreke gelek neyînî ya Heyet Tehrîr Elşam li Ser Idlibê hebû, ji ber ku ew girûpeke selefî-cîhadî ye, ku di nav lîsteyên terorîstên Amerîka û rojava de cih digire, û vê yekê bihane da rijêma Sûrî û Rusya ku bombebaran û êrîşên xwe li ser Idlibê bi behaneya şerê li dijî terorê tundtir bikin, û ev yek bû sedema wêrankirina rêbazkirî ya jêrxaneya bajêr, û rewş dijwartir bû ji ber mezinbûna qebareya mirovî ya ku bajêr ji encama koçberkirina kotekî xelk vehewandine, koçberkirina ku rijêma Esed dermafê sivîlan li deverên derveyî kontirola wê pêk

aniye, ev jî bû eger ku hejmara niştecihên parêzgehê du qat bibe, û ji 1,25 mîlyon mirov di 2004an de, bi kêmanî bighîne 3,5 mîlyon mirovî di 2021an de, û li gorî texmînan zêdetirî nîvê wan di kampan de dijîn, û ji xizmetguzariyên bingehîn û amûrên jiyanek rûmetdar bêpar in.

**Salixdana Ketwarê Perwerdeyê di Bajarê Idlibê de**

Li deverên bakur-rojavayê welêt, zêdeyî 315 hezar zarokên dest ji xwendinê berdane hene, %85 ji wan di pîşeyên metirsîdar de dixebitin, bi navîniya ku ji her 5 zarokan 2 kes di qada kar de ne, bi beranberkirina hevpeyivînên ku me bi hin raporên navneteweyî re kirine, hejmara xwendekarên ku dikarin xwe bigihînin dibistanan, an yek ji formên wê 345 hezar xwendekarên keç û kur tê texmîn kirin, di heman demê de nêzî 260 hezar xwendekar derfeta gihandina dibistanan an saziyên perwerdeyê nedîtine, nemaze ku dibistan û nexweşxane bi taybetî ji armancên herî diyar ên êrîşên asmanî ên rêbazkirî ji hêla balefirên cengê yên rijêma Esed û hevalbenda wê ya Rusya bûn, di operasiyonên wan yên tolhildanê de li dijî deverên rikberiyê, li gor rapora rêxistina (Save the Children) her rojê 2 dibistan li Idlibê bi temamî wêran dibin, yan jî ji ber şer û pevçûnan tên valakirin, û di sala 2020an de li bakurê rojavayê Sûriyê tenê di nava 90 rojan de 217 dibistanan ziyan dîtin, ango nîvê dibistanên Idlibê ye, 570 dibistan ji hezar û 62 dibistanên fermî yên tomarkirî û 136 dibistanên ne fermî hatine wêrankirin, û dibistanên hene jî li deverên gelekî li ser zarokan metirsîdar in, û rapor berdewam dike: Ji bo bicihkirina hejmara mezin ya xwendekaran li parêzgeha Idlibê, divê her poleke xwendinê 240 xwendekarên keç û kur bihewîne.

Ji destpêka sala 2023an ve, li ser binyada hevpeyvîn û raporên çapemeniyê, rewş li bakurê rojavayê Sûriyê bi taybetî li Idlibê xirabtir bû, ji ber bobelata erdheja 6ê Sibata 2023an, ya ku di encamê de 11 dibistan wêran bûn, û nêzîkî 395 dibistan ji kar hatin derxistin, û bûn wek navendên vehewandina kesên ziyan ji ber erdhejê dîtine, tabî hejmarek ji van dibistanan li Idlibê bûn.

Di çarçoveyeke pêve girêdayî de, hin kes rewşa zarokên ku dev ji xwendinê berdidin bi hejarî û şert û mercên jiyanê yên dijwar ên ku xelkê Bakurê Sûriyê rastiyê tên ve girê didin, li gel nebûna kesê ku debara malê birêve dibe, an jî nekarîna wî ku dabîn bike, nexasim ku Idlib deriyê bakurê Sûriyê ye, ya ku piraniya Sûriyên ku bi kotekî koçber bûne, û li kampên li ser sînorê Sûriyê-Tirkiyê belav bûne xwe lê girtibûn, li vir em dikarin xwendekaran bikin du beş: Beşê yekemîn: Xwendekarên ku dikarin xwe bigihînin dibistanan. Beşê duyemîn: Xwendekarên li kampên ku li derdora bajarê Idlibê belav bûne, dijîn.

Bi lêkolînkirina ketwarê perwerdehiya bo xwendekarên li kampan hatine belavkirin, divê cûdahî di navbera kampên birêkûpêk û yên bêsrûber hebe,

Kampên organîzekirî bi hejmarê yên herî mezin in, û zêdetir ji 150 zarokên di temenê dibistanê de hene, bi gelemperî dibistanên hukûmetê yên nêzî wan hene, an çadir, dibistan, an polên gerok hene, yên ku ji hêla komele û rêxistinên navdewletî û xwecihî  yên têkildar bi perwerdehiyê ve têne çavdêrî kirin, û wan li gorî rêbaza perwerdehiyê ya ku ji hêla Hikûmeta Înqaz - ya ser bi Heyet Tehrîr Elşam - ve hatî pejirandin hîn dikin, û pirosesa perwerdehiyê ji aliyê mamosteyên jêhatî ve, berdêla mûçeyên maqûl ên ji ber fînansekirina derve tê birêvebirin.

Li aliyê din, li ba me kampên bêserûber hene, yên ku li ser zeviyên çandiniyê hatine avakirin, û di hevpeyvînan de tê gotin ku "bi awayekî bêserûber hatine belavkirin, pênc kon li vir, û piştî dûrahiya nîv kîlomitrê tê çar konan bibînî, û li başûrê wan şeş an heft kon li cihekî kom bûne, ew wekî yek kampekê nayên jimartin ji ber dûrahiya di nav konan de", Kampên nefermî dûrbûna xwe ji blokên bajarî û xizmetguzariyên lojîstîkî yên bajêr parve dikin, û ev yeka dihêle ku gihiştina xwendekaran bo dibistanan dijwar be, nemaze di qonaxa seretayî de, û hejmara kêm a xwendekaran jî ji bo projeyên rêxistinên çalak di warê perwerdeyê de ne rakêşkirî be, "Li kampên dûr rewş pir xerab e, dibe ku hejmara xwendekar kêm be, dibistan li nêzîkê tune be – kamp li derveyî bajêr hatine avakirin - û rêxistinên bi perwerdeyê re têkildar hewl nadin ku koneke fêrkirinê vekin, ji ber ku serjimêrî têrê nake, lewra jinên ku beriya şoreşê li mizgeftan Quran bi şagirtina ezber dikirin, keçan di çadirekê de dicivînin û temenê wan çi be se, rêbaza Elreşîdî fêrî wan dikin” Rêbaza perwerdehiya Elreşîdî ya ku li bakurê Sûriyê belav dibe, ji bo perwerdekirina keçên ku dev ji xwendinê berdane ye, li ser hînkirina zimanê Erebî, bi armanca xwendina Qur'ana Pîroz hatiye damezrandin, ev amadekirina îdeolojîk keç rastiyê tên, nemaze li derveyî çarçoveya saziyên perwerdehiya fermî, an jî rêbazên ku li Idlibê têne şopandin, bandorê li ser dariştina qalibên keçan dike, weke ku me di çarçoveya dîtaneyî de jî behs kirî, ew bi armanca wêneyeke normal li ser "yên din" tên avakirin, ê din yê ku li dijî wî cudakarî tê kirin, û beşê keçikan bi taybet bi îddolojîkê tên tijîkirin.

Vêga li Idlibê, dibistan ji aliyê Wezareta Perwerdehiyê ya Hikûmeta Înqazê ve, ya girêdayî desthilata defakto "Heyat Tehrîr Elşam" li bajêr tête birêvebirin, her weha hewildanên sivîl ên tîmên sivîl û destpêşxeriyên xelkê û rêxistinên xwecihî an navneteweyî, yên ku piraniya wan rêbaza dibistanî ya pejirandî ji hêla Hikûmeta Înqazê ve bikar tînin, yê ku em ê di pê re li ser bisekinin, Karên hînkirinê di destpêşxeriyên xelkê sivîl de, û li hin dibistanan ji aliyê mamosteyên dilxwaz ên ji xort / jin têne kirin, û li gorî amarên parêzgeha Idlibê, 17 hezar û 290 mamosteyên jin û mêr hene, ji wan tenê 12 hezar û 438 mûçeyan werdigrin, û zêdetirî 5 hezar ji wan bi awayekî xwebexş kar dikin, û ya ku di hevpeyvînên kûr de hatiye piştrastkirin ev e ku "rêjeyek mezin ji mamosteyan  xwedan çavkaniyên din ên debarê nînin, û ji ber ku mamoste li dibistanê mûçeyek baş

wernagirin, ew neçar dibin ku tev li rêxistinan an jî karekî din bikin da ku berdêleke darayî werbigrin" ev jî dibe sedema kêmbûna hejmara mamosteyên pêwîst ji bo ku pirosesa perwerdehiyê bimeşe.

Di nav van dibistanan de, rêbaza xwendinê di binyada wê a yekemîn de ji rêbaza xwendinê ya sala 2015an ya girêdayî hikûmeta rijêma Esed hatiye birin, ya ku ji aliyê Hikûmeta Demkî ve hatibû guhertin û ji aliyê hikûmeta Înqazê ve hatibû pesendkirin, û ji nû ve hatibû veguhestin da ku guncavî çanda desthilatdariya defakto be, an bi lêzêdekirin an bi guherandin an bi jêbirinê, Li gor rêzika (neguhêr û guherbar) mijara perwerdehiya niştimanî ji holê hat rakirin, berdêla berfirehkirina katijmêrên waneya perwerdehiya îslamî, û dayîna bergeyê ji bo hînkirina hin aliyên derveyî rêbazên pejirandî, wekî celebek bikaranîna olî weke amûrek ji bo dayîna rewabûn û komkirinê, ya ku di dawiyê de diherike nav kêşeya cihêkariya olî (wek ku me di çarçoveya dîtaneyî de behs kirî), û Zimanê Tirkî jî lê hat zêdekirin, û guhertin di mijarên felsefeyê de, yên ku ji rîçalan de hatine guhertin, da ku li ser mijarên siyasî an şoreşgerî dizîvire xuya dike, li gorî "Çîrok, Vegotina" şoreşê a ku pê tête lîstin bikar hat, da ku li gorî projeya îdyolojîk ya beşê leşkerî ê serdest be, bi awayekî ku dibe sedema cudakariya olî û nijadî, ya ku hewceyî lêkolînek berfireh û beranberkirinê ye, dibe ku gotarek lêkolînî serbixwe be di paşerojê de.

**Nîşaneyên Tundiyê di Sîstema Perwerdeyê de li Idlibê**

Di dibistanên Idlibê de îro xwendekarê herî mezin, temenê wî/wê ne di ser 17 saliyê re ye, û ew pênc salî bû dema ku şoreşa Sûriyê dest pê kir, û piştre şerekî tund li dijî niştecihên Idlibê bi taybetî - ew bi firokeyan û bi çekên li ser asta navdewletî qedexekirî hatin armanckirin, piraniya wan rastî koçberî û derbiderîyê hatin, û niha di nav xeleka şer û pevçûnên alîyên çekdar de ya ku heta roja îro bi dawî nabûye dijîn, ji ber vê yekê, hestiyariyeke wan a cuda di nav xwendekaran de di nirxandina tundûtûjiyê û astên wê de heye, û ev yek pêwîstî bi lêkolîneke derûnî heye, û ku rewşa wan ya derûnî bi ya xwendekarên Sûrî yên li deverên din ên ku kêmtir bûne armanca tundiyê beranber bibe.

Di çarçoveya tundûtûjiyê de nerîna xwendekaran derbarê sizakirina komî yek bû, lewra yek ji wan dibêje: "Me siza dikin, lê sizaya me komî ye û tevî ku her kes di vî gunehî de ne beşdar an sûcdar e", ev yek hestê stemiyê li bal wa koma siza dîtiye diçespîne, û derfetê dide sûcdar ku bireve, û berpisyariya tekekesî di ber şaştyê de hest nake, û ev yek dibe ku bandoreke neyînî li peywendiya mamoste û xwendekaran bike, û di gotûbêjê de hate encamdan ku pejirandina şêwazên perwerdehiyê yên ku li ser bingeha handanê ji bo xurtkirina rêkûpêkiyê û beşdarbûna kartêker dê bibe çareyek ji van cezayan re, tevî ku cezayê tekane

dibe sedema hesta şermiyê û nerehetiyê, û bi vî awayî xwebawerî û daxwaza beşdarbûna takekesî kêm dibe, û sizaya komî ji bilî neheqiya wê ya li ser piraniyê ew bi xwe mîraseke perwerdehiya Sûrî ye, û xwedî bandor e li avakirina nasnameya komî ya armanckirî, ya ku perwerdeya leşkerî ya desthilata Esed ew damezrandiye, da ku mirovatiya komî di civakê de birûxîne, û şaştiyên tekekesî bavêje stûyê komê bi tevahî ji ber ku yek bilok e.


Bi dehsalan sizakirina laşî weke şêweyeke sizadanê bêhtir katrêkrt beranberî sizayên din dihate dîtin, tevî ku lêkolîn destnîşan dikin ku ew di demek dirêj de ji qenciyê bêhtir zirarê dike, û sizayê laşî li welatên ku peymanên têkildarî maf û xêr û xoşya zarokan û Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (Netewên Yekbûyî, 1989) erê kirine hatiye qedexekirin, Ji ber vê yekê, divê rêyin baştir bên bikaranîn, da ku xwendekaran han bidin, bêyî ku cezayên laşî, devkî an derûnî li wan bê kirin.

Di çarçoveyeke din a têkildarî tundiyê de, gotina yek ji xwendekaran balkêş bû “Gefên gazîkirina dêûbavan li cem min ji derkirin û lêdanê dijwartir e.” ev mijar ne çaverêkirî bû, û egera rûbirûbûna tundiya malbatî li ser wî diyar dike, û dibe ku piştî giliyê ji hêla dezgeha perwerdehiyê de duqatî bibe, û ev yeka jî xwendekar bal kişandiye ser dema dibêje: “Mamoste tenê li min dixe û mesele diqede , lê eger mesele bigihê malbata min, ez ê bi wan re bikevim nav pirs û bersiva”, ev yek ronahiyê dide tundiya derûnî ya kombûyî û ya tevlihev a ku zarok li derveyî çarçoveya perwerdehiyê rastiyê tên, di çarçoveya yasayî de, Yasaya sizayan ya 1949an, li gorî xala 185/2, bi eşkereyî destnîşan dike ku dêûbav û mamoste bi awayên ku di bin kategoriya "adeta giştî" de hatiye binavkirin ku "perwerdekirina" zarokan bi lêdanê bikin, û ev di yasaya rewşa kesane ya ku di sala 1953an de derketiye, li gorî xala 170/3 diyar bûye, ya ku destûrê dide xwediyên zarokan ku desthilata xwe ya perwerdehiya lêdanî li ser zarokan bi kar bînin, di bin destnîşana ku ew perwerdehiyeke fêrkirinê ye.

Ev xalên han bi awayekî eşkere nîşan didin ku tundiya di qada taybet de tê kirin rewa ye, ev yek ji baviksalariya çavkaniya yasayan nayê veqetandin, baviksalarî (patriarchy) bi pênaseyê; Ew sîstemeke ku tundiya jortajêr li dijî beşên li aliyekî an yên kêm hêzdar rewa dike, û di nav van beşan de jin û zarok (nêr û mê) hene.


Xwediyên zarokan derbarê sizayên bo xwendekaran arastekirî di navbera lêdana dibistanê û sizayên rêvebirî de li hev nekirin,(form 1) ji ber ku 65% ji wan bi tundûtûjiyê di sepandina cezayan de li ser xwendekaran razî nebûne, ji ber ku ew bandorek xirab li ser pêşkeftina wan a akademîk çêdike, lê 35% piştgirî dane bikaranîna wa şêweyê perwerdehî yê ku li ser lêdanê ava dibe, û ew rêjeyek ne hindik e, Ji aliyê din ve, li hember wê yekê rêjeya kesên ku diyaloga avakar û gazîkirina dêûbavan bikêrtir dîtine, ji %59ê nimûneyê derbas bûye.

Û nimûneya lêkolînkirî ji sedî 50% dîtin ku sizayên komî û tundûtûjî rê li ber reftarên xwendekaran nagirin, û ji ber vê yekê tundûtûjiya wan a li malê dikare wan bizeprîne, her wiha, 46% dîtin ku sizayên rêvebirî (wekî ji polê avêtin) têrê nake.




(Di va wêneyî de rêjeya bersivên sê pirsan diyar dibe; û nerîna dêûbavan derbarê sizayên ku xwendekarên keç û kur di hundir sîstema perwerdehiyê de li Idlibê rastiyê tên xuya dike, tabî ev agahî di xêzên berî wêne de hatine nivîsîn).

Li gorî vê yekê, em digihêjin encamê ku rewşa pejrandina tundiyê a (komî an govdeyî an derûnî) û dîtina wê weke pêwîstiyekê ye ji perwerdeya sincî re, li gorî çarçoveya xwe ya dîtaneyî, em bandora tundiyê li ser tunekirina kesayetiya zarokan û biçûkxistina wan dibînin, ya ku hewce dike ku ji nû ve li ser sizayên rêvebirî û arastekirî yên dibistanê bi taybetî mîkanîzmeya rûbirûbûna pirsgirêkên xwendekaran û beşdarbûna dêûbavan di çareseriyan pirsgirêkan de yên ku mîna tiştên duwem nayên dîtin li ber çavan bên girtin, lêbelê pêwîstiyeke wê heye bo sînordarkirina vê tundiyê û bidawîanîna diyardeyên wê, ji ber ku ev zincîra tundûtûjiyê dê bi awayê zordestî û çewsandina devkî û laşî li ser xwendekaran derbikeve.





(Wêne behsa pirsgirêka ku bi xwendekarên keç û kur re li dibistanê çêdibin û ka çareyê çawa be? Sizayên rêvebiriyê, diyalog û hatina dêûbavan, diyaloga avakar û anîna dê an bav bo dibistanê ji aliyê xwendekaran ve).

Bêserûberî û tundûtûjî zêdetir tundiyê çêdike (li çarçoveya dîtaneyî binêre), û ev yek ji hêla 13% ji dêûbavan ve hate piştrastkirin, ku zarokên wan ji hêla karmendên dibistanê ve hatin tacîzkirin, û ev bûyera yek ji wan faktorên herî metirsîdar e ku dibe sedema dilzariyê, û 72% ji nimûneyê diyar kirin ku zarokên wan di encama rewşa akademîk de dilzar bûne û ji 24% jî diyar kirin ku heya radeyekê rastî wê yekê hatine! Lê hîn jî rêjeya 56% ji nimûneya dêûbavan dibînin ku jîngeha dibistanî hîn çîçkê ewle ye, lê 74% ji wan bihîstiye ku herî kêm xwendekarekî ji ber fişarên perwerdehiyê xwe kuştiye.



(Di vir de rêjeya bersivê hatiye nivîsîn, pirs jî ev e: Gelo ma law an keça te ji aliyê mamosetyên jin an mêr ve li dibistanê rastî dijminkariyê hatine?

Rêjeya 80% ê ji nimûneyê di pirosesa perwerdehiyê de mijarên ku çanda tundiyê perwerde dikin û xurt dikin nedîtin, ku ev yek ji “xwezaya civakê ya ku li ser şêwazên tundûtûjiyê mezin bûye ye, jê re nas bûye û êdî biyanî nebûye“ ew ji ber vê yekê "tu êdî wê nabînî", ya ku vê encamê xurt dike ku 97% ji dêûbavan bixwe beşdarî ti diyalogên aştiyane nebûn, ku dev ji tundûtûjiyê û belavbûna çekan berdidin, û tiştê ku nêrîna me ya li ser adetbûna tundûtûjiyê xurt dike ew e ku 92% ji dê û bavan ti gotinên nefret û tundûtûjî li ser zarokên xwe nedîtin.




(Di va wêneyî de bersivên pirsê diyar dikin, pirs jî ev e: Gelo ma xwendekarên keç an kur ji ber encama rewşa xwendinê ya giştî rastî dilzariyê tên?).

Ev yek dihêle ku em çirkekê li ser têgeha tundûtûjiya û ewlehiya rêjeyî di nav xelkê Idlibê de rawestin, ku dikare bi vê rastiyê were ravekirin ku xelk hest dikin ku ew ji saw û tundûtûjiyek mezintir rizgar bûne, ya ku bi tundiya perwerdehiyê re nayê berhev kirin, dibe ku hinek ji wan bibînin ku dilzarî li bal zarokan bi rewşa jiyanê ya xerab û neewlehiya aborî an jî derûnî normal bûye, di vê çarçoveyê de, ne pêkan e ku mirov bobelata mirovî ya ku niştecihên bakurê Sûriyê tê de dijîn bi taybetî li Idlibê ya ku îro di bin kontrola komên cîhadî yên ku xwe dispêrin tundiyê ji bo berfirehkirina kontrola xwe, paşguh bibe.

**Dezgeha Şerîetê di Perwerdeya Hikûmeta Înqazê û Pirosesa Perwerdeyê de**

Ji ber ku Hikûmeta Înqaz (Rizgarî) şêwaza rêvebirina Heyet Tehrîr Elşam e, ya ku berê xwe selefî ye, û di lîsteyên terorîstan de cih girtiye, pêwîst bû asta destwerdana wê di proseya xwendinê de û gihandina rêbazan de bo xwendekaran were verastkirin, di rûniştinên xwe de, me li mînakên ku rê li ber pêşketina pêvajoya perwerdeyê û kalîteya rêbazên pêşkêşkirî digire berçav kirin, û li ser "Dezgeha Şerîetê di Perwerdeyê de", ku li gorî hevpeyivînan, desthilatdariyek e ku ji hêla saziyeke ji wezareta perwerdeyê ve hatî spartin, berpirsê şopandina pêşkeftina hînkirinê bi desthilatên berfireh lihevhatinek çêbû, ew çavdêriya Şerîetê ya "rêveberî" dike, bêyî ku şagirtên wê xwediyê şarezayên akademîk an xwedî bawernameyên zanîngehê bin, ji bo çavdêriya meydanî, Hikûmeta Înqazê (Rizgariyê) ew xistin waneyên destpêkê yên furqha Îslamî û Şerîetê, da ku dest bi karê welîtiyê bikin, û pirsgirêk di wê yekê de ye ku ew rêbaza "ewlekarî" ya Heyet Tehrîr Elşam dişopînin, û hişkbûna ku tirsê di nav kadroyên mamosteyan de çêdike, ji ber ku mamosteyên jin û mêr hest bi nebûna ewlehiya kar dikin, û mamosteyekî perwerdeyê asta pirsgirêkên ji ber xerabiya pêwendiyan li gel yek ji endamên Dezgeha Şerîetê re piştrast kir û got: "Eger karmendek ji Dezgeha Şerîetê were cem min û me li ser tiştekî li hev nekir, dibe ku pirsgirêkeke rasteqîn ji min re çêbike."

Li vir, em dikarin di warê nêzîktiyê de desteya Şerîetê mîna şaxên partiya Beis di dibistanên Sûrî de bibînin, yên ku ta roja îro jî hene tevî rolên wan ên karkirinê yên ji hev cuda, ên ku tê de hemû hevalên partî xwediyê heman îdyolojîka ewlekarî ya piştgirê desthilatê ne, heman rêbazên gefan, kontrolkirin û desteserkirin, yên ku ji aliyê dezgeha Şerîetê ve, bi meyla Îslamî tundrew û dikare bê gotin; ku hebûna vê komê û kontrolkirina wê ya ji nêz ve li ser pirosesa perwerdeyê di hemû xalên wê de yek ji amûrên îdeolojîk e, ya ku ji aliyê desthilatdariya stemkar ve bi şêwazên xwe yên curbecur tê pejirandin.

**Şirovekirina Rêbazên Perwerdeyê li Idlibê:**

Em ê rêbaza ku ji aliyê Wezareta Perwerdehiyê ve di Hikumeta Înqazê (Rizgariyê) de li parêzgeha Idlibê hatiye pejirandin lêkolîn bikin, li vir em amaje dikin ku guhertinên di vê rêbazê de ji aliyê Hikûmeta Demkî ve hatine kirin, ya ku rola sereke di guhertin, jêbirin û zêdekirinê de lîstiye, û paşê, Hikûmeta Înqzê(Rizgariyê) kar li ser çêkirina guhertinên biçûk kir, ku li gel avakirina Dezgeha Şerîetê be, wekî amûrek îdeolojîk a berbiçav û nexwendî, Ji ber vê sedemê, em ê derbasî şirovekirina rêbazan û riftarên Dezgeha Şerîetê di hin cihan de bibin, di riya hin beşan ji gengeşeyên kûr re, yên ku me di çarçoveya vê vekolînê de qalê kiriye, di warê derûniya îdyolojîk ya bi dizî de, a diyar di rêbaza perwerdeyê û şêwazên wê li Idlibê de, di vê gengeşiyê de em li ser rêbazên pola nehan a waneyên dîrok û perwerdehiya îslamî rawestiyan, Hêjayî gotinê ye ku

pirtûka perwerdehiya îslamî ji pirtûka berdest gelek berfirehtir e, û beşekî mezin ji xwendekaran xwe dispêrin ser tiştê ku mamoste  li şûna pirtûkan pêşkêşî dike, ji ber ku tiştê ku tê dayîn ji naveroka pirtûkê bi xwe berfirehtir e.


**Cudakariya li Ser Bingeha Nijad û Ol û Gender**

Îro, parêzgeha Idlib bilindbûna hikûmeteke girêdayî îdyolojiya olî (Hayat Tahrîr Eişam) dibîne, piştî pênc dehsalan ji serdestiya Partiya Beis, piştî teqlekirina Hafiz Esed ya ku bi"tevgera rastkirin" hatiy binavkirin, Ji vir de em dikarin tiştên wek hev di navbera hikumdariya herdû deman de bibînin, ya ku bêbandorkirin û paşguhkirina yê din û bilindkirina "ego/Ezî"yê tê naskirin, di riya çend nêzîkatiyên ku bi vî rengî têne dabeşkirin:

**Cudakariya li ser Bingeha Gender**

Di pirtûkên hatine lêkolînkirin de diyardeya "korbûna Gender" tê destnîşankirin, ya ku di nav şêwaza nivîsandin, axaftin û vegotinê de ye, ev yek dighîne rêbaza bingehîn a rijêma Sûriyê, ya ku tê de axaftin bi zimanê mêraniyê tê meşandin, û mê di vegotinê de tune ye, tiştê ku zimanê erebî li gorî diyardeya serdestiyê ku ji aliyê zanayên wê yên kevnar ve, di bin navê “rêwanbêjiyê” de hatiye afrandin, ji bo ku jinê ji qada kiryar û derbirînê dûr bixe, tevî ku zanyarên îro li ser nermbûna zimên diaxivin, û şiyana zayenda zimanî ya "Gender" ku di rêzimaniya wî de rolek bingehîn bilîze, dîtin ku nebûna cudahiya di navbera nêr û mê de yek ji pîstirîn şaştiyên bikaranîna zimên in, hêjayî gotinê ye ku bal tê kişandin ser çîrokên mêran ên bi nav û hûrgilî, wek ku di rêbaza bingehîn a hikûmeta rijêma Sûriyê de hatiye.

Her wiha di pirtûkên zimanê erebî û perwerdehiya îslamî de behsa helbestvanên jin an jî peyrewên jin ên ereb nehatibû kirin, û hat destnîşankirin ku "jêbirin û hilanînê tenê jin armanc kirin" Tenê behsa jinan di pirtûka dîrokê tenê de tê, ew jî behsa Xewla Cezayîrî "Lala Fatima Nisoumer" bû, ji bo nêzîkbûna beşdarbûna jinan di şoreşa Cezayîrê de li dijî dagirkeriya Fransa bi jinên Sûriyê re, û bi vî awayî nêzîkbûna şoreşa Sûriyê bi şoreşa Cezayîrê re.



قراءةٌ تاريخيّة:

**لالا فاطمة نسومر** (١٨٣٠-١٨٦٣م) مجاهدة جزائريّة، لقبُها "**خولة الجزائر**"، اسمُها الحقيقي فاطمة سيّد أحمد، لُقّبت بـــ" نسومر" نسبة إلى قرية نسومر التي كانت تقيم فيها، لقّبها الاستعمارُ الفرنسيّ بـــ "جان دارك جرجرة" لكنّها رفضت اللّقب مفضّلة لقب "خولة جرجرة" نسبةً إلى "خولة بنت خويلد" الشجاعة والمدافعة عن دينها، أمّا كلمة "جرجرة" فهي جبال وعرة تتواجد في منطقة القبائل بالجزائر، وقد هَزمت جيش العدوّ في معركة ١٨ كانون الثاني ١٨٥٤م، وأرغمت الجنود الفرنسيّين على الانسحاب من أراضيها بعد أن خلّفوا وراءهم أكثر من ٨٠٠ قتيل، منهم ٢٥ ضابطاً و ٣٧١ جريحاً، وفي عام ١٨٥٧م حاصر الجنود بيتها ووضعت في "معسكر اعتقال" في وسط الجزائر تحت حراسة مشدّدة، فماتت حسرةً وحزناً على وطنها ودينها عام ١٨٦٣م، وهي لم تتجاوز الـــ ٣٣ عاماً من عمرها لتتناقل الأجيال بطولتها، ويتغنّى الشعراء بشجاعتها.

(Xwendineke dîrokî: li ser kesayetiya Lala Fatime Nisomer têkoşera Cezairî ye, ya ku di 1830 de hatiye ser rûyê erdê û di 1863an de ji gerdûnê koç kiriye, û xebateke ne hêsan li dijî dagîrkerê Firanayê kiriye).

Ev pergalê perwerdehiyê ya cihêxwaz bi gotara baviksalarî ya rêbazên xwendinê yên rijêma Esed re hevaheng e, ya ku ji wan rêbazan hatine wergirtin, û tê de behsa jinan ji bilî çar cihan nehatibû kirin, lê bi danberheva rêbazê Sûriyê di sala 2015an de û rêbaza xwendinê ya Idlibê ya îro, em dibînin ku: Rijêma Esed bi mebest cihêrengiya Gender veşartî li hemberî zêdebûna pêwendiya takekesî, bêyî ku ew kî be (û ev e ya ku di gotara lêkolînê ya Siwêda de hatiye behs kirin). Lêbelê, rêbaza perwerdehiyê li Idlibê bi mebest dûrxistina eşkere ya jinan armanc dike, bi şopandina siyaseta "mêrbûn û jintiyê" di veqetandina mêr û jinan de li dibistanan, ji roja yekem a dibistana seretayî de dest pê dike, di hevdîtinên berfireh de ev tişt hatin gotin: "Eger 15 xwendekarên me yên jin hebin, rêveberî poleke din ji wan re venake, ger mêr bin dê yekser polekê ji wan re veke" bi rastî piştî cîbicîkirina siyaseta cudakirinê, ji ber sedemên rêvebirî yên cudakar, keçan dev ji xwendina xwe berdabûn, û di dibistanekê de hejmara şagirtên pola pêncan têra vekirina polê nedikir, ji ber ku kêmasî hebû ji bo vekirina pola nû ya dibe ku ji 15 xwendekaran be, lewra hin keç neçar man ku li mal bimînin, li benda temamkirina hejmarên wan in!! di rewşên din de wan tevlî polên din dikin, wek tevlêkirina pola heyştan bi xwendekarên keç yên pola nehan re.

Ev veqetandina tam di dibistanên giştî de bêyî rêxistinan çêdibe, a hiştiye ku diyaloga me ya heyî ya li ser veqetandina di navbera jin û mêran de tenê li dibistanan de be, û di vê derbarê de bersivan li hev kirin ku ev yek dibe ji bo ku piştgirê darayî razî bibe.

Kesî ji xwendekaran ev cihêkarî ferq nekir, ji ber ku di dema gengeşiyê de bi yekdengî li hev kirin ku di sektora taybet an gelemperî de li ser bingeha Gender cudakarî temaşe nekirin, lê gelo ma ew bi rastî dikarin wê yekê destnîşan bikin? Bêguman ku nebûna aliyê din şiyana cudabûnê pûç dike, li gorî hevpeyivînên me yên kûr bi yek ji mamosteyan re, wî dît ku cihêkarî bi awayê pêşkêşkirina rêbazên perwerdehiyê xuya dike, ji ber ku mînakên ku bikar anîne di ravekirina waneya li cem nêran de ji yên ku li cem jinan bikar anîne cuda bûn, û di çîrokên serkeftinê de bi gelemperî çîrokên mêran bi rêjeyeke ji ê jinan pirtir bûn, li gorî bendên civakî, û egera ku xwendekarên jin wan qebûl nekin, ji ber bîrûbaweriyên mîrasî yên xwendekarên jin ya ku di serê wan de hatiye çespandin, yên ku bi xweber her nimûneyên li derveyî çarçoweya asayî red dikin, ya ku derveyî hawîrdora civakî ya kevneşopî be, ew jî bi nêzîkatiya me ya dîtaneyî re lihevhatî ye, ya ku jinan dike qalibek, û ew qalib tête xurtkirin û çespandin.

Tiştê balkêş derbarê gotûbêjên cudakirina Gender î di sîstema perwerdeyê de li Idlibê ev e ku xwendekarên keç û xort wê wekî mijarek pir xwezayî dibînin, û ew siyasetek guncav e ji bo piştgirîkirina baldariya wan li ser fêrbûnê, û girêdana tevlihevkirina di navbera wan di dibistanan de bi sinciyê re weku ew di warê civakî, çandî û mîras de ye, mirov dikare bêje; ceng, xizanî û medyaya civakî di çespandina vê têgehê de beşdar bûn, ya ku cihêkariya cudaxwaz a di navbera jin û mêran de bi pejirandina civakê ve girê dide, û yekî ji wan got: "Beriya cengê ez li dijî derxistina ji kar bûm, li ba me nifşekî hişmend û xwedî sinca bilind hebû, lê niha xizaniyê bandoreke mezin li ser rêbaza perwerdehiyê û şêwazê wê kiriye, mirovê nêr ne amade ye ku li gel jinan di polekê de be, li ba me kêmasî di sinciyê de heye, di dema ku xwendekarekî din hebûna xortan di polekê de li gel keçan weku azadiyê sînordar dike, dît, û got ku ev yek dihêle ku bala wan ne li ser xwendinê be, di vê temenî de ciwan sinîle ye, bi xandinê nahizre, her wiha azadiya xwe tête bendkirin, ev wekî berdewamiya mîrateya civakî ya dijberiya tevlihevkirinê tê jimartin, ya ku koçberkirina kotekî çesipandiye, û îro jî aliyekî tundrew sponseriya wê dike, û ji aliyekî ve kar li ser çandina wê di nifşê nû de dike, û çespandina bîrokeya ku jin li ser daxwazên regezî diaxivin, û ji aliyê din ve bibîne ku ew teşqeleyan gur dikin.

Cudakariya Gender î di çarçoveya sîstema perwerdeyê de li Idlibê tenê bi peyvên mêraniyê, dûrxistina xwendekarên keç, û paşguhkirina çîrokên serkeftinên jinan re nake, lêbelê ew dighêje cihêkirina kadroyên perwerdeyê, di navbera mamosteyên mêr/jin de, di rûniştinên diyalogê yên taybet bi mamosteyan hate gotin ku mamosteyên jin li gorî mamosteyên mêr di salên destpêkê yên qonaxên perwerdehiyê de xwedî şiyana hînkirin û danûstandina li gel zarokan zêdetir in, bi veqetînê re li Îdlibê sîstema perwerdehiyê ket delavekî teng, wek kêmasî di hejmara kadroyên waneyên zanistî de nemaze di dibistanên keçan de, Ji ber vê

yekê neçar dimînin ku mamosteyan ji dibistanên din werbigirin, û ev jî wan dixe nava gelek pirsgirêkan, adeteke perwerdehiyê ya nû ji bo dibistanan derket holê, "ku mamosteya jin divê berpisyara wê jin be" ev yek di nêrdîvana zincîra kar de dibe ku me bibe du wezaretan, ji ber redkirina ku rêvebir zilam bin û mamoste jin be, Ji ber vê yekê, mamosteyên jin di sîstema perwerdeyê de li Idlibê, mîna mêran piştgiriya hikûmetê û civakî bo wan nayê, û ev yek ji ber ku bi hişmendiya olî û îdeolojîk re danûstandinê dike, û ew li gorî nerînên hêzên defakto yên ku Idlibê kontrol dikin e, ku jin ne xwedî rol û bi hêz bin li gorî hişmendiya şerî.

**Cudakariya Li Ser Bingeha Ol û Nijadê**

Pêdiviya rêzgirtina ramanên "yên din" yek ji wan nirxên ku pirtûkê bi sernavê xwesteka xwe ya ji bo pêşvebirina waneya dîrokî yê lêkolînkirî bi nav kiriye, lê ew waneya bi awayekî berûvajî tê çareserkirin, ya ku ji vegotina desthilatên defakto dizê, a ji vegotina rijêma Esed ve nêzîk, û bi wê dûrxistina cihêrengiya olî û nijadî ya gelê Sûriyê ve tê girêdan, ev paşguhkirin û dûrxistin, li gor (Renan) “Amnezya” ye, yanê jibîrkirin û jinavbirina her pirrengîyê ye, ya ku bîranînên neteweyê diparêze, û li gorî îdeolojiya desthilata ferzkirî disepîne.

Di nav wan tiştên ku di pirtûka dîrokê ya guhertî de derbas bûne û li şûna wan hatine bicihkirin, navê têkoşer Şêx Salih Elelî, rêberê şoreşa peravê ya li dijî kolonyalîzma Fransî serî hildaye, şêxê ku bi endambûna xwe ya ji mezheba elewî tê naskirin, ev awayê jêbirin û avêtinê kevneşopiyeke nasnameyê ye di navbera kiryarên rijêma Sûriyê de nîşan dide, ya ku peyatî û girêdana bi mezhebê re çesipandiye, bi armanca sepandina kontrolê, û berê desthilatdariya defacto ku behsa her kesayetiyek sembolîk a kesayetiyek Sûrî ya girêdayî mezheba elewî bike, wekî erêkirina desthilatdariya rijêma Sûriyê, li vir divê bal bê kişandin ser ku rijêma Sûriyê stratejiyek ji bo jinavbirina têkoşîna mezhebên mayî yên Sûriyê pêk anî, bi hewldana xwe ya şêst salan ku têkoşînê bi yek mezhebekê ve girê bide (wek ku 5 caran di pirtûka dîrokê ya rijêma Sûrî de hatiye gotin), û parvekirina şoreşê bi şêx Omer Elbîtar re, û li vir em dikevin nav şaştiyeke dîrokî, ji ber ku Şêx Elbîtar bi rawestana li kêleka Îbrahîm Henano dihat naskirin.


ثانياً: الساحل والشمال السوريّ يواجهان القوّات الفرنسيّة:

بدأت الثورة السورية في الساحل إثر مهاجمة الثوار للفرنسيين في المنطقة الساحلية ، فكانت الثورة في الحفة بقيادة الشيخ عمر البيطار وفي الشيخ بدر بقيادة صالح العلي ، و تزامنت ثورة الساحل مع ثورة الشمال بقيادة الزعيم ابراهيم هنانو في جبل الزاوية ، وقد تعاونت ثورتا الساحل و الشمال و اتصلتا بالحكومة الوطنية بدمشق التي دعمت الثورتين بالمال و العتاد وقد تكبدت فرنسا خسائر فادحة وانتصر الثوار في معارك كثيرة كان أهمها معركة بابنا ومعركة وادي ورور في الساحل ومعارك ترعان و إدلب و جسر الشغور في الشمال السوري ، وذلك ما دفع فرنسا إلى أن تستقدم قوات كبيرة مجهزة بالعتاد والأسلحة وأحرقت القرى وأعدم الكثير من المجاهدين وسجن عدد كبير منهم حتى توقفت الثورتين.

(Di va wênenivîsa li jor de li ser perava Sûriyê û bakurê Sûriyê yên ku rûbirûyî hêzên Firansayê bûne, diaxive).

Û beşa girêdayî cenga Tîrmeha 2006an û Hizbullahê û vegerandina başûr di sala 2000an de jî hat jêbirin, ev tiştê ku em îro behsa wê yekê dikin diyar dike ku Sûrî ji duristiya Hizbullahê bi guman in, piştî beşdarbûna wê di kuştina gelê Sûriyê de, ya ku bû sedema ku wê ji binî de der bikin, û gengazî hebû ku balê bi awayekî rexneyî bikşînin ser rola Hizbullah, di bikaranîna nakokiya xwe ya bi Israîlê re ji bo temamkirina projeya xwe ya îdeolojîk li herêmê, li şûna jêbirina vê beşî, ya ku dibe ku bê şirovekirin ku ew wekî cudakariya giştî ye li dijî mezhebekî taybet.


Bialîkirin an dûrxistina li dijî mezheb û olên din di pirtûka Perwerdehiya Îslamî de xuya bû, ya ku tu hûrgulî li ser pirrengî û piraliya ol, mezheb û çandên li Sûriyê nekiriye, lêbelê giringiyê rasterast dide ola islamî, hin mamoste agahiyên li ser ol û mezhebên heyî wekî xebateke takekesî rave dikin, Ji aliyekê ve ev bîroke wek xîreteke cîwaz xuya dike, ji bo ku mamoste xwendekaran bi meylên olî yên cihê li Sûriyê bide nasîn, lê ji aliyekî din ve dibe ku ev mamoste bibin çavkaniyên agahiyên şaş, ya ku hewl dide xwendekaran îdeolojîk bike, û qalibê têgihiştinên xwe yên derbarê Îslamê de xurt bikin, û ramanên neyînî li ser komên din ava bikin, tiştê ku bala me kişand ew bû ku têkçûna rêbaza xwendinê bû sedema vegerandina giyanê serdema navîn, û ramana ferzkirina pereyan li ser kesên ne misilman, wek ku yek ji xwendekaran gotiye: "Xiristiyan dikarin di nav me de bijîn, lê divê ew pereyê kirîna xwîna xwe bidin" bêhestyarî xwendekar yên din ji mafê hemwelatîbûnê bêpar kirin, Ji vê gotinê, em asta bandora îdeolojiya olî ya selefî ya Heyet Tehrîr Elşam dibînin, ya ku nêrîna xwe li ser formê dewletê disepîne, di çarçoveya projeya xwe ya Îslamî de.

Ramanên xwendekaran li ser gumanê bi baweriya "yên din**"** hatin avakirin**,** ew jî mîna binpêkirina mafê mirovan a bawerî û îbadetê nîşan dide, bo nimûne, yekî ji xwendekaran got: "Olên berê di destpêka xwe de durist bûn, lê ew bi derbasbûna demê re ji rê derketin" Tiştê ku ramana xwendekar nîşan dide, yê ku bawer dike ku ol du baş in, beşek jê baş e û yê din li ser şaştiyê ye, û ji ber vê yekê pêdivî heye ku mirov "yê din" dirust bike, ev yek jî bêyî rêzgirtina cihê wî an taybetmendiya ramana wî, wekî yek ji xwendekaran dibêje: “Berê rastî kesekî Fileh nehatime, û ger ez wî bibînim ez ê wî berve riya Îslamê bidim” Ev awayê ramanê têkçûna rêbazekî diyar dike, a zêdekirina naverokê nîşan dide ku xwendekar bi cihêrengiya olî û mezhebî li Sûriyê dide nasîn, ku Hafiz Esed ji bo jinavbirina wan hewl da, di rêya helandina girêdanên kes û koman di warê taybet û giştî de.

**Cudakirina Li Ser Bingeha Nijadî**

Rêbaza hatiye lêkolînkirin çi cihêrengiya çandî ya Sûriyê tê de nîne, ev jî wek berdewamiya proseya jinavbirina "yê din"e, û sînordarkirina neteweperweriyê û girêdana niştimanî bi mezintirîn pêkhateya ku Ereb nûnertiya wê dike (di lêkolînên Siwêda û Reqayê de hatine gotûbêj kirin) nîşan dide. Û ji ber ku armanca rêbazan ronîkirina zanînê ye di hişê xwendekaran de, me pirsên nerasterast li ser pêkhateyên din ên nijadî yên Sûriyê araste kirin, û ji ber ku Idlib li kêlek Efrînê ye devera ku bi Kurdan tê nasîn, me pirsa Newrozê kir, 4 ji xwendekaran bersiv dan û gotin ku wan bi vê cejnê bihîstiye, 6 ji wan jî tiştekî li ser vê yekê nizanin, an jî ew bêdeng man, her çar xwendekaran bi hûrgilî rêûresmên cejna Newrozê zanîbûn, belkî ji ber medyaya civakî, û hebûna Înternetê îro roleke wê mezin di wê naskirinê de heye.

Nezanîna 6 xwendekaran ji 10 xwendekaran li ser pêkhateyek nijadî, ku tenê çend kîlometran ji wan dûr e, hişt ku em di pirsnameyê de ji dêûbavan li ser nêrîna wan derbarê rêbaza perwerdeyê bi hûrgiylên wê ve bipirsin, an mijarên girêdayî cihêrengiya çandên Sûrî, 50% razî bûn, lê 23% red kirin, rêjeya redkirinê dibe ku mezin be, lê ya ku cihê matmayî ye nerîna wan ku divê dibistan di bihinvedanên çandên mayî yên Sûrî de werin girtin, ji ber ku 98% ji nimûneyê bihinvedana mezheb û olên din red kirin, bê guman rolekî  nakokiyan mezin hebû, û bandor li pêkhatina van nêrînan kir, nemaze ku Erebên xwedî mezheba Sunî bi giştî ji hêla aşê cenga ku digere ve ziyan ji hemiyan bêhtir dîtine, lê tekez ku pêknehatina nasnameya niştimanî ya piralî û berfireh ya ku yek ji hemû pêkhateyên civaka Sûrî yek rûber be, ew e ku îro Sûrî hewcedarî wê ne.




(Di vir de ev wêne rêjeya bersivên pirsa li ser piraliya nijadî û olî di hundir rêbazên xwendinê de li Idlibê eşkere dike).

**Kesperestî:**

Rêbaza Idlibê li ser hilanîn û rakirina waneya perwerdehiya niştimanî bi hemû keresteyên wê yên ku di kesayetiya serok de bi kurtî digihêje pîrozkirina kesan hat avakirin, û girêdana wî bi welat û welatparêziyê ve tê dîtin ku operasyonên "jêbirin an zêdekirinê" li gorî rênimayiyên desthilatdarên defakto û piştgirên wan ên herêmê bûn, di dema xwendina dîrokê de, em bihaneyan dibînin ji bo guhertina nav û rengdêrên ku em bi wan re wek tiştên “qebûlkirî” di rêbazên dibistanê de, wek guherandina “Şoreşa Adarê” da ku bibe “teqlekirin” û zelalkirina “talankirina” Colanê, bi pirosesa firotina wê re, ne talankirina wê, di heman demê de di axaftinên li ser bahse Ebdil Nasir de, ji ber ku navê tevgera wî bi "teqlekirinê" hatîya binavkirin, ta bighêje Qezafî di serdestîya Lîbyayê de.

سورية منذ الاستقلال وحتى الوقت الحاضر

تعرضت سورية بعد استقلالها لجملة من المشكلات الداخلية والخارجية وحققت الوحدة مع مصر عام 1958م ثم شهدت انقلاب آذار عام 1963م ، تلاها انقلاب عام 1970م حيث عانت سورية ظروفاً صعبة حتى قيام ثورة آذار عام 2011م.

(Sûriyê ji dema serxwebûnê de heyanî dema niha).

(form 26: pirtûka dîrokê ya rêza nehan e)

Ev mijar dibe wekî hewldanek ji bo "serrastkirinê" ji nêrîneke gelêrî li ser bingeha gazinan, û derbirîna hestên rasterast di encama cenga Sûriyê de dike, lê nayê piştrastkirin ku pîrozkirina tekekesî bi dawî bûye, ji ber ku derbirînên wê li gorî helwesta wan ya îdeolojîk e, ya ku di nebêalîkirina bûyeran de diyar dibe, lê bi guhertina welat û erdnîgariyê re, weke ravekirina hatina Sedam Husên ser desthilatê bi têgehê "desthilatdarî wergirt" û dagirkirina Kuweytê, bi têgehê "ketina Kuweytê", bi dayîna wêneyê lehengê ku alîgir û hezkiriyên wî yên ereb hewl didin ku wî bidin nasîn, ev tişt wek hev bû dema ku li ser Nîvgirava Ereban diaxivî, û peyva "yekgirtî" ya eşîrên Al Siûd bibîr hat, ne ku wek yê li dijî wan rabûye.

التحرُّريَّة، فدعمَ سورية في حرب عام 1973م وقطعَ النفطَ عن الدول الداعمة للكيان الصهيوني، وبعد استقالته خلفه في الحكم نائبُه صدّام حسين.

الهاشمي.

وبعد انقلاب عام 1958م توالى على حكم العراق عدّةُ رؤساء إلى أنِ استلم صدّام حسين الحكم عام١٩٧٩م.

(Di vir de nemaze di beşê ku pir wêne ne diyar de li ser cenga sala 1973yan diaxive, û di beşê din de qala teqlekirina sala 1958 û hatina Sedam Husên ser desthilata Komara Îraqê di sala 1979an dike.

Ji vê yekê tê destnîşankirin ku kesperestî li ser asta xwecihî kêm bûye, û li şûna wê dualîtiyê axaftina li ser bûyerên dîrokî bilind bû, ya ku li ser pîvanên herêmî yên mîna hev diqewimin, û Hafiz Esed îxanet lê hat kirin, û cenga Cotmehê wek dirameyekê hat dîtin, da ku danûstandin nermtir be, û bi "Enwer Sedat" re bêalîtir bibe, û wêneyek bê danîn da ku xêz (çepera) Barlev derbas bike! û bi ser de gazina ji Ebdilnasir û tawanbarbûna wî bike, ji ber ku bi awayekî bincil rola wî di têkçêna Hizêranê de hate salixdan, û dema ku wî Kanala Siwêsê netew kiriye bibîr nehat, rolekî neyînî lê kirin ji ber helwesta wî ji dabeşkirina Yemenê re.

Hêjayî gotinê ye ku di vir de Mihemed Elcolanî nehat diyarkirin, wekî rêveberê navendî yê parêzgeha Idlibê, wekî nimûneyeke hevaheng bi Hafiz Esed re, û ku ji çend aliyan ve rewa dike, a yekemîn; ew e ku pirtûk berî avakirina Heyet Tehrîr Elşam  û hatina Colanî rastî guhertinê hatibûn, duyemîn; Colanî xwe dispêre ferzkirina kontrola xwe bi rêya bikaranîna tirsandinê û oldariyê, lê di heman demê de rêbazên guherî berve razîkirina tirkan ve diçû, di riya dûrxistina gumanên li ser dîroka Împaratoriya Osmanî, û di hevpeyvînên me de hat ku berî ku Beis were ser desthilatê bi Elfetih Elosmanî binav dikirin, di pey re navê wê bû dagîrker, û careka dî hate guherandin û bû Fetih, bi avêtina vê navî re em cureyekê ji hewla xwe nêzîkkirina ji hikûmeta Tirkiyê ya piştgiriyê dide Hikûmeta Demkî dibînin, û em dikarin bêjin ku pîrozkirin ji tekekesiye  derbasî dewletê bû.

**Nasname:**

Rêbaza xwendinê tu ronîkirina cewherê nasnameyî nîşan neda, lêbelê berfereh bû û hin caran bi nasnameya niştimanî ya Sûrî û bi nasnameya erebî û îslamî ve dihate nasîn, û belkî salxdana dawî li vir serdest be, em ê li vir behsa pirtûka dîrokê bikin, ji ber ku ew hilgirê herî zelal a vê peyamê ye.

Eşkere bû ku hejmara herî zêde ya rûpelên pirtûkê (128 rûpel) ji bo dîroka Sûriyê hatine terxankirin, û bi dirêjpanî li ser Filistînê bi awayekî ku ji welatên din ên erebî cudatir e axivî, ew jî bi du aliyan ve tête girêdan, ya yekem: ku rêbazên xwendinê nehatine guhertin, û naveroka bingehîn ya rêbaza xwendinê ya rijêma Sûriyê wek xwe hişt, û Sûriyê bi derdora wê ya erebî ve girêda, û ya duyem jî hiştina beşa taybet bi Felestînê wek xwe ji bo girêdana du belengaziyan bi hev re, li gor çarçoveya xwe ya dîrokî; Ji bo ku ev yek pêk were, pêdivî heye ku nasnameya niştimanî ya erebî û girêyîdabûna pêkhateyeke mezintir were nîşandan, û ev yek bi behskirina “Elhîlal Elxesîb ” an jî Sûriya xwezayî, “Welatê Şamê” diyar dibe.

Û tê dîtin ku her tiştê girêdayî  devara Colanê hatiye sererastkirin, ji ber ku xinizî di artêşa Sûriyê de nîşan dide, û Wezîrê Berevaniyê Hafiz Esed Colan radestî Îsraîlê kir, berdêla ku postê serokatiya Sûriyê bidest bixe, Colan ji aliyê Îsraîl ve hat dagîrkirin, bêyî ku nirxê radestkirinê bibîr werê, ew jî keysebazî ye bo Colanê da ku vegotina şoreşê li gor keysebaziya rijêma Esed bi doza Filestînê wek yek ji bazirganiyê wî bi Colanê ye, di hewlekê de ku têgeha wan Ji nasnameya xwe û girêdayîbûna Sûriyê nîşan bide, û me ji xwendekarên keç û xort re li ser nasnameya xelkê Colanê pirsî? Lê bersivên wan dijberî hev bûn, hina gotin ku Sûrî bûn û bûn Îsraîlî, û hinekên din jî diyar kirin ku ew Îsraîlî ne, û beşekî biçûk ji wan jî diyar kirin ku xelkê Colanê xwedî du regeznameya ne, Lê xwendekaran ketwarê wê red kirin, û bertekên wan di gotina yekî ji wan de derket: “Xelkê Colanê vegerê red dikin, û ji desthilatdariya Îsraîlê kêfxweş in."


التآمر الأجنبي على الحكم العربي في بلاد الشام

بعد انسحاب الدولة العثمانية من بلاد الشام شكل فيصل ابن الحسين حكومة عربية في دمشق ، لكن الانكليز والفرنسيين تآمروا على تلك الحكومة التي انتهت بالاحتلال الفرنسي لسورية عام 1920م.

(Wêne behsa pîlanbaziya biyanî li ser desthilata erebî di welatê Şamê de dike, piştî vekşîna dewleta Osmanî û pîlanbaziya Inkilîz û Firansayê ya ku di encamê de Sûriyê ji aliyê Firansayê ve hate dagîrkirin).

(form: ji rûpela 16)

Di vê wêneyê de, ku weke nimûneyek ji çend nimûneyan diyar dike, tê dîtin ku hikûmeta ku li Şamê hatiye avakirin bi “Ereb” hatiye binavkirin, ku cihêkariya li ser bingeha nijad û netewîyê ji bo gelê Sûriyê yê mayî nîşan dide, û Neteweperestiya erebî bi nasnameya Sûriyê ve girê bide, û ev pêşniyar bi awayekî di dema desthilatdariya Partiya Beis de derket holê, bi bilindkirina dirûşma “Yek neteweya ereb”, ku tê wateya dûrxistina “kesê din”, û ku danpêdanê bi pêkhateyên netewî û nijadî yên cihêreng nake, helandin an bişaftina wê bike û hebûna wê tortbelayî bike, (bi awayekî li gorî forma dîtaneyî).




(Ev wêne rêjeya sê pirsên têkildarî nasnameya Sûrî û rêbazên xwendinê li Idlibê diyar dike, tabî bersiv bi hûrgilî li jor bi me re derbas dibin).

Rêjeya 75% ji beşdarên pirsnameyên jin û mêr li hev kirin ku rêbaza xwendinê li Idlibê hesta nasnameya niştimanî ya Sûrî geş nake, û 44% ji wan tekezî li ser giringiya zêdekirina mijarên mafên mirovan, destûrî û sincî li ser rêbaza xwendinê kirin, ji bo xurtkirina wê, lê 29% red kirin; ev yek jî piştrast dike ku têgeha perwerdehiya niştimanperwerî an jî neteweperestiyê ji aliyê Partiya Beis ê ve ji ber rêbazên xwe yên bêber hatiye şêwandin, û vê yekê jî ji aliyê şênî ve bi bersiva 66% ji kesên pirs jê bûne hate zanîn, û gotin ku divê rêbazên perwerdehiyê ji siyaseta desthilatê serbixwe bin, û ev hemû babetan dihewîne, lê nîşana metirsîdar li vir ew e ku 79% ji nimûneyan serbixwebûna rêbazên perwerdeyê ji ol red kirin, ev tişt ji ber girêdana zelal di vê nimûneyê de, di navbera perwerdehiya niştimanî û olî de, her wiha serbixwebûna niştimanperweriyê ji siyasetê, ev jî bandorê li nasnameyê dike, bi wateya ku nasnameya olî divê di rêbazên perwerdehiyê de xuya bibe, ne ku nasnameyeke siyasî be.

**Gelo ma Rêbazên li Idlibê Dikarin Aştiyê Ava Bikin?**

Li ser bingeha keresteyên lêkolînê yên ku ên din red dikin, gotûbêjî li ser çawaniya avakirina aştiyê li Sûriyê hate kirin, û bersiva herî girîng ev bû: “Avakirina aşitiyê dikare bi demê re li gorî meylên piştgiriyê yên ku dixwazin roniyê bidin ser kêm netewan” ev girêdana rasterast a axaftinên li ser pêkhateya

civaka Sûrî û mafên wan li gorî arasteyên dewletên rojavayê ye, ji ber ku siyaseta rijêmê ya rêbazkirî stûnên cihêrengiyê yê tevaya pêkhatên gelê Sûriyê hildiweşîne, û windakirina taybetmendiya wan li hember xocihkirina nasnameya hişk ya girêyîdabûna sê goşeyî: partî, serok û artêş, li gorî vê, pêşniyara çanda cihêrengî û piraliyê di hundir rêbazên perwerdehiyê de cih negirt.

Beşdaran dûr nedîtin ku axaftin wê derbarê avakirina aştiyê li Idlibê çê bibe, heta ku Heyet Tehrîr Elşam hewl dide xwe wek nimûne pêşkêş bike, bi armanca bidestxistina danpêdanê ji hêla navdewletî ve, lê bîrokeya gengeşiyê hem ji hêla civakî û hem jî ji hêla takekesî ve nehat pejrandin, di serî de li hember nav û pêşniyara wê sekinîn, ji ber ku di demek şaş de hate pêşniyarkirin bi gotina: "Mirovek rastî bombekirinê tê, û ew xwînê li pêşiya xwe dibîne, û yek ji endamên laşê xwe winda dike, û ji min tê xwestin ku ez wî fêrî çanda aştiyê bikim?" bi mirûzekî nerazî got: "Li şûna ku vî gelî fêr bikin ku çawa berevaniyê di ber xwe de bike, hînî aştiyê dikin?" me ev bertekên ku ji dilgiraniyê derketine hest kirin, bi taybetî ku heta roja îro armanckirina sivîlan li Idlibê berdewam e, û divê di pêşî de berevaniyê di ber xwe de bikin, ya ku ji aliyê xwendekareke jin ve jî hat nîşandan û wiha got: "Rêbera olî jê re got: Kurseke rahênanê ji bo bikaranîna çekan heye, û çawaniya jihevxistin û komkirina wan, û tu çawa kilaşinkovê bi kar bînî, tu dixwazî tevlî kursê bibî?

Di dema gotûbêjê de, asta bandora perwerdehiya olî li ser ramana civakê û pejrandina wê wekî tiştekî normal diyar dike, û ew jî di destwerdanên xwendekaran di hemen gengeşiyê de û li derdora heman tiştî zîvirîn, tiştê fîr dibin û giringiyê didinê ol e, û yek ji wan dibêje: "Ola Îslamê daxwaza aşitiyê dike û wê ava dike, û peyama Quranê jî ew e aştî û danûstandina çak bi "yên din" re ye, pirtûka olî keresteyeke berfireh e ji bona aştiyê bi giştî, ger navxweyî be an li derve be.

**Temînî**

Tevî rewşa dijwar a îro li bajarê Idlibê, û ji bo ku guhertineke siyasî ya dadwer û berfireh li Sûriyê pêk were, em van pêşniyaran pêkşkêş dikin:

- Başkirin û berfirehkirina binesaziya perwerdeyê û peydakirina çavkaniyên perwerdeyê û teknolojiya nûjen.

- Pêşxistin û nûjenkirina rêbazên perwerdeyê, û tevlêkirina wan bi naveroka perwerdehiyê ya hestiyar a Gender re, ya ku dê nirxên hemwelatîbûna wekhev û rêzgirtina ji cihêrengî û piraliyê re damezrîne.

- Perwerdekirin û jêhatîkirina kadroyên hînkirinê, di riya bernameyên perwerdehiyê yên nûjen re, ji bo baştirkirina bicihînana wan û bihêzkirina wan bi mîkanîzmayên perwerdehiya nûjen û teknolojiya perwerdehiyê, ji bo xurtkirina têkiliya baş bi xwendekaran re, pêşxistina şiyan û zêdekirina ramana rexneyî li bal wan.

- karîna gihiştina xwendinê û dabînkirina derfetan ji bo hemû zarok û xort û keçan, di nav de penaber, kesên derbider, beşên paşguhkirî û xwedî pêdiviyên pêwîst, li gorî nêrîneke berfireh û bêalî, û rakirina astengên pelandî û çandî yên ku ji bona hînkirinê rê li ber wan digrin.

- Dabînkirina piştgiriya derûnî û civakî ji xwendekar û mamostayên ku di bin bandora nakokî û qeyranê de dijîn.

-Çareserkirina pirsgirêka zarokên ku dev ji xwendinê berdidin, û xebitîna wan, şûkirina zarok û keçên biçûk, misogerkirina gihandina zarokên keç bo xwendinê û piştgirîkirina wan bi dabînkirina alîkariyên perwerdeyê re.

**Dûmahî:**

Pirsên sereke yên ku di projeya Duderî de: Li dora girîngiya naskirina ketwarê perwerdehiyê di dema ceng û krîzan de dizîvire, perwerde çawa dikare jîngeha tundiyê û dûrxistinê li ser bingeha Gender, ol û netewî xurt bike? Û giringiya analîzkirina naveroka rêbazan di qonaxên nakokiyên navxweyî de û têkoşîna li ser bandora leşkerî û rakêşana nasnameyê çi ye?

Me di pêşgotinê de bal kişandibû ser; ku çawa perwerde dikare bibe amûrek ji pêwendiyên siyasî re? Di riya analîzkirina naveroka rêbazan û ronîkirina ketwarê perwerdehiyê re, em gihîştin wê encamê ku saziyên perwerdehiyê çalakiya siyasî (political activism) birêve dibe, ji bo van hêzên serdest ji hemû aliyên xwecihî û navdewletî re, Ji ber vê sedemê, çarçoveya siyasî endamekî sereke ye, di çi plan an sîstemeke perwerdeyê de, û sîstemeke wiha bêyî amajekirina cudahiyên naverok û çandî bi awayekî dirust nayê têgihiştin.

Perwerde û siyaset bi hev ve girêdayî ne, û ji hev cuda nabin, û mirov nikare di valahiya siyasî de dozên rêbazan bi awayekî berhemdar gotûbêj bike, ji ber vê yekê, bandorên ku berî cengê û piştî cengê li ser perwerdehiya Sûriyê çêbûne hema hema rasterast û nerasterast bûn, lê tevî wêrankirina binesaziya perwerdeyê, bandorên cengê li ser dûrketina ji xwendinê, û kêmbûna kadroyên fêrkirinê, xaçirêyek zelal di hawîrdora tundûtûjiyê de heye, ya ku hatiye xocihbûn, di bin giraniya stemkariyê û berdewamiya reftarên tundûtûjiyê de weke encama cengê ye**,** di vê çerçoveyê de û weku bi dîtinên me yên di nava hersê deveran de jî hatîya eşkere kirin, li ser bingeha Gender, netew û olî cudakarî û dûrxistin hebû, Ji bilî "jîngehkirin" kiryarên tundûtûjî di nav beşên xelkê de, û ev lêkolîn gihişte encama hebûna qalibên normal yên rolên Gender, ya ku cihêkarî û dûrxistin diçesipand, ku tenê di warê rêbazan de nema, lê ra gihîşte jîngeha perwerdeyê jî.

Tevî ku her sê deverên lêkolînkirî ji hêla sê hêzên defakto yên cihê ve têne kontrol kirin jî, lê ketwarê perwerdehiyê li deverên lêkolînkirî xirab bû, tabî  ew dever di asta xirabiyê de cûda dibin, çimkê mirov binesaziya perwerdeyê yan di rewşeke xizaniyê de ye, yan jî bi awayekî mezin wêran bûye dibîne, û ev tişta me li Reqayê û Idlibê dît, her du parêzgehên ku rastî êrîşên leşkerî yên tund hatine, yan jî herifî ne, û pêwîstiya wan bi piştgiriya aborî ya zêdetir heye, da ku guncav be ji pirosesa perwerdeyê re wek nimûneya Siwêda, ji aliyekî din rewşa xizaniyê û nebûna têr di mûçeyên kesên di karta perwerdeyê de, ji mamoste û karmendên jin û mêr di rêvebiriya şêwirmendiya derûnî de, ji ber ku mamoste di bin barê rewşa xirab ya aborî û mûçeyên nebaş de ne, bi derketina cudahiyên biçûk re li deverên lêkolînkirî, hat xuyakirin karê beranberî mûçeyên pir kêm an xwebexişkirina bê mûçe, wê yekê hişt ku mamoste li Idlibê li kêlek perwerdehiyê xwe li berdêlên pîşeyî bigerin, û mamoste neçin dibistanan, an beşdariya kartêker ya perwerdeyê li Reqyê, ji ber girêdayîbûna darayî ya Wezareta Perwerdehiyê di hikûmeta rijêmê de, (her çend mûçe kêm be jî) û tirsa ji destdana mûçeyê di dema ku diyardeya pêşkêşkirina waneyên bi kalîteya nebaş a xwendinê di dibistanên giştî li Siwêda belav bû, da ku bi pêşkêşkirina waneyên taybet li derveyî dibistanê bêhtir dahatê bi dest bixin.

Li vir, divê em li ser diyardeya kesên ku dev ji xwendinê berdidin biaxivin, ya ku bi eşkere li her sê deveran xuya bû, û ew vedigere sedemek sereke, ku ew bi belavbûna xizaniyê li seranserê erdnîgariya Sûriyê, têkçûna aborî, û hebûna sedemên şaxî ên taybetî yên her deverekê ve girêdayî ye, û yên herî girîng ev in: danpêdan bi bawernameya rêbazên girêdayî Rêveberiya Xweser nebû, û neçarkirina wan ji bo fêrbûna zimanê kursên perwerdeyê yên ku astengiyên girêdayî wan li ber çavan nayê girtin, bi ser wê yekê ve dijwariya gihîştina navendên ezmûnan û bidestxistina pirtûkan ger ku xwendekar tevlî bernameya

rewa û ya danpêdan pê bûye be, rewşa cengê, awarebûnê, koçkirina bi darê zorê, û nebûna hesta ewlehiyê ya ku xwendekar li Idlibê tê de dijîn, û ji ber vê yekê çûna perwerdehiyê tiştekî duyemîn e û ne sereke ye li pêşiya xelasî û rizgarbûnê.

Di çarçoveyeke pêve girêdayî de, rêbazên perwerdehiyê yên ku ji bo pola xwendekarên nehan - parve dikin ku ew bi giranî ji ketwarê jiyanê cihê bûne, waneyên bi taybetî di pirtûka perwerdehiya niştimanî de li Reqa û Siwêda tê xwendin, û wê rewşeke redkirina ketwar li bal xwendekarên keç û kur ava dikir, ji ber du sedemên cuda, li Reqayê, xwendekarên ku fêrî rêbaza rijêma Sûriyê dibûn di navbera Reqa û Rêveberiya Xweser de, û rastiya ku di pirtûkên perwerdehiya niştimanî de tê vegotin, û wa wêneya pir li pêş  ya ku rijêm dixwaze diyar bike berûvajî tiştê ku xwendekar dizanin û li ser wê di kolan û malan de dibhîsin, bi giştî vê berçav kir ku xwendekarên keç û kur li herdû deveran, bi rêbazan re weke şêweyekê ku pê bighînin zanîgehê didin û distînin, Ji aliyekî din ve, xwendekar li Idlibê neçar bûn ku bi rêbaza perwerdehiya Îslamî re danûstandinê bikin – ya ku hejmara katijmêran bi awayekî berbiçav zêde bû, ji ber bandora mezin berê siyasî ê desthilatdariya defakto li wir.

Her deverek îdeolojîyeka wê heye û di bin bandora arasteyên siyasî yên desthilatdariya serdest de ye, ji ber ku ew hewl dide bandorê li xwendekarên herêmên xwe bike, bi awayekî ku xizmeta wê bike, rêbazên perwerdehiyê ber bi cihêkariya li ser bingeha Genfer, zimanî û naverokê ve diçûn, û ev cihêkariya domdar di piratûka perwerdehiyê de ye, ya ku bi eşkere li Idlibê xuya bû bi riya siyaseta veqetandinê re di navbera xwendekarên keç û xort de,  û sînordarkirina hînkirina beşeke mezin ji xwendekarên keç bi rêbazên ku tenê xwendinê ji bo mebestên olî hînî wan dikin, di dema ku cihêkariya li ser bingeha Gender li Reqa û Siwêda di pratîka perwerdehiyê ya li dibistanan de xuya bû, di warê şêweyê ku kadroyên mamostetiyê bi xwendekarên jin re danûstandin dikirin.

Ji aliyê din ve, rêbazên xwendinê û ketwarê perwerdehiyê li deverên hatine  lêkolînkirin bi paşguhkirin û dûrxistina "yên din" di warê girêdana olî û nijadî de li hev kirin, û çi cihêrengên gelê Sûriyê di her sê rêbazan de destnîşan nebûn, ya ku li ser salxdana (gel, zemîn,dewlet û destûr) bi erebî ye ava bûye, û ku zimanê dewletê erebî ye, li gel paşguhkirina cihêrengî û piraliya civaka Sûrî, û derbarê olê de, pirtûkên dîrokê tenê bi amajekirina Îslam û Xirîstiyantiyê axaftina olê sînordar kirine, ji ber vê yekê Idlib bi nîşandana cûreyek cudahiyê di navbera Îslamê û olên din de tê cihêkirin, û ev yek di çarçoveya hevpeyvînan de xuya bû, bi awayê ku ji nav herêmên mayî ew bajar yekta ye.

Tevî ku rastiya perwerdehiyê bi tevahî di hejarî û belengaziyê û xirabiya rêbazên ku bi îdeolojîka ku bi awayekî mezin barkirî ye û lawaziya kadroyên perwerdehiyê

beşdar in, lê ew nifşên bi vegotinên dîrokî yên cihêreng û têgihîştinek yekalî a têgehên nasname û girêdayîbûnê ava dibin, ev jî xocihbûna çanda sivîl lawaz dike, ya ku li ser bingehê piralî û cihêrengiya çandan ava dibe, û ev jî di encamê de bingeha avakirina aştiyeke dadwer li Sûriyê datîne.

**Jêder**

**Pirtûk û Kaxezên Lêkolînê:**

Aldoughli, R. (2021). What is Syrian Nationalism?Primordialism and romanticism in official Baath discourse. researchgate.

Allport, G. W. (1958). The nature of prejudice. . Garden City, NY: Doubleday.

Arendt, H. (1973). The Origins of Totalitarianism. New York: Harcourt, Brace, Jovavovich. Archer, jeff.

Bourdieu, P. (2001). Masculine Domination. Cambridge:Cambridge University Press, 2.

Bourdieu, P. (2001). Masculine Domination. UK: Cambridge University Press.

Bourdieu, P. (2002). Language and Symbolic Power. Cambridge: Polity Press.

Bourdieu, P. a. (1977). Reproduction in Education, Society and Culture. London: Sage, xiii.

Butler, J. (1993). Bodies that Matter . New York: Routledge, 232.

Children, s. t. (2020). IDLIB, SYRIA: TWO SCHOOLS A DAY DAMAGED OR ABANDONED DURING ESCALATION IN FIGHTING,. save the Children ,

https://www.savethechildren.net/news/idlib-syria-two-schools-day-damaged-or-abandoned-during-escal.

Collins, P. H. (2000). Black Feminist Thought: Knowledge, Consciousness, and the Politics of Empowerment. 1st ed . New York: Routledge.

Crenshaw, K. (1991). Mapping the Margins: Intersectionality, Identity Politics, and Violence against Women of Color . Stanford Law Review 43 (6): , 99-1241.

Daniels, J. (2013 ). Race and Racism in Internet Studies: A Review and Critique. New Media & Society 15 (5), 695–719.

Davies, L. (2004). Building a Civic Culture Post-Conflict. London Review of Education 2 (3) , 229-244.

Dewey, J. (1916). Democracy and Education: An Introduction to the Philosophy of Education. New York: Macmillan.

Dryer, E. C. (1971). Media use and electoral choices: Some consequences of information exposure. Public Opinion Quarterly, 35:544–53.

F, L. (2002). School-based gender violence in Africa: A risk to adolescents sexual health. Perspectives in Education, 20, 2, 45-99.

Glaeser, E., G. Ponzetto, and A. Shleifer . (2007). Why does Democracy Need Education? Journal of Economic Growth , 12(2), 77-99.

Habermas J and William Rehg, . (n.d.). Constitutional Democracy: A Paradoxical Union of Contradictory Principles? . Political Theory 29 (6), 766-781.

Habermas, J. .. (1998). On the relation between the nation, the rule of law and democracy. In C. Cronin & P. DeGreiff (Eds.), The inclusion of the other. MIT Press.

Habermas, J. (1996). Between facts and norms. MIT Press., https://doi.org/10.7551/mitpress/1564.001.0001 ;.

Hillygus, D. S. (2005). The Missing Link: Exploring the Relationship between Higher Education and Political Engagement. Political Behavior 27 (1), 25-47.

Hinnebusch, R. (1982). Syria Under the Ba'th: State Formation in a Fragmented Society . Arab Studies Quarterly, Vol. 4, No. 3, , 183 - 181 https://www.jstor.org/stable/41857625 .

Huang, H. (2015). Propaganda as Signaling. Comparative Politics 47, , 4: 419–436.

J, C. (2005). Interventions linking gender relations and violence with reproductive health and HIV: Rationale, effectiveness and gaps in Agenda Special Focus. Gender Culture and Rights, 114-123.

J, W. (2005). Gendered Lives. Belmont: Wadsworth.

Jenkins, R. (1992). Pierre Bourdieu . London: Routledge, 204.

K, Z. (2009). Teacher Education and the Struggle for Social Justice. New York: Routledge.

Karasapan, O. (2021). The coming crisis in Idlib. Brookings website, https://www.brookings.edu/articles/the-coming-crisis-in-idlib/ .

Karrie J. Koesel, ,. (2020). doi.org. Legitimacy, Resilience, and Political Education in Russia and China: Learning to be Loyal, https://doi.org/10.1093/oso/9780190093488.003.0010 .

Kedourie, E. (1960). Nationalism. UK: Hutchinson.

Key, V. (1961). Public opinion and American democracy. New York: Knopf , 340-341.

Koesel, Karrie J., and Valerie J. Bunce. (2013). Diffusion-Proofing: Russian and Chinese Responses to Waves of Popular Mobilizations Against Authoritarian Rulers . Perspectives on Politics 11, no. 3, 753–768.

Leach F & Mitchell C . (2006). Combating Gender Violence in and Around Schools . Stoke-on-Kent: Trentham.

Linabary, Jasmine R., and Danielle J. Corple. . (2019). Privacy for Whom?: A Feminist.

Lippman, W. (1922). Public opinion. . New York: Harcourt, 89.

Lott, J. J. (1987). Why Is Education Publicly Provided? A Critical Survey,". Cato Journal, 7(2) , 475-501.

Macias, J. (1996). Racial and Ethnic Exclusion: A Problem for Anthropology and Education. Anthropology & Education Quarterly Vol. 27, 2,, 141-150.

Margaret Hanson and Sara Wilsom Sokhey. (2021 ). Higher Education as an Authoritarian Tool for Regime Survival: Evidence from Kazakhstan and around the World. Problems of Post-Communism (3), 231-246.

Nations, U. (1989). United Nations convention on the rights of the child. New York, NY.

Practice, I. i. (n.d.). Information Communication and Society 22 , 1447–63.

Qaddour, K. Husain, S, . (2002). Syria's Education Crisis: A Sustainable Approach After 11 Years of Conflict. The Middle East Institut, 7-8.

RENAN, E. ( 2018). What Is a Nation? and Other Political Writings. Columbia University Press.

S, M. (2018). "Malicious to the skin". The internalisation of corporal punishment as a teaching and a disciplinary tool among South African teachers. Mind, Culture, and Activity, 25(4), 293–307.

Tinker, V. (2016 ). Peace Education as a Post-conflict Peacebuilding Tool. Journal of Foreign Policy and Peace 5 (1), 1-89.

Zaller, J. (1987). The diffusion of political attitudes. Journal of Personality and Social Psychology, 53:821–33.

Dîroka Sûriyê ya nû, Pirtûka Xwendekaran, Perwerdeya Bingehîn, Pola nehan. (2019/2020). Wezareta Perwerdeyê ya Komara Erebî ya Sûriyê - çapa yekem.

Perwerdehiya Neteweyî, Pirtûka Xwendekaran, Perwerdehiya Bingehîn, Pola nehan (2012/2013) Wezareta Perwerdeyê ya Komara Erebî ya Sûriyê - çapa yekem.

Jean-Jacques Rousseau, wergerandina Abdul Aziz Lebib. (2011). Di peymana civakî de. saziya Erebî ya Wergerandinê, Beyrût, rûpel: 94.

Gotarên rojnamevanî:

*FAQs: Global Poverty Line Update, world bank, published date. 30/9/2015, url: https://www.worldbank.org/en/topic/poverty/brief/global-poverty-line-faq

*Quarter-million students in Idlib, Syria lack access to education, Gökhan Ergöçün, published date 20/5/2021, last visit 30/7/2023.: https://www.aa.com.tr/en/middle-east/quarter-million-students-in-idlib-syria-lack-access-to-education/2248179

*cudakirina di nav desthilatan de .. prensîbeke yasayî ya ku di destûra Sûriyê de tune ye, di axaftinên hikûmetê de heye, Enab Beladî, di 20/11/2020 de hate weşandin, di 1/8/2023 de hate dîtin, binêre. https://www.enabbaladi.net/archives/433228#ixzz89NwngUsi

*318hezar dev ji xwendinê berdane .. Piraniya zarokên bakurê Sûriyê diçin ser kar, Al Jazeera Net, di 15/6/2023 de hate weşandin, di 4/8/2023 de hate dîtin, binêre: https://bit.ly/3OHrZE6

*4 rewşên xwekuştinê di heyama sê heyvan de li Siwêda Sûrî, Elerebî Elcedîd, di 5/4/2023 weşiya, li vir binêr:

https://2u.pw/WANVEgz.

*Xelkê Siwêdayê redkirina xwe ji tevlîbûna xizmeta yedek nû dikin... û rijêm wan kesan ji kar bidûr dixe, El-Şerq El-Ewset, di 15/9/2014 de hate weşandin, serdana dawî di 8/8/2023 de bû, li vir binêre:

https://aawsat.com/home/article/181776

*serhejmarek dibistanên bê piştgirî li Idlibê eşkere dike, Malpera Baladi News, di 17/5/2022 de hate weşandin, 30/7/2023 hate dîtin, binêre: https://bit.ly/47nbgxw

*Bi amadebûna Xanim Esma Esed. Ragihand ku Parêzgeha Siwêda ji kesên nexwendî vala ye, eSyria, di 15/10/2008 de hate weşandin, serdana dawîn di 8/8/2023 de, binêre: https://bit.ly/3qqPY1i

*Li ser vexwendina "şêxan".. xortên Siwêdayê xwe çekdar dikin bo rûbirûbûna DAIŞê, Zeman El-Wesl, di 8/4/2014 de hate weşandin, serdana dawî 8/9/2023, li vir binêr: https://www.zamanalwsl.net/news/article/52229

*Xiştekara demî ji rizgarkirina bajarê Reqayê, Hwvpeymana Navdewletî, di 6/7/2023 de hat weşandin, li vir binêr:

https://theglobalcoalition.org/ar/timeline-fall-daesh-raqqa-2/

*Di hevpeyvînan de, amadebûyan bi yekdengî li hev kirin ku rêxistinên navdewletî û xwecihî siyasî ne, û armanca wan ew e ku destwerdanê di prosesa xwendinê de li Sûriyê bikin, û armanca wan paşguhkirina xelkê ye, Helbet nimûneya mamosteyên ku me pê re hevdîtin kirine hindik in, û rastiya ketwar nîşan nade.

*Lêkolînek li ser tevgera sivîl di şert û mercên dijwar de, komên civaka sivîl li Sûriyê, 2011 - 2014, Rena Khalaf û Ola Remedan, tîmê berdêl li Beirut, Libnan di 2015 de, rûpel, 9 li vir Binêre: https://api.badael.org/uploads/Activism_in_difficult_times_AR_26227f8e94.pdf

*Elsebxa: Bajarekî ku bi 30 km li rojhilatê bajarê Reqayê ye, di bin desthilata rijêma Sûriyê de ye, komplekseke perwerdeyê tê de heye ku xizmetguzariyê pêşkêşî xwendekarên bajarê Reqayê dike, yên ku dixwazin biçin ezmûnîn dibistana navencî û duwenavencî pêşkêş bikin, û rêya xwendekaran ji bo gihîştina wê nêzîkî sê katijmêran digire.

*Sûriye: Belavkirina pirtûkên dibistanê yên ku hatine bikaranîn, nerazîbûna xwendekar û malbatên wan diyar dike, malpera Rîsala Post, di 14/9/2022 de hate weşandin, di 7/8/2023 de hate dîtin, li vir binêre: https://bit.ly/47n4IPe

*Sûriye: Heyat Tehrîr Elşam devera Idlibê kontrol dike, piştî rêkeftina agirbestê, France 24, di 1/10/2019 de hate weşandin, di 8/3/2023 de hate dîtin, li vir binêre: https://bit.ly/3OIKuIq

*Rûpela rêbazan li ser malpera wezareta perwerdehiyê û hînkirunê ya sûrî: http://moed.gov.sy/site/cur/11

*Rûpela fêsbokê rawestgeha çi heye çi tune ye, destpêşxeriya taxa miawiye li Reqayê

https://fb.watch/lheRu5OxFV/?mibextid=Nif5oz

*Sizayên govdeyî dermafê zarokan Human Rights Watch li rojhilata navîn û bakurê efrîkayê dawîtirîn serdan di 4/8/2023 li vir binêr:

https://features.hrw.org/features/features/corporal-punishment-of-children/index-ar.html

*Yasaya rewşa kesane hejmar ya sala 1953 dawîtirîn serdan di 4/8/2023 de, li vir binêr: http://parliament.gov.sy/arabic/index.php?node=201&nid=11333&ref=tree&

*Yasaya cezayan hejmar 184 ya sala 1949 û di sala 2011an de hatiye nûkirin rûpel 21, dawîtirîn serdan 4/8/2023

https://www.ohchr.org/sites/default/files/documents/issues/torture/cfi-report-hrc52/submissions/csos/submission-srtorture-hrc52-cso-SyrianNGOs-5.pdf

*Yasa hejmar 32 derbarê qonaxa perwerdeyê ya sereke 2002 rawengeha jinên sûriyê di 2/3/2006an de weşiya li vir binêr:

https://nesasysy.wordpress.com/2006/03/02/32-2002/

*Tenê çaryek ji xercên hikûmetê ji bo perwerdeyê maye!, Malpera Qasyo, di 20.3.2022 de hate weşandin, serdana dawîn di 30.7.2023 de, li vir binêre.

https://kassioun.org/economic/item/72649-2022-03-20-22-02-19

*Kampên bêserûber yên derbideran li ser sînorê jiyanê li Idlib û derdora wê, Ebdullah Elbeşîr, Elerebî Elcedîd, di 24/12/2019 de hate weşandin, di 2/8/2023 de hate dîtin, li vir binêre:

https://bit.ly/3OqsNMe

*Rapirsînek ku di sala 2004an de ji aliyê Ofîsa serhejmariyê ya Navendî ya Hikûmeta Sûriyê ve hatibû çêkirin, hat dîtin,

http://cbssyr.sy/

*UNHCR: Asta derbideriyê rekorek din tomar kir, meyleke zêde ya bilindbûnê girt, derdora deh salan berdewam kir UNHCR, di 6/16/2022 de hate weşandin, herî dawî di 8/8/2023 de hate serdan: https://www.unhcr.org/ar/62aa15d94

*Pêleke koçberiyê komî ji xelkê Siwêdayê kuda diçê? Malpera Sûriya, di 10/3/2023 de weşiya û dawîtirîn serdan di 8/8/2023 de bû, li vir binêr: https://www.syria.tv/205335

Ansîklopediya Siyasî ya Ebdulwehab ElKeyalî, rûpel: 546

*Rijêm bilindkirina nirxê pirtûkan rewa dike: da ku xwendekar pirtûka xwe biparêze û ji ber bihaya kartonê ya cîhanî bilind bibe, Ajansa Şam, di 17.08.2022 de hate weşandin, serdana dawîn di 30/7/2023 de, li vir binêre:

https://shaam.org/news/syria-news/alnzam-ybrr-rfa-asaar-alktb-lyhafz-altalb-ala-alktab-wlartfaa-sar-alkrtwn-aalmyaan

*Rijêm rê li ber dest ji karhiştina karmendên Wezareta Perwerdeyê berî 30 salan digire û dibêje: “Pêdiviya me bi hin pisporan heye” tora Şam ya Nûçeyan di 15/6/2023

https://2u.pw/41RiUat.

*Nerînek li rewşa Siwêdayê di hundir nakokiya Sûrî de, Eştar Elşamî, Waşintin, instîtot di 12/10/2022 de dawîtirîn serdan di 8/8/2023 li vir binêr:

https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/nzrt-aly-wd-alswyda-fy-khdm-alsra-alswry

*Nors pirês 23/6/2023 https://npasyria.com/157278/

*Ev rêbaza ji aliyê Weqfa Xêrxwazî ya Qeterê ve hatin çavdêrîkirin û belavkirin, û zêdetir ji carekê pirtûk belav kirin lê bêyî dîrok, erdnîgariyê, û Rûniştinên diyalogê.

*gelo ma Artêşa Amerîkayê ji bo sînordarkirina wêrankirina Reqayê tiştê jê xwestin kir? indibindinr ya Erebî, di 4/2/2022 de hate weşandin, herî dawî di 8/3/2023 de hate serdankirin, li vir binêr: https://bit.ly/3Yrk2pZ

*Heyet Tehrîr Elşam komên rikberiyê bi girtinan armanc dike, û davêje ser navendên sivîl yên girîng, Tora Sûrî ya Mafên Mirov, ku di 2/6/2017 de hate weşandin, di 8/4/2023 de hate dîtin, li vir binêr: https://snhr.org/arabic/2017/02/06/7582/

*Waşinton “Heyet Tahrîr Elşam” dixe lîsteya rêxistinên terorê, Ajansa Anadoluyê, 31.5.2018, lê hatiye dîtin 4.8.2023

https://bit.ly/3Oq4hei

*Wezîrekî sûrî xelata baştirîn roman bi tuhmetbariya gendeliyê wergirtiye, Ehid Fadil, Elerebî Elcedîd, di 17/9/2019 de weşiya li vir binêr: https://2u.pw/JK37BxV

*UNICEF, 24/12/2021 https://2u.pw/rSSF2gD